

# ZEND

**Rêzêpirtûk / 1**

**Sererastkirin**

Zana Farqînî, Salih Kevirbirî  
Mazlum Doğan, Zulkuf Kışanak

**Mîzanpaj**

Besna Tonguç

**Çapxane**

İmaj Matbaacılık

**Çap**

Gulan 2004

**ZEND Bilim Kültür Eğitim**

**Basın Yayın Ltd. Şti.**

Namık Kemal Cad. Gençoğlu  
İnkilap Sok. İş Merkezi No: 19/6  
Aksaray / İstanbul

**Tel:** (0212) 586 39 84

**Fax:** (0212) 586 39 90



# NAVEROK

Ji Zendê .....	2
Enstîtu û xebatên akademîk .....	3
Sedsaliya Cegerxwîn .....	5
Osman ÖZÇELİK	
Nivîs û alfabeya dîroka nivîsê .....	11
Raif YAMAN	
Pluralîzma çandî û demokrasî .....	20
Şefik BEYAZ	
Perwerdekirina bi zimanê kurdî .....	24
Çeto Özel	
Di zimên de zayendî .....	27
Adar JIYAN	
Di kurdî de erk û rola tewanga navdêr û cînavkan .....	31
Samî BERBANG	
Bikaranîna teoriya mufredatê ji bo çêkirina bernameyên ziman û rêbazên fêrkirina ziman .....	34
Çeto ÖZEL	
Dadgeha wijdan û tevgera me ya dîrokî .....	44
Cebar QADIR	
Mihîrcan û rola wan .....	50
Cemil Oğuz	
Zana û pêxemberê kurd Zerdest (2) .....	53
Kerem SOYLU	
Ebû Muslimê Xorasanî .....	56
M. Reşîd IRGAT	
Qanatê Kurdo .....	57
Rohat	
Mîtolojî afirîneke hevpar a mirovahiyê ye .....	60
Ferat Pîr	
Têgihên temayên rewşa pêşketinên nû û xurtkirina peyvan di kurdî de .....	65
Feqî Huseyn	
Li ser gelşên me yên vekîtê .....	67
Zana FARQÎNÎ	
Bernameya Beşa Dîrokê .....	71
Li ser qursên taybet ên zimanê kurdî û rewşên bîrên kurd .....	78
Şefik BEYAZ	

# JI ZENDÊ

## XWENDEVANÊN HÊJA

Di ser hejmara Zendê ya şeşemîn re ku ya dawî bû, şeş sal borîn. Ev dem ji bo jiyana weşana kovarekê demeke pir dirêj e. Di vê demê de hûn xwendevanên hêja bêtir Zend û bi hesret man. Bi rastî Zend jî bi wê hesretê bû ku bigîje destê we. Li dawîya şeş salan, bi hejmara heftan em gihîştin hev. Ji ber vê sedemê, em ji nû ve, ji we re dibêjin merheba.

Amadekara Zendê Enstîtuya Kurdî, di navbera van salan de pir astengî û rewşên dijwar derbas kirin. Ji aliyê derfetên piralî ve jî tengasî hatin kişandin. Digel van rewşan diviya ku di demeke pêş de Zend bihata weşandin, lê mixabin pir dereng ma. Loma jî, em ji we xwendevanan lêborîna xwe dixwazin.

Di salên borî de dinyaya hundir û derveyî welêt veguherî. Hin rewşên kevn ji jiyana derketin, hin nixên nû beşdarî jiyana siyasî, civakî, zanistî û hwd. bûn. Ji nexşeya gena bigirin heta desthilatdariya kevneperest a Rojhilata Navîn guherîn çêbûn. Dinya ji her alî ve, ji bo ku bibe bersîva pêdiviyên nû, xwe diguherîne û ji nû ve xwe ava dike. Kî ku naxwaze xwe nû bike û xwe vegu hêze nikare bibe bersîva pirsgirek û pêdiviyên piralî yên ku her roj pê re rû bi rû dimîne û nikare bibe çareserîya van ên hanê.

Saziyên wek Enstîtuya Kurdî, ji bo ku xwe ji tengasiyan û qelsiyan xelas bikin, fireh bibin û xwe xurt bikin, bibin bersîva pêdiviyên nû, divê ku bi metodolojiya zanistî û ferasetên nû xwe veguherînin, binirxînin û ji nû ve xwe saz bikin. Enstîtuya Kurdî li ser vê rastiyê rawestîya û destûrname û bernameya xwe guherandin. Loma jî beş damezirandin. Bi feraseteke nû, bingeha despêkeke nû danî. Dîsa jî ev têrî nake divê ku ev feraset û nûbûn hê jî xurttir bibe. Em dê hewl bidin ku Zend ji aliyekî ve mîna berê û heta ji berê xurttir cih bide xebatên zanistî û ji aliyê din ve jî tiştêkî li ser wan deyne, bibe îfadeya xebatên li nav xwe yên ku bi feraseta nû hatine amadekirin. Her wiha bila Zend bibe kursiyê xebatên zanistî yên Enstîtuya Kurdî.

Hûn xwendevanên hêja baş dizanin ku bi qalîp û tempoya xebatên berê, êdî têrî nake. Pêdiviyên ziman, çand û wêjeya Kurdî fireh û zêdetir bûne. Divê her Kurdê ku dikare xebatên lêkolînî û lêgerînî bike, hin pirtir berheman pêk bîne û beşdarî kovara Zendê bibe. Bi vî rengî Zend dê xurttir û dewlemendtir bibe. Em bi vê bawer in û li benda beşdariya berhemên we ne.

Her wiha bêtir nixandin û rexneyan jî nabe. Kovarên ku bêtir rexne û nixandin dimînin, ji aliyekî ve xeteriya mayîna li ser lingekî derdikeve pêş wan. Rûpelên Zendê li benda rexne û nixandinên we yên çêbar in.

Îsal sedsaliya Cegerxwîn bû. Loma, bi vê mebestê, di vê hejmara xwe de me di serî de cih da nivîsa Osman Özçelik ku li ser Cegerxwînê nemir e. Me di vê hejmarê de piranî cih da nivîsên li ser ziman. Hûn dê der barê zimên de rastî pênc nivîsan bin. Adar Jiyan li ser perwerdeyê, her wiha Çeto Özel jî bi awayekî din dîsa li ser perwerdeyê rawestiyaye. Zana Ferqînî û Samî Berbang di nivîsên xwe de cih dane mijarên rêzimanî.

Me di vê hejmarê de Apê Feqiyê gorbihîşt jî ji bîr nekir. Me cih da nivîseke wî ku li ser zimanasiyê ye. Gotara Raîf Yaman jî der barê dîroka alfabe û nivîsê de ye, lê ew jî bi zimên re eleqedar e.

Beşa dîrokê bernameya xwe amade kir. Ji vê hejmarê pê de ev bername dê beş bi beş di rûpelên Zendê de bê weşandin. Nivîsên din, mijarên cur bi cur in; her yek li ser mijareke din rawestiyaye. Ji wan gotaran du heb li ser navên dîrokî ne: Zerdest û Ebû Mislîmê Xorasanî. Nivîskarên van her du gotaran Kerem Soyul û M. Reşîr Irgat in. Mijara nivîsa Rohat, Qanadê Kurdo û ya Cemîl Oğuz jî mîhrîcan e. Mîtoloji û pîrçandîtî ji mijarên Zendê ne. Ferat Pîr û Şefîk Beyaz ev gotar nivîsîne. Mabesta me ev bû ku em bi van nivîsan hîn xurttir derkevin pêşberî we. Êdî nixandin a we ye.

**Heta hejmareke din, rojên bihêz û xweş ên we bin.**

Têbinî: Me, ev hejmara Zendê, bi awayekî asayî amade kiribû, lê mixabin ji ber sedemên zagonî, ev hejmara Zendê, wek hejmareke taybet (rêzepirtûk) digihîje ber destên we.

Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê wekî hemû saziyên neteweyî di pêvajoyeke dijwar de bi hevkarîya komek rewşenbîrên tirk û kurd, li Stenbolê roja 18'ê Avrêla 1992'yan hate damezirandin. Damezirînerên wê Îsmail Beşikçi, Mûsa Anter, Feqî Huseyîn Sagniç, Yaşar Kaya, Abdurrahman Dure, İbrahim Gürbuz, Cemşid Bender û Süleyman İmamoglu bûn.

# ENSTÎTU û XEBATÊN AKADEMÎK

Enstîtuya Kurd bi coş û hêviyê xurt hate damezirandin. Bêguman wekî hemû saziyên neteweyî Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê jî rastî êrişan hat. Li aliyekî hêzên ewlekariyê dixwest ku daxwaza damezirandina Enstîtuya Kurdî biçewisîne, li aliyê din jî saziyên fermî û sivil ên ku di qada zanistî de cih digirtin li dijî vê xwesteka xwezayî teoriyên li ser nebûna kurdan bi sinceke ji fehm û aqilan dûr diafirandin. Digel hemû bertek û êrişan, Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê di nav şert û mercên giran û bêderfet de xebatên xwe yên der barê zimanê kurdî, wêje û dîrokê de meşandin.

Vekirina qursên zimanê kurdî, ji bo xwendekaran afirandina staj û bûrsan, di warê dîrok, wêje û zimanê kurdî de têgihîştina mamosteyên pispor, damezirandina muzeyê etnografî ya kurd, navenda dokumantasyonê ya ziman û dîroka kurd, her wiha afirandina beşa ziman, dîrok, wêje, gelnasî, audiovisuel, fotograf û belgeyan ji armancên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê çend

mijarên sereke bûn. Lê ji ber bêderfetî û nêzikatiya rewşenbîrên kurd a ne xurt gelek proje bi ser neketin. Digel hemû kêmasî û bêxemiya li hember xebatên zanistî û akademîk, Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê gelek xebatên giranbiha jî kir. Ferhenga bi tirkî û kurdî, ji bo

hînbûna zimanê kurdî ya zarokan seta ku ji çar pirtûkan saz bûye, lêkolînên li ser şexsiyetên kurd ên dîrokî û berhemên wan, gelek xebatên li ser zargotin, helbest û wêjeya kurdî, rojnamegeriya kurdî weşand, çî li welat, li Tirkîyeyê û çî li derveyê welat gelek panel, konferans û sempozyûmên zanistî li dar xist û beşdarî platformên akademîk bû.

Bêguman Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê di warê ramangeriya kurdî de jî hewl dide û li berhemên hêja xwedî derdikeve. Ji ber ku pêdiviya ramanê bi tarz û pergaleke akademîk heye. Her wiha ramangeriya ku hêza xwe ji pergaleke akademîk negire, nikare di

warê xwe de bibe ekolek. Ji ber vê kêmasiya neteweyî û mezin, ne li cihanê û ne jî li welat ramangeriyê kurdewar derdikeve pêş û nikare di pêşbirka mirovahiyê de cihê xwe bigire. Gelo ev kêmasiya ku ev qas girîng û watedar dê ji aliyê kîjan saziyê ve bê tijikirin? Bêguman divê saziyên akademîk vê valahiya mezin û

**Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê wekî hemû saziyên neteweyî di pêvajoyeke dijwar de bi hevkarîya komek rewşenbîrên kurd û tirk, li Stenbolê roja 18'ê Avrêla 1992'yan hate damezirandin ku damezirînerên wê Îsmail Beşikçi, Mûsa Anter, Feqî Huseyîn Sagniç, Yaşar Kaya, Abdurrahman Dure, İbrahim Gürbuz, Cemşid Bender û Süleyman İmamoglu bûn.**

pêwist tije bike. Mixabin rewşa saziyên me yên neteweyî û bi taybetî jî saziyên akademîk li gorî pîvanên sedsala 21'an xebatên sazûmanbûnê nadin meşandin. Her çî qas ku Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê di sala dawî de xebatên li gorî daxwazan ne dabe meşandin jî, lê careke din û hîn xurttir gihiştîye feraseteke nû ku şert û mercên xebatên akademîk biafirîne.

Hewce ye ku saziyên akademîk di xebatên pêşveçûna civakê de jî cih bigirin, rona-

hiya zanebûnê bidin civakê. Heke xebatên akademîk li gorî pêwendiyên civakê rista xwe nelîzin, hişmendiya civakê dê ji her dem û dewranê zêdetir têk here.

Lewre jî hêvî heye ku Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê di warê gihandina ramangerên kurd de rista xwe bilîze û bi hêzbûna wan, asta civakê ya hemdem bi pêş bixe.

Bêguman bilindbûna as-ta ramangeriya kurd dê civakê jî bi xwe re biguherîne.

Di dîroka hemû neteweyan de rista ramangeriyê bê-nîqaş tê peji-randin.

Berîya zanistiya modern û ramangeriya sedsalên nûjen perestgehan, dêran, mizgeftan, medreseyan, dergahan di afirandina ramanê de rîstên mezin lîstine. Her wiha di dîroka kurdan de jî ramanger û filozofên wekî Ehmedê Xanî, Meleyê Cizîrî, Meleyê Bateyî, Feqiyê Teyran, Baba Tahirê Hemedanî di medreyên kurd de gihîştine û bandoreke mezin dane pêşveçûna civaka kurd û lewre jî neteweya kurd hebûna xwe bi hêzgirtina van kesên bêhempa parastîye. Di vê sed sala dawî de jî kesên wekî Celadet Elî Bedirxan, Kamûran Bedirxan, Qedrican, Reşîdê Kurd, Seydayê Cegerxwîn, Mûsa Anter, Feqî Huseyin Sagniç, Sebrî Botanî, Îbrahîm Ahmed, Erebb Şemo,

Heciye Cindî, Celîlê Celîl bi berhem û ramanên xwe, kurdewarî bi pêş xistin û dixin.

Ji xizmetên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê yek jî çalakiyên pîrozkirina jidayikbûna sed-saliya

Seydayê Cegerxwîn bû. Enstîtu li gelek bajarên kurdan û li Tirkîyeyê gelek panel, semîner û sempozyûm li ser navê

Seydayê Cegerxwîn li dar xistin. Her wiha ji bo bîranîna



**Heke xebatên akademîk li gorî pêwendiyên civakê rista xwe nelîzin, hişmendiya civakê dê ji her dem û dewranê zêdetir têk here. Lewre jî hêvî heye ku Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê di warê gihandina ramangerên kurd de rista xwe bilîze û bi hêzbûna wan, asta civakê ya hemdem bi**

seydayê mezin di warê wêje û nivîsariya kurdî de xelat da.

Digel hemû tengasiyan û bêderfetiyan ji xebatên dibistanên perwerdehiya zimanê kurdî re pêşengî kir. Li bajarên wekî Riha, Wan, Êlih, Amed, Bazîd, Dêrsim, Qoser, Edene û Stenbolê avahiyên dibistanan vekir. Her wiha li Riha, Êlih û Wanê destûra vekirina dibistanên perwerdehiya bi zimanê kurdî bi dest xist. Dîsa ji bo gihandina mamosteyên ku dê di dibistanan de xwendekaran perwerde bike qurs organîze kirin.

Her çi qas ku ne li gorî pêwistiyan be jî, ev xebatên pîroz di dîroka bakurê Kurdistanê de pêngavên nû ne. Hêvî ew e ku êdî kesên dê ramana kurdî biafirîne wê

di dibistanên kurdî re derbas bibin. Lewre dê di hûnandina mêjû û ramanê de jî rengên kurdewar derkeve pêş. Bêguman ev dê ji pêşketin û bihêzbûna xebatên akademîk ên kurdî re bibe bingeheke nû-jen. Belê, hedef û armancên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê her ku diçe mezintir û bihêztir dibe. Jixwe Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê bi ferasetê nû û ronîtir xebatên xwe dimeşîne. Bêguman wê di kongreya xwe de bigihîje encameke xurt. Ne hêvî bi tenê, xebatên xurt têne kirin ji bo kongreyeke serkeftî ne.

## SEDSALIYA CEGERXWÎN

**Osman  
OZÇELİK**

Sala çûyî, sedsaliya şairê neteweyî Cegerxwîn bû. Em ji bo Cegerxwîn çî dikin. Çendek panel, çend rûpel nivîs... ew qas! Ma heqê Cegerxwîn yê li ser me ew qas e? Binêrin xelk ji bo şairekî xwe çendek rêzik dinivîsînî çî dikin û çî nakin. Hêja ye ji bo şairê me yî bêhempa akademî, zanîngeh, wekîf vebûna. Navê wî li kolanana, li bajaran bihata danîn. Rast e, derfetên me kêman. Derfetên me yê ku hene jî em bi kar nayênin. Ji me çend kesan dîwanên wî, jînenîgariya wî xwendine? Em çend kes dizanin şîrên wî jiber bixwînin? Em çend kes wî ji nêz ve nas dikin?

De ka em kulan zêde tev nedîn, bi çend rûpelan em wî bi bîr bînin.

Bi ya min ji xizmetên Cegerxwîn yek jê, xizmeta vejîna zimanê kurdî ye. Wî bi hezaran bêjeyên kurdî ku di zimanê jiyana rojane ya civakî de bû, kir bêjeyên şîrî û edebî û nehişt ku ew bêje wînda bibin. Wî ferhengeke fireh ji me re hişt.

Bi Cegerxwîn careke din em dibînin ku neteweyek bi çand û hunera xwe, bi jiyandîna zimanê xwe li ser lingan dimîne. Bingeha avabûn û ma-

yîna welatparêziyê ziman e. Zimanekî pêşketî ye ku milêtan dike rêza neteweyên hemdem.

Sal 1903 ye. Li Bajarê Mêrdîn, li gundê Hesarê ya Kercewsê, ji Hesên û Eysanê bi navê Şêxmûs, kurek têt dinyayê. Hesên û Eysanê mîna gelek malbatên kurdan feqîr in. 11 zarokên wan çêbûne, belê ji wan tenê Asiya, Xelîl û Şêxmûs jiyane. Beriya şerê cihanê yê yekemîn ji ber şer û pevçûnên gund, Hesên û Eysanê her sê zarokên xwe hil-

**Bi ya min ji xizmetên  
Cegerxwîn yek jê,  
xizmeta vejîna zimanê  
kurdî ye. Wî bi hezaran  
bêjeyên kurdî ku di  
zimanê jiyana rojane ya  
civakî de bû, kir bêjeyên  
şîrî û edebî û nehişt ku  
ew bêje wînda bibin. Wî  
ferhengeke fireh ji me re...**

digirin bar dikin, diçin Amûdê. Di demeke kurt de, dê û bav di navbera salekê de li pêy hev dimirin. Her sê zarokên sêwîmayî bi şûn de vedigerin gundê xwe, dîsa li Hesarê bi cih dibin. Jiyana wan a li Hesarê dirêj naajo, careke din li Amûdê vedigerin

Şêxmûs biçûkê malê ye. Xelîl û Asiya zewicîne, Şêxmûs li cem Xelîl dimîne. Şêxmûs ji destê jinbira xwe debar nake, diçe mala xwişka xwe ya Asiya. Ew jî gelekî feqîr in. Diviya Şêxmûs bixebitiya.

Şêxmûs li cem wan şivantî, rênçberî û paletî dikir.

Şêxmûs, li cem axa û dewlemendan xebitî. Di zaroktiya xwe de, xwe di nava şerê herî dijwar, şerê jiyane de dît. Zordestî, şelandin, birçibûn, durûtî, neheqî bi çavên serê xwe dît. Cehaletî û nezani nas kir. Şêxmûsê biçûk dikewiya, kesayetiya wî ya civakî bi ruh dibû. Dibistan kêman bûn û wî nikarî bixwenda.

Şêxmûs qîma xwe bi vê jiyana bêtê û bêxêr nedianî. Di kûraniya dilê wî de agirekî nenas pêketibû. Dixwest bixwîne û hîn bibe. Di bîranînên xwe de Cegerxwîn dibêje; "Dixwazim herim xwendinê. Lê birayê min mela Xelîl nahêlî ez herim. Em her du bira pevçûn. Û me li hev da keviran. Lê me herduwan jî kevirên xwe avêtin û bi ser hev de giriyân."

Di 8 salan de xwendina 15 salan qedand. Li ber Şêxmûsê şivan û pale dinyaya zanistiyê vebûbû. Di medreseyan Kurdistanê de çand û edebiyata kurdî ya klasîk nas kir. Tîna şîrên Melayê Cizîrî û Ehmedê Xanî di medreseyan de gihîşt kezeba wî û birîna yekemîn di van salên şagirtiyê de di dilê wî de vebû.

Piştî ku medreseyan deştê qedand, çû welatê Soran û ji wir gihîşt Deştê Lehîcanê, nav Kurdistanê rojhilat. Cegerxwîn behsa melayên ku wî li cem wan xwendiyê, dike. Ji mamosteyên wî yek jê, Mela Îskender e. Dibêje; "Mela Îskender muftiyê Dêrikê bû. Ko di Kurdistanê de ji melayên mezin dihate jimartin. Di çaxî wî de çar melayên mezin û

navdar di Kurdistana rojava de hebûn. Mela Ubeydillah li Amûdê, Mela Îskender li Dêrikê, Mela Huseynê Kîçik li Farqînê û Mela Kîçik Efendî li Erbilê."

Jiyana Kurdan a civakî, ziman û zargotina Kurdî û folklorê gel, dilop dilop dadiwe-rivî ruhê wî û di mêjiyê wî de bingeha neqşê şîra wî wisa ava bû. Ev bingeha xurt ku koka xwe ji kûraniya dîrokeke serfiraz distend di dilê wî de mizgîniya katên dareke bi ber dida.

Piştî feqetiyê êdî ew Mela Şêxmûs e. Û sal 1928 e. Mela ji gundê xwe, ji Hesarê, bi keça xalê xwe re dizewice. Dibêje; "Min ji gundê Hesarê, keça xalê xwe Hacî Mistefa, Kehla ji xwe re anî." Ji Kehla du kurên wî çê dibin. Cemşîd û Xurşîd. Belê yek jê berî ku bibe yek salî, yê din berî ku bibe sê salî dimirin. Paşê heft zarokên wan çê dibin. Du kur; Keyo û Azad. Pênc keç; Sînem, Gulperî, Rojîn, Benîsûada û Haştî.

Em ji bîranînên wî agahdar dibin ku, bi şerê Şêx Seîd, kela welatparêziyê di dilê wî de dikele. Û dibêje; "Ez Kurd-perweriyê ji Şewqî Begê Er-xanî hîn bûm." Cegerxwîn di warê olperestiyê de jî di bandora Şêx Mihdî de dimîne. Di warê bîr û baweriyên olî de şik û gûman lê peyda dibe. Dibêje; "Şêx Mihdî, ez ji xewa kev-neperestî bi carek şiyar kirim. Ew sawir û goman bi carek ji serê min dûr xistin. Çavên min di biwara olperestî de vekirin. Gelek tiştên ko kesî newêrabû bibêjî, ji min re digotin. Her tişt dane xuyakirin û ronak

avête ser bîr û baweriyaya min. Ez di vê babetê de deyndarê şêxê xwe me."

Mela bi hestên welatpa-



rêziyê li gundan dest bi melatiyê dike. Li pêşiya gundiyan nimêj dike, mehra gundiyan dibire. Bi fitre û zikatê jiyana xwe didomîne. Jiyana bêxêbat, bi fitre û zikat bi wî giran tê û dev ji melatiya gundan berdide.

Sal 1925 e. Li Kurdistana bakur şerê Şêx Seîd dest pê kiriyê. Kurdan piştgiriya Şêx Seîd nekir. Şer şikest. Şêx Seîd û hevalên wî hatin daleqandin. Bi milyonan kurd koçber bûn. Rewşenbîrên kurdan mecbûr man ku welêt biterikînin.

Vê bûyerê tesîreke mezin li ser Mela Şêxmûs hişt û dest bi nivîsa şîran kir. Bi vî awayî Cegerxwîn, piştî Ehmedê Xanî wek lehiyeke harbûyî bi gurmîn kete nav edebiyat û jiyana kurdaiyê. Wek avbendek

hilşe û ava har, dar û beran bi-de ber xwe belav bibe, hemî deşt û newalan tijî bike, kete nav jiyane. Pêtiyên volqana dilê wî her yek bû şîrek û pijiqî.

Wek hespekî bêgem ajot ser kevneperestiyê û kevneşo-piyên ku li ber pêşketina gel bûbûn asteng. Bi guhertina jiyana xwe dest bi şoreşa civakî kir. Dibêje; "Xişt, tizbî, erbane û defik; top û tangên me bûn. Fi-rîna şêx, keşf keramet; şû-na xwendina bilind, fiz-ya, kîmya û dezgeh girtibûn." Cib, şaşik û riha dirêj avêt, xwe ji bidûketina malê dinyayê rizgar kir.

Pir neçû ew kesên zordest, kevneperest û yên ku bi kirinên xwe ketibûn hambêza îxanetê ji wî aciz bûn. Digotin mela dîn bûye, xurifî ye, kafir e.

### Wî jî di şîra DESTÊ ŞÊX MAÇÎ MEKIN de digot;

*Destê şêx maçî mekin ew şêx ne qutbê razî ye*

*Tac û şewket tev xebata destê sar û tazî ye*

...  
*Ev ne dîn e, dîn mebe, dîn serxwebûna millet e*

*Ser mebe ber lingê şêx, kengê xwedê jê razî ye*

Wî dizanî şêx û mela li ser cehaletiya gundiyan jiyana xwe didomînin:

*Mêrkuj û xwînxwar û hov û bêmirês in bes,*

*Milet nezan e, hêj dibêjî ew ocax in*

Di şîra JI MEZINÊN KURDAN RE de êrîşî rîhdirêjan dike.

*Hinik rîdirêjên me kurdan hene*

*Neyarên reh û ol û koma me ne*

*Dijminên kurdan ne tenê dagirker in, dijminên hundirîn ji wan xedartir in.*

Di helbesta JI KÊ HUN NEWÊRIN de wiha dibêje:

*Şêx û beg û axa dijmin in, xweş mêr in*

*Di bindestê xelkê ne ji we re wek şêr in*

Di şîra xwe ya BEGIM XUYAYE HÛN NATIRSIN de neyaran, bi şêx û axan re rû bi rû dike.

*Hey teres ferqî çi ye*

*Ha neyar xwar ha te xwar.*

Cegerxwîn dixwaze beg û axa jî şiyar bin, belê bêfeyde ye.

*Çi qas bêjim bêfeyde ye, wek bilûra ber ga*

*Ax ji destên we şêx û melan ez bûm Cegerxwîn.*

Melayên Kurdistanê jî wek gundiyan feqîr in, ne wek şêxan in. Cegerxwîn ji wan bi hêvî ye û gazî wan dike, dibêje hûn çima ranabin.

*Dimrin li çolan bêkefen*

*Dîsa tu ranabî mela*

Paşê dibêje de ka em dirêj nekin.

*Ez dizanim pir dirêj kir, min li te peyv û kelam*

*Ger tu kurd û kurdperest bî, em bira ne wesselam.*

*Cegerxwîn pêwendiyên x-*

we ji "dîn" dibire û vedigere ser dînê Kurdan yê kevnare. Di şîrên xwe de bi Zerdûştîyê, bi Mishefê û bi Laleşê sond dixwe. Ne ku baweriya wî bi Zerdûştîyê tê. Ji ber ku Zerdûştî dînê kurdan ê kevn e. Sedema

**Jiyana Kurdan a civakî,  
ziman û zargotina  
Kurdî û folklorê gel,  
dilop dilop dadiwerivî  
ruhê wî û di mêjîyê wî  
de bingeha neqşê şîra  
wî wisan ava bû. Ev  
bingeha xurt ku koka  
xwe ji kûraniya  
dîrokeke serfiraz distend,  
di dilê wî de  
mizgîniya katên dareke**

lê xwedî derketina Zerduştîyê ev e. Ji bo Cegerxwîn çi kurd be, ew hêja û pîroz e.

*Ev çi şêx û çi mela ne, çi keşîş û çi feqîr*

*Ev çi mizgeft û çi dêr in bes e Laleş me dî her.*

...

*Belê sondê dixwim carek bi Laleş*

*Bi Zerdest û bi roj û heyv û ateş*

Di Zerduştîyê de xweşdîtineke nûjen heye. Gotiye BI DIL HER KES GUNEHKAR E

*Evîndaran guneh nîne wisa ferman kirî Zerdest*

*Bi dil her kes gunehkar bi dev her kes misilman*

Di şîrekê de li xwe mukir tê û wisa dibêje.

*Ateşperest im min sofîyê hezretî Zerdest*

Ew çi qas bi Zerdestîyê sond dixwe jî, zilfên reş ên yarê ji wî re biqîmettir e.

*Xirqe li min kir ne bi zor Êzîdiya şengar û tor*

*Gazî me kir em birne jor Zanî me Laleş kabe ye*

*Min ser tewand ber Laleşê Armanc bi xwe zilfa reşê*

Yekcaran ew ji ber evîna yarê, ji dîn derdikeve.

*Min maçê leb û dêm çenê birye bi talan*

*Lê yar ji me bir, dîn û dil û mezheb û adat.*

Cegerxwîn di gelek şîrên xwe de pesnê Ehmedê Xanî dide û wî mîna pêxemberekî dibîne. Di şîra RÊBERÊ ME SEYDAYÊ XANÎ de hezkirina xwe weha tîne ziman.

*Ne pêxemberên me ne Zerdest û Mezdek û Manî*

*Yek rehberê me heye Seydayê Xanî*

Di şîreke din de navê Ehmedê Xanî û Melayê Cizîrî dide.

*Du Ehmed min ji bo xwe kirne rêber*

*Cizîrî yek ewê dî Xaniyê min*

Di şîrên Cegerxwîn de xuya ye ku ji bilî du Ehmedan, Hecî Qadirê Koyî, Bêkes, Hecar û Feqiyê Teyran bandoreke xweş li ser wî hiştine.

Sal 1932 ye. Li Şamê kovarek der tê. Navê kovarekê HAWAR e. Piştî şikestina şerê Şêx Seîd gelek rewşenbîrên kurdan reviyane çûne "Binxetê" CELADET ELÎ BEDIRXAN ji wan yek bû. Celadet, çend

rewşenbîrên hêja li dor Hawarê aniye ba hev. Di nava wan de hinek kes hene ku di têkoşîna gelê kurd û di edebiyata gelê kurd de tu caran navên wan nayên jibîrkirin.

Celadet, li Şamê ye û li derdora wî Osman SEBRÎ, Qedrî CAN, Dr. Nazîf BEG û birayê wî Kamûran BEDIRXAN hene. Û dane ser rîyeke pîroz, Hawarê diweşînin. Wê 32 hejmarên kovarê derkeve. Hawar di demeke kurt de dibe hêvî û hewara kurdan

Hawar û Cegerxwîn mîna du evîndarên ji hev bidûrketî digihîjin hevdu. Cegerxwîn jî di nav kadroyên Hawarê de ci-hê xwe digire KIRYARÊN HAWARÊ re şîrekî dinivîse, daxwaza lê xwedî derketina Hawarê dike.

*Ey serbilîndê kurdî kesên Hewar divêtin*

*Divê Hewar xwedî kin bi her hewa û halî*

Hawar gihîştîye hejmara 14'an. Cegerxwîn Hawarê dişîbîne keçeke Kurd a çardeh salî.

*Pir şerm e ku Hawara me ta ebed nemînit*

*Hawar keç e, ciwan e, xweş bûk e çardeh salî*

Wî nexweşî nas kiribû. Nexweşî, "nezanî" û "xizanî" bû. Bêtifaqiyê jî nexweşî diwartir dikir.

*Du derdên me hebûn dijwar û xedar*

*Xizanî yek, ewê dî her nezanî*

*Cegerxwîn kurê te dinalî  
Ji ber jana nezanî û xizanî  
Du derdên me hebûn dijwar  
û xedar*

*Xizanî yek, ewê dî her nezanî*

*Cegerxwîn kurê te dinalî  
Ji ber jana nezanî û xizanî*

Aqil, zanîn û xwendin li ba wî ji her tiştî pîroztir in. Di gelek şîrên xwe de saloxa aqil dide.

*Ew kesê bê xwendin û eql û zanîn*

*Li rêza kera ye çî bi dîn û çî bêdîn*

Dijminan cûdatiya coxrafîk û ziman jî li hember me kiriye asteng û Cegerxwîn me şiyar dike.

*Ferqê lor û zaz û gor û bext çî ye*

*Em hemî kurd û ziman kurdmanci ye.*

Ji bo Cegerxwîn ji Kurdistanê pîroztir tu tişt nîn e. Li ba wî Kurdistan keçek, bûkeke delal e. Dijminan ew revandîye. Namûs e Kurdistan. Kurdistan li hêviya xortên kurdan e.

*Xemlandî me seranser dezgirtîya xorta me*

*Gerden sêvek sor û zer li hêviya merda me*

*Qelen xwîn e ne gewher, kurdîstana kurda me*

*Bê tang û top û leşker, îro*

*we ez berda me*

*Kurdîstana delalim herkes tê min dixwazî*

*Ez pir şox û şepalim min deng daye bi nazî*

Jin û keçên kurdan di jiyana civakî de li paş hatiye hiştin. Bi tevahî xwendin kême e. Belê xwendina jinan kêmtir e. Cegerxwîn têgihîştîye ku jin dest nedine kar û bar xelasî dîr e. Di KEÇA KURD de bangî keçên kurd dike.

*Ey keçê rabe bixwîne da tu serbest her bijî*

*Zû ji xew tû ser hilîne bes bimîne bêmişî*

Tu kes mîna Cegerxwîn nizane pesnê Kurdistanê bide. Delalî û nazdariya wê ya hêjaye ku mirov xwe di ser de bide kuştin.

*Welat yareke pir xweş û dîdar*

*Li ser dinalin hezar evîndar*

*Li rast û çep kuştî birîndar  
Malwêran e ê dosta wî bedew*

Di şîreke din de jî weha pesnê Kurdistanê dide.

*Kurdîstana hilmiştî*

*Ji zêr û gewher miştî*

*Em li ber der dergevan*

*Dijmin tê de rûniştî*

Dîroka Kurdistanê di şîrên Cegerxwîn de tê naskirin.

*Bermayê Mad im kurê*



*Ferhadim*

*Ne kolê Tirk û Faris û  
Bexdad im*

*Kurê Mîtan im xwedî  
binyadim*

*Kurdistana xwe carek  
bernadim*

Ji bo merama dilê xwe, doz û daxwaza xwe bîne ziman tu rê namîne serî lê nade. Bi devê falbazeke qereçî daxwazên xwe dibêje. Di her şîreke Cegerxwîn de derseke sosyolojîk jî heye. Gava mirov şîrê dixwîne jiyana civakî ya wê rojê dinase.

Cegerxwîn, baweriyê bi xebata birêxistinî tîne. Di nava partî û rêxistinên siyasî de dixebite. Li Sûrî li herêma Cizîrê serokatiya "Komîta Aştî" dike.

Cegerxwîn welatparêzekî tund e, belê tu caran nebûye nîjadperest. Berî ku bibe komunist jî di şîrên xwe de doza wekhevî, biratî û aştiya gelan kiriye.

Di şîra DILÊ CEGERXWÎN de her çi qas li dijî tirkan rist nivîsibin jî, aşkera dike ku ew ne dijminê gelê tirk e. Şerê wî bi sazûman û rêveberên tirkan re ye.

*Geh şah e ew, geh bêkes e,  
geh kurd e, geh faris e*

*Geh berber e, geh çerkes e,  
geh tirk e, geh tatar e dil*

Hozanê aştiyê, şîrên aştiyê bi nêrînên xwe yên komunist ve dihûne. Li gor wî dijminatî

ne dijminatîya gelan e. Gelên dinyayê hemî bira ne. Dijmin rayedar in.

*Kurd û Ecem bira ne,  
dijmin tenê koledar*

*Tirk û ereb hevalin dijmin  
Seîd û Bayar*

Li dinyayê çi dibe çi nabe wî hay ji her tiştî heye. Politikaya dinyayê dişopîne û ji bo xelasbûna kurdan li çîrûskê digere. Şerê Korê derdikeve. Cegerxwîn dibêje neçin şer.

*Em şer naxwazin bimrin şer*

**Xemlandî me seranser  
dezgirtîya xorta me  
Gerden sêvek sor û zer  
li hêviya merda me  
Qelen xwîn e ne  
gewher, kurdistana  
kurda me  
Bêtang û top û leşker,  
îro we ez berda me**

*û ceng*

*Me natirsînîn ev qêrîn û  
deng*

*Eger dixwazin silma alemî  
Ji axa Korê derkevin hemî*

Di dema ku ew qomunist bû ji bo Stalîn şîran dinivîse. Û Sitalîn dimire. Sal 1953 ye. Cegerxwîn gelekî xemgîn e. Vê bûyerê mîna reşmizgînekê tîne ziman.

*Dilê Stalîn gernas û hozan*

*Ebed rawesta, deng daye  
cîhan*

Sala 1957'an hevkarîya Cegerxwîn a bi komunistên Sûrî re diqete û ew bi komek hevalên xwe re saziya "Azadî" ava dike. Di 1958'an de Azadî bi "Partiya Demokratên Kurd Li Sûriye" re dibe yek. Di 1959'an de Cegerxwîn bi hilbijartin dibe endamê Komîta Navendî ya PDKS wê salê. Partî wî dişîne Kurdistana Başûr. Li Akademiya Kurdî ya Bexdayê dersên ziman û edebiyata kurdî dide. Piştî du salan, şerê Kurdistana Başûr dest pê dike û Seyda bi şûn de vedigere Sûrî. Bi şîrên xwe piştgiriya şerê pêşmergeyan dike, hêzê dide wan.

Cegerxwîn her dem ji bo gelê kurd şiyar bibe diqire. Qîrîna wî di esmanê heftan de derdikeve

*Bes ji bona we ye ev qîrçîra  
min*

*Lê ez çi bikim hon guh  
nadin şîra min*

*Hon dizanîn lê hon li xwe  
nakin bar*

*Em jî ji ber dilêşî dikin  
hewar*

*Carinan bi berger, carinan  
jî bi nîfir gazî gel dike.*

*Çavên we birjin li hawir  
xwe binêrin, binêrin*

*Cegerxwîn li we dikî qêrîn  
ma hûn ker in guh nakin*

*Bi qêrîne diweste, bêhêvî  
dikeve.*

*Ey Cegerxwîn bes bibêje kî  
heye guh bide te*

*Ji hewar û keser û dengê te  
dil tev bû keder*

Qêrîn, hewar û gaziya Cegerxwîn kurdan ranake ser lîngan, belê kurd roj bi roj şiyar dibin. Û li dor Cegerxwîn komeke evîniyê pêk tînin. Cegerxwîn kêfxweş dibe. Di şîira DINYA NE HÊJA YE de hes-tên xwe weha tîne ziman.

*Ko Cegerxwîn tete bajêr,  
xelkê sûkê hûr û gir*

*Hin ji vir de, hin ji wir de  
tên temaşa sef bi sef*

Cegerxwîn bi xwe jî feqîr e. Ew jî bêşal û qerpal e. Belê, xemên kurdan ji xwe re dike qerpal û pê dilê xwe dinuxumîne.

*Cegerxwîn xemhilgir e li  
ser we dinalî tim*

*Mal nîn e lê xem di ser dilê  
wî de qerpal in*

Xweşdeng û xweşahenga zimanê kurdî di şîrên Seyda de dibe muzîk, dibe wêneyekî jîndar û mirov di dil û ruhê xwe de deng û rengan his dike.

Cegerxwîn bi sedan şîrên evîn û evîndariyê nivîsîne. Ew di nav şerekî bêdawî de bû. Di aliyekî de tade û lédana dagirkeran, di aliyê din de nezanî û xizaniya kurdan. Û birçîbûn, tunebûn, malwêraniya şairekî. Kezeb bi xwîn, dil bi birîn. Dîsa jî ew şairekî diltenik e. Ku xwe bernede hembêza evîne, di bihiştê nedîtbar de nekeve xem

û xeyalan, dil ji nû ve navejine.

Ew aşîqê rindî, çêyî, xweşîkiyê û çelengiyê ye. Û xweşwîsta wî ya herî giranbiha Kurdistan be jî, ew carinan aşîqê keçeke kurd a êzîdî ye. Carinan jî aşîqê lêvşêrîn, memiksêvekê ye. Evîniyên Cegerxwîn bejnzirav, kezî lûle, biskreş in. Bejndirêj in, çavtûj, brûkevan in. Ew jî Zînê çelengtir, ji Xecê bedewtir û ji Şêrînê nazenîntir in. Wek karxezalên kûvî ne. Ew direvin û Cegerxwîn jî wek Sîyabend li dû wan e.

Cegerxwîn mîna gelek rewşenbîr û siyasetmedarên kurdan mecbûr dimîne ku welatê

.....  
**Cegerxwîn welatparêzekî  
tund e, belê tu caran  
nebûye nîjadperest. Berî  
ku bibe komunîst jî di  
şîrên xwe de doza  
wekhevî, biratî û aştiya  
gelan kiriye.**  
.....

xwe biterikîne. Di sala 1979'an de diçe Swêdê. Bi malbata xwe ve li Stokholmê bi cih dibe.

Li welatê xerîbiyê, jiyana penaberî, xebat û eşqa Cegerxwîn neşikand. Ji aliyekî dinivîsî û ji aliyekî ve jî, ji civînekê diçû civîneke din. Rojekê li Almaniyê, rojekê li Fransayê bû. Çû Rûsyayê bû

mêvanê Qanatê Kurdo. Salên wî bi ser 80'yî ketibû. Ev porspiyê kurdan, ev şairê bi bejn û bal ê devliken tu caran newestiya.

Dilê wî bi eşqê ve tijî bû. Di 80 saliya xwe de dinivîse. Ev du ristên wî balkêş in.

*Evîna dil te dil kirye birîndar*

*Bihara min, hemî zer bûn  
gul û dar*

*Me ew rojên ciwanî da bi  
tolik*

*Ketim heştê ji nû ve bûm  
evîndar*

Helbestvanê nemir îro li bajarê Qamîşlo di hewşa mala xwe ya feqîr de razaye.

Û îro gora wî bûye zîyaretgeha kurdan.

Cegerxwîn li dû xwe 17 berhemên weşandî, nêzî bîst berhemên neweşandî wek xezîneyekê ji kurdan re hişt.

Şairê welatparêziyê, şairê serxwebûnê, şairê eşqê, hosteyê wezna arûz û kafiyyeyê, hunermendê zimanê kurdan jiyaneke bi rûmet li dû xwe hişt.

Hezar spas ji wî kulîlka avî ya li ser axa bejî mezin bûbû.

# NIVÎS Û ALFABE DÎROKA NIVÎSÊ

**Raif YAMAN**

Ji afirînên mirovahiyê yên herî mezin yek jî bêguman nivîs e. Gelek awayên nivîsandinê hene. Wênenivîs (pictograms), têgenivîs (ideograms) û sîstema alfabeyê di dîroka nivîsandinê de sê qonaxên bingehîn in. Wênenivîs ji nîşanên (symboles) navên berbiçav (concrete) pêk tên. Dîroka bikaranîna wan heta Dema Qesayê diçe. Kes nizane mirovan kengê, çawan dest bi bikaranîna wênenivîsan kiriye. Li gor hinek nezeriyên (theories) merivan bi rasthatinî peyda kirine, li gor hinekan jî, ji veguherînên bi awayekî xwezayî derketine holê. Hinek şarezahiyên wek Indiyên Bakurê Amerîkayê ji xeynî wênenivîsê, sîstemeke nivîsandinê ya din bi pêş ve nebirine. Têgenivîs ji wênenivîsê diwartir e. Xwedî tevliheviyê zêdetir e. Li gel vê, gelek dimînin hev. Bingeha wan li ser heman tiştî ye, lê nîşanên tîk bikaranîn, ne tenê ji bo anîna zimên a raman û kirinên berbiçav e; ji bo ifadekirina raman û kirinên neberbiçav (abstract) jî tîk bikaranîn. Gelek çandiniyên ku demeke dirêj wênenivîs bi kar anîne, têgenivîs bi pêş ve bi-

rine. Ji bo danîna dengên ku parçeyên peyvan pêk tînin, bikaranîna îşaret an jî tîpan, alfabe sîstemeke nivîsandinê ye. Bi gotineke din hemû tîp an jî îşaretên di nivîsandina zimanekî de ji bo danîna dengên peyvan tîk bikaranîn, alfabe Mors, alfabe ker û lalan, alfabe Deryayîyan û hwd. alfabe taybetî ne. Ev alfabe ne babetên vê nivîsê ne. Sumeran 3500 sal berî bûyîne (Berî bûyîna hezretî Îsa), dest bi bikaranîna sîstemeke wênexet (pictographic) kirine. Di pev re kirina çend wênexetî tîk kirine. Di vê sîstemê de ji 1500î zêdetir nîşanên ji hev cihê yên ku xwendina wê dijwar dikirin, hebûn. Li gor çavkaniyê jî, di tîkxeta sumerî de 20.000 nîşanên hêsan û hevedudanî (composed) hebûne. Nivîsa bizmarî bû alfabe ku nîşanan ji bo danîna fonem (phoneme) û dengên di zimanekî de hene, bi kar bîne. Ev ji bo ku di nivîsandina zimanên din de jî were bikaranîn, hêsanî bû. Ji ber ku nivîsa bizmarî xwedî sîstemeke danganî (phonemic) bû, di nivîsandina gelek zimanên cihêreng ên wek akadî, babilî, kenanî, hîtî, farisiya kevn û ûrtûyî de hat bikaranîn. Lêgerînên dawîn ên arkiozanî, li ser dîroka nivîsê rastiyeke din derxistin holê. Di encama xebata du lêgerînerên hîndî û hîndzanekî amerîkî de, hat dîtin ku 3500 sal berî bûyîne, bi sumeran re di eynî demê de, merivên aîtî şarezayîya Saraswatî li ser tabletan nivîs nivîsîne. Saraswatî, bi navê pêşiyên şarezayîya Indus tîk naskirin. Di

vê nivîsa ku li gor a Indus zêdetir kevn e de dengdêr tune ne. Pergala nivîsa wêne peyv (hieroglyphs) a misiriyan, li gor yên din zêdetir tîk nasîn. Misiriyan, 3000 sal berî bûyîne dest bi bikaranîna wênepeyv kirin. Misiriyan berê bawer dikirin ku, Xwedî ev wênepeyv dane wan. Bi qasî ramanên berbiçav, ramanên neberbiçav jî bi hêsanî pê di-nivîsîn û di heman demê de ji bijîşkiyê bigirin heta lawijên olî, edebiyat, perwerdeyî, qirşûqal û gotinên gelêrî di her warê jiyane de hatiye bikaranîn. Di heman demê de alfabeke tîk jî îcad kirine; lê wênexet tercîh kirin, tenê navbêpeyv (glyphs) nivîsandin.

**Ji afirînên mirovahiyê yên herî mezin yek jî bêguman nivîs e. Gelek awayên nivîsandinê hene. Wênenivîs (pictograms), têgenivîs (ideograms) û sîstema alfabeyê di dîroka nivîsandinê de sê qonaxên bingehîn in.**

Piştî Misira kevn, tu şarezahiyê wênepeyv bi kar ne anî.

Nivîsa çînî ya herî kevn berî bûyîne, di salên 1200î de hat dîtin. Kes baş nizane kengê hatiye îcadkirin. Li ser destpêka nivîsa çînî, du dîtinên nezerî hene. Li gor ramanên hinekan ev ji nivîsên şarezahiyên din hatiye girtin. Ji ber ku hinek nîşanên dimînin nivîsa bizmarî ya sumerî û nivîsa Rojhilata Nêzik hene. Ên din bawer dikin

ku, bi awayekî serbixwe hatiye afirandin. Nivîsa çînî, bi bikaranîna wênenivîsê dest pê kir. Ev di nav demê de veguherî têgenivîsa ku îro hîna li gel sîstema wan a kîteyî (syllabic) tê bikaranîn. Di çînî de ji 40,000'î zêdetir tîpdirûv (characters) hene. Paşê japonan sîstema wan a nivîsê li zimanê xwe yê zor cihê anîn. Mayayên ku li Amerîkaya navendî jiyanê, peyvên (glyphs) ku piraniya wan ji wênen ajelan pêk tên, bi kar anîne. Ji ber vê gelek merivî baweriya xwe pê anî ku wan sîstemeke nivîsa wênexet bi kar aniye. Lê di rastiya xwe de ev nivîseke kîteyî bû. Maya li gel alfabeke 44 tîpî hinek wênenivîs ji bi kar anîne. Mayan tu carî peyvên xwe hêsan nekirine. Dîroka Alfabeke Bi qasî 1000 sal berî bûyîna fenîkiyan alfabeke îcad kirin. Nivîsîn û xwendina bi alfabeke fenîkiyan hêsan bû. Di alfabeke wan de 22 tîp hebûn. Tê de dengdêr tune bûn. Ji ber ku di zimanê wan de zêde dengdêr tune bûn. Alfabeke wan destpêka alfabeke îro tê bikaranîn. Peyva "alfabeke" jî ji navên du tîpên wan ên destpêkê "alef" û "bit" tên. Fenîkî, bazirgan û deryavan bûn, diçûn gelek deveran. Ji ber vê alfabeke wan zû belav bû. Dema girekan dest bi bikaranîna alfabeke fenîkiyan kirin, ji bo ku girek hêsanîr kanibin bibêjin, navên gelek tîpan guhartin. Li gor zimanê fenîkiyan di girekî de zêdetir pêwîstî bi dengdêran hebû. Di vê rewşê de girekan li gor pêwîstiyên zimanê xwe dengdêr lê zêde kirin. Ji bo vê kirinê jî, ji alfabeke aramî îşaret girtin, lê watên wan gu-

hartin. Bi gotineke din ev îşaret li zimanê xwe anîn. Pênc sed sal berî bûyîna, di alfabeke girekî de 17 dengdar (consonants) û 7 dengdêr (vowels) hebûn. Di serî de girekan ji alê rastê ve ber bi alê çepê dinivîsîn. Paşê wekî xetên cot ên li ser zewiyê bi hev ve digerin ji alê rastê ve ber bi çepê, ji alê çepê ve ber bi rastê nivîsandin. Ev awayê nivîsê bi navê vegera gê (bûstrofêdon) tê binavkirin. Di girekî de bûs ga ye, strofên jî vegeerî e. Ji berî bûyîna 200 salî bi vir de, her tîş ji alê çepê ve ber bi rastê ve nivîsandin. Girekan dest bi nivîsîna tîpên gir kirin. Li ser

.....

**Lêgerîna dawîna  
arkiozanî, li ser dîroka  
nivîsê rastîyeke din der-  
xistin holê. Di encama  
xebata du lêgerînerên  
hîndî û hîndzanekî  
amerîkî de, hat dîtin ku  
3500 sal berî bûyîna, bi  
sumeran re di eynî demê  
de, merivên aîfî şarezayîya  
Saraswatî li ser  
tabletên nivîsîna.**

.....

kevîran bi tîpên gir, li ser papîrûsan û tabletên findî, bi tîpên biçûk dinivîsîn, nola du alfabeke ji hev cihê li wan dinihêrin. Girek deryayî bûn û li çar aliyên Deryaya Spî digeriyan, di vê rewşê de alfabeke wan li Ewropayê belav bû. Etrûsk li navenda Îtaliyayê dijiyan. Alfabeke etrûskan a 26 tîpî ji alfabeke girekî hatiye girtin. Hemî tîp nedihatî bi-

karanîn, ji ber ku di alfabeke girekî de hebûn wan ew bi hêsanî girtibûn. Di destpêkê de navber ji bo ji hev cihê kirina peyvên nehatiye bikaranîn. Hemî peyv bi hev ve tên nivîsandin. Demekê bi şûn de ji bo ku peyvên ji hev cihê bikin dest bi bikaranîna xalên ji hev (dots) kirin. Di nav demê de kîte jî cihê hatin nivîsandin. Etrûskan jî fena girekan pêşiyê ji aliyê rastê ve ber bi alê çepê nivîsandine, paşê bûstrofêdon nivîsîne. Di nav demê de, ji aliyê çepê ber bi rastê nivîsîne. Berî bûyîna di salên 510'î de dema ku Roma ket bin serdestiya keyên etrûskan, romiyan dest bi bikaranîna alfabeke etrûskîyan kirin. Di vê demê de jî, romiyan bi latînî axaftina xwe domandin. Piştî serdestiya etrûskan bi dawî bû, romiyan di vê alfabeke de hinek guhartin pêk anîn. Romiyan tîpên *j, u, w, y û z* li alfabeke zêde kirin. Romiyan jî berê mîna etrûsk û girekan alfabeke bi kar anîn. Di sedsala yekem ya bûyîna de hemî tîp bi hev ve dinivîsîn. Di nivîsandina belgeyên fermî û zêdekirina pirtûkan de bikaranîna tîpên gir gelek zeman digirt. Tîpên gir û biçûk nola du alfabeke ji hev cihê didîtin. Piştî bûyîna di salên 700 î de, dema pirtûka bi navê Charlemagne, the Holy Roman Emperor, ji nû ve bi destan hat nivîsandin, destnûseran dîtin ku bi tîpên biçûk hêsanîr û zûtir tê nivîsîn, lê tîpên mezîna xweşîktir xuya ne, cara yekem tîpên gir û biçûk bi hev ra hatin bikaranîn; tîpên destpêka hevok û navan gir hatin nivîsandin. Alfabeke latînî ji alfabeke etrûskan û nivîsîn

din ên îtalîk pêk tê. Bi serdestiya Împaratoriya Romiyana û desthilatdariya dinyaya rojava alfabeya latînî bi serê xwe li welatên bindest belav bû. Di dema bikaranîna alfabeya roman de, îşaretên nivîsandinê bi cih nebûbûn. Navber ji bo ji hev cuda kirina hevokan dihat bikaranîn. Di salên 780'î de cara yekem îşareta pirsê hat bikaranîn. Îşaretên nivîsê yê din paşê derketin holê. Di sedsala heştan de keşên Îngilîstan û Îrlandayê navber ji bo ji hev cihêkirina peyvana bi kar anîn. Sala 863'an alfabeya kirîl hat îcadkirin. Du keşên xirîstiyana ji bo nivîsandina zimanên silav ev alfabe îcad kirin. Di van zimanan de gelek deng hebûn. Ne alfaba girek ne jî ya roman têr nedikir. Wan jî di rewşeke wiha de her du alfabe li nav hev xistin û jê alfabeya kirîlî ya îro di zimanê ûris û gelek zimanên din de tê bikaranîn, amade kirin.

#### Haletên nivîsê û alfabeyê

Afirandina haletên nivîsandinê hikariyeke mezin li ser guherîna dirûvên tîpan kir. Dema ku nivîs li ser kevîran bi kertkirinê dihat nivîsandin, tîp xwedî koşên tûj bûn. Ji ber ku kişandina xetên gilover û qov zor dijar bû. Bi bikaranîna papîrûs, tabletên fîndî, postên ajelan, kaxiz, hîbr û pênûsê re dirûvê tîpan gelek guherî. Piraniya tîpên ku berê bikoşe bûn, dirûvên qov û gilover girtin. Piştî bûyînê di salên 600'î de çîniyan haletekî çapkirinê yê bi tîpên cih guherbar çêkirin. Di heman demê de li gor

welatên din ên dinyayê zêdetir berhemên nivîskî weşandin. Di vê demê de li Ewrûpayê pirtûk bi destnivîsê dihatin zêdekirin, ji ber vê sebebê jî biuhatir bûn. Vî karî zêde zeman digirt. Piştî Charlemagne welatan dest bi pêşvebirina awayê nivîsandina tîpên xwe kirin. Di demeke kurt de li gelek welatî heman tîp bi dirûvên dûrî hev hatin nivîsandin. Piştî bûyînê, di sala 1438'an de Gutenberg makîna çapkirinê ya xwedî tîpên cih guherbar çêkir. Piştî afirandina sîstema çapkirinê, helwesta ji hev cihê nivîsandinê, bi dawî bû. Ji ber ku nivîsar (printers) kêrî gelek setên tîpên cihê nedihatin û wan jî dixwastin ku pirtûkên wan li çar aliyê Ewrûpayê bîrînin. Di vê demê de çapkirin hêj gelek dijar bû, ji ber ku qalibê ji bo rûpelekî dihat amadekirin, kêrî bikaranîneke duwem nedihat. Di tîpnivîsek çîniyan de bi qasî du hezar tîpdirûvî hene. Ev nivîsê dijar tîr û hêdîtir dike. Lê niha temamiya 40 hezar tîpdirûvî di bîra (memory) zanokê (computer) de hatine bicihkirin û di vê rewşê de zêdetir tîpên pê tîpên zimên. Bi afirandina tîpnivîs, çapxane û zanokê, tîpên alfabeyên cihê-reng jî, dirûvên xwe yê standard girtin. Tîpên alfabeya latîn jî di encama van guherînan di warê haletên nivîsandinê de dirûvên xwe yê îro girtin. Deng û tîp dema ku gelekî alfabeya zimanekî girtiye û li zimanê xwe aniye, ne tenê li zimanê xwe anîne. Tîpên zêde yê wan alfabeyan jî girtine

û ew tîp di nivîsandina peyvên zimanê ku alfabe jê girtine de, bi kar anîne. Alfabeya osmanî û farisî jî erebî hatine girtin. Tîpên ku ji bo dengên ku di van her du zimanan de tune ne, lê di erebî de hene, di alfabeyên van zimanan de cih digirin û ev tîp di nivîsandina peyvên erebî de tîpên bikaranîn. Meriv kane alfabeya kurdî ya bi tîpên erebî jî di vî warî de mînak bide. Di nivîsîna peyvên firenkî de tîpên /k/ û /w/ tune ne, lê di alfaba firenkî de ev tîp hene. Van tîpan tenê di nivîsandina peyvên biyanî de bi kar tînin. Dîsa di firenkî de dengên /ç/ /x/ û /ç/ tune ne, lê ji bo nivîsandina van dengên dudengên (dîptongs) standard ên wek DJ, KH, TS û

.....

**Bi qasî 1000 sal berî bûyînê fenîkiyan alfabeyek îcad kirin. Nivîsîn û xwendina bi alfabeya fenîkiyan hêsan bû. Di alfabeya wan de 22 tîp hebûn. Tê de dengdêr tune bûn. Alfabeya wan destpêka alfabeya îro tê bikaranîn. Peyva "alfabeyê" jî ji navên du tîpên wan ên destpêkê "alef" û "bit" tîp.**

.....

sêdenga TCH tê bikaranîn. Di almanî de dengê /c/ tune ye, lê ji bo nivîsandina peyvên biyanî pîncdenga DJSCH tê bikaranîn. Di peyvên tirkî de dengê /j/ tune ye. Lê di alfabeya tirkî de tîpa /j/ heye û di nivîsandina

peyvên ji zimanên biyanî ketine tirkî de tê bikaranîn. Di zimanê Avestayê de dengê /l/ tune ye, lê îro di farisî de jî, di kurdî de jî, ji bo nivîsandina vî dengî tîpek heye. Di zaravê soranî de ji bo dengê /l/ya stûr tîpeke din tê bikaranîn. Dema ku gelekî alfabeya gelekî din girtiye û li zimanê xwe aniye, dengên ku ji bo nivîsîna wan di alfabeyê de tîp an jî nîşan tune bin, tim li derdora tîpa dengê nêzik li çareseriyê geriyane. Efxan, faris, kurd, ûrdû, tirk û gel û netewên piştî pejirandina ola îslamê dev ji alfabeyên xwe yên neteweyî berdane, an jî, nû bi alfabeya erebî dest bi nivîsandina zimanê xwe kirine, dengên di van zimanan de hene, lê di erebî de tune ne, bi hinek guherînen li ser tîpên di erebî de dengên nêzikî dengên pêwîst didin, gelşên xwe yên alfabeyî çareser kirine:

Di erebî de dengên /g/, /ç/, /j/, /p/, /o/, /ê/ û /v/, tune ne. Ji bo nivîsandina zimanên ku tê de ev deng hene hinek îşaretên wek sê nuqte, kumik û xetek danîne ser tîpên erebî kef, cîm, zê, bê, waw, yê, fê. Di alfabeya kurdî ya bi tîpên erebî ya ku îro hîna ji aliyê kurdên Başûr û Rojhilat ve tê bikaranîn de, bi heman awayî îşaretekê datînin ser lam û rê ya erebî û bi vî awayî dengên stûr ên /rr/ û /ll/ jî di nivîsê de nîşan didin. Di zimanên bi alfabeya latînî tîpên nivîsandin de jî, dengên di vê alfabeyê de tune bûne, bi heman awayî lê hatine zêdekirin. Di almanî, frenkî û îngilîzî de bi giranî bi pevdengên ji dengên

tîpên nêzik nivîsandina dengên /ş/, /ç/, /ts/, /x/, /j/, /û/, /c/, /ü/, /ö/ di zimanên balkanî û îs-kandînavî de bi danîna ser tîpên dengên nêzik bi hinek îşaretan ev gelşa nivîsandinê hatiye çereserkirin. Di alfabe-ya rûmenî, macarî, polonî, tirkî û hinek wek ên din de jî bi danîna îşaretên ser tîpên di alfabeya latînî de dengêkî nêzik

**Dema ku gelekî alfabeya zimanekî girtiye û li zimanê xwe aniye. Tîpên zêde yên wan alfabeyan jî girtine û ew tîp di nivîsandina peyvên zimanê ku alfabe jê girtine de, bi kar anîne.**

**Alfabeya osmanî û farisî ji erebî hatine girtin.**

**Tîpên ku ji bo dengên ku di van her du zimanan de tune ne, lê di erebî de hene, di alfabeyên van zimanan de cih digirin û ev tîp di nivîsandina peyvên erebî de tîpên bikaranîn.**

kî dengê pêwîst didin tîpê, hatine zêde kirin. Tîpa /j/ ya alfabeya latînî ya standard di zimanên bi sedsalan e bi vê alfabeyê tîpên nivîsandin de ji bo dengên ji hev cihê tê bikaranîn. Ev tîp di îtalyanî û almanî de ji bo dengê /y/, di frenkî de ji bo dengê /j/, di îngilîzî de ji bo dengê /c/ û di sipanî de ji bo dengê /x/ tê bikaranîn. Tîpa /x/yê di zimanên ji mêj ve bi alfabeya latînî tîpên nivîsandin

de ji bo dengê /ks/ê an jî /qs/ û /ss/ê tê bikaranîn. Ev tîp tenê di alfabeya zimanê baskî de ji bo dayîna dengê /ç/ û di kurdî de ji bo dengê /x/ tê bikaranîn. Gelên ku di nivîsandina zimanê xwe de alfabeya kirilî bi kar tînin jî bi heman awayî alfabe li zimanê xwe anîne û pê dengên di zimanê xwe de dinivîsin. Di nav gelên ku herî baş ev alfabe li zimanê xwe aniye û dengên bingehîn ên zimanê xwe bi vê alfabeyê baş nivîsandine yek jî gelê kurd e. Kurdan ji bo nivîsandina zimanê xwe ligel danîna hinek îşaretan a li ser tîpên kirilî yên dengên nêzikî yên di kurdî de, du tîp jî ji alfabeya latînî ya îro girtine û lê zêde kirine. Baş tê xuyakirin ku ev alfabe ji aliyê zimanzanan ve li zimanê kurdî hatiye anîn. Heman rewş ji bo gelên din yên bi alfabeya kirilî dinivîsin jî rastiyeke ku nayê înkarkirin. Alfabeyên komarên tirk ên ku vê alfabeyê bi kar tînin jî, ji aliyê nivîsandina dengên van zimanan ve tîkûz in. Guftûgoyên li ser guherîna alfabeyên zimanên komarên tirkofon ên sovyeta berê zêdetir ramyarî ne. Ên ku dixwazin ji vê alfabeyê derbasî alfabeya latînî bibin, bi du armançî ve dixwazin. Gelên li van komaran dijîn dixwazin zêdetir bibin parçeyekî dinya rojava û zêdetir ji haletên nivîsandinê yên rojavayî sîdê wergirin. Tirkiye û hinek derdorên ramyarî yên van komaran dixwazin ku din-ya tirkofon bibe xwedî alfabeyeke hempar. Îro kurd jî hema hema bi heman armançan

dixwazin bi temamî derbasî nivîsa bi alfabeya latînî bibin.

### **Dîroka nivîs û alfabeya kurdî**

Kurdî li gor şert û mercên demên dîrokî bi alfabeyên cur bi cur hatiye nivîsandin. Ji ber tunebûna îstîkrara ramiyarî tu demê kurd nebûne xwedî alfabeyeke neteweyî. Medan li alfabeya bizmarî ya ûrartûyan 6 tîp zêde kirine û alfabeyeke ji 42 tîpan amade kirine. Alfabeya ûrartûyîyan bi tîpên xwe yên heyî têrî nivîsandina dengên bingehîn ên medî nekirîye. Ji bo ku alfabeyê li zimane xwe bînin, şeş tîp lê zêde kirine. Li gor hinek çavkaniyan alfabeya avestî ji 44 tîpan, li gor hinekan jî, ji 48 tîpan pêk tê. Alfabeya avestî ji aliyê çepê ber bi aliyê rastê ve tê nivîsandin. Alfabe navê xwe ji kitêba pîroz a Zerdest Avestayê digire. Nivîsên kurdî yên di hinek şikeftên herêma Hewramanan de hatine dîtin bi alfabeya aramî hatine nivîsandin. Di van nivîsên li ser postên xezalan hatine nivîsandin de, jiyan û bazirganiya wê demê hatiye zimên. Ji van nivîsan a herî kevn berî bûyîna di salên 88-87'an de hatiye nivîsandin. Di vê alfabeyê de 22 tîp hene. Di nivîsandina pirtûka Dînerd a bi zaravê lorî de alfabeya pehlewî hatiye bikaranîn. Ev alfabe ji 24 tîpan pêk tê. Guftûgoyên li ser zimane pehlewî hîna bi dawî nebûne. Li gor lêgerînerên fars û hin îranzanan ev ziman farsiya

kevn e. Li gor lêgerînerên kurdî jî, kurdiya kevn e. Li gor hinek lêgeran alfabeya Masî Soratî ji aliyê kurdan ve hatiye afirandin. Ev alfaba ji 37 tîpan pêk tê. Tîpên wê dimînin ên Pestî Avestayê. Heta hatina ola îslamê li gel vê alfabeyê, alfabeyên aramî, suryanî û grekî jî di nivîsandina kurdî de hatine bikaranîn. Di amadekirina alfabeya êzîdiyan de ji alfabeyên avestî, pehlewî û erebî sûd hatiye wergirtin. Ev alfaba xwedî 31 tîpî di nivîsandina kitêbên pîroz ên êzîdiyan Mis-hafa Reş, Kitêbê Cilwê de hatiye bikaranîn, îro jî di nivîsên olî yên êzîdiyan û jiyana rojane de tê bikaranîn. Ev alfabe ji aliyê kê ve û kijan demê hatiye çêkirin nayê zanîn. Piştî ku piraniya kurdan ola îslamê pejirandin, dest bi bikaranîna alfabeya erebî kirin. Pêşiyê li vê alfabeyê 6 tîp zêde kirin. Di sala 1913'an de Salîh Bedirxan 8 tîp li alfabeya osmanî zêde kirin û alfabeke 40 tîpî pêşniyarî rewşenbîrên kurd ên wê demê kir. Çend nivîs di kovara Rojî Kurd de bi vê alfabeyê hatine weşandin. Di sedsala bîstan de kurdên başûrî ji alfabeya kurdî ya bi tîpên latînî jî sûd wergirtin û guherîneke din di alfabeya kurdî ya erebî de pêkanîn; 5 tîp lê zêde kirin. Berhemên nivîskî yên kurdî, herî zêde bi vê alfabeyê hatine nivîsandin. Piştî şoreşa li Rûsyayê, kurdên Kafkasyayê dest bi bikaranîna alfabeya kirilî kirin. Hinek tîpên alfabeya latînî li vê alfabeyê zêde kirin û bi vî awayî alfabeyeke ji 31 tîpan

amade kirin. Ev alfabe hîna di nav kurdên li ser xaka Sovyeta kevn dijîn de, tê bikaranîn, ji alî bersivdayîna dengên kurdî ve, ya herî pêş ev e. Piştî vê, alfabeya kurdî ya bi tîpên erebî tê. Alfaba kurdî ya bi tîpên latînî ya heta îro tê bikaranîn, di 1932 an de, ji aliyê parêzer Mîr Celadet Bedirxan ve ha-

**Nivîsên kurdî yên di hinek şikeftên herêma Hewramanan de hatine dîtin bi alfabeya aramî hatine nivîsandin. Di van nivîsên li ser postên xezalan hatine nivîsandin de, jiyan û bazirganiya wê demê hatiye zimên. Ji van nivîsan a herî kevn berî bûyîna di salên 88-87'an de hatiye nivîsandin. Di vê alfabeyê de 22 tîp hene.**

tiye amadekirin û cara yekem di kovara Hawarê de hatiye bikaranîn. Ji roja destpêkê heta îro gengeşiyên li ser kêmasiyên wê didomin. Ev alfabe ya nivtirkî û nivfrenkî bersîva pêdiviyên kurdî nade. Di nav her sê alfabeyên kurdî yên îro di nav gel de tên bikaranîn de, ya herî bêrêkûpêk e. Ji ber ku amadekarê wê û piraniya merivên xwastine biguherînin, zimanzan nebûn. Osman Sebrî ji aliyê dangan ve kêmasiya alfabeyê aniye bîra Celadet Bedirxan, lê bersîva wî aşkera da-ye xuyakirin ku ji dêvla alfabeyê li zimên bîne, ziman li alfabeyê

aniye; ji dangan zêdetir hejmarê tîpan derxistiye pêş û xwastiye vê çewtiya xwe bi kêmasiya alfabeya kurdî ya bi tîpên erebî rast nîşan bide. Li ser vê helwesta wî, Tewfîq Wehbî xebata pê re li ser alfabeke standard a ji bo hemî zaravayên kurdî bi dest nexistiye. Ji demên herî kevn heta îro, gelan tim alfabe li zimanê xwe anîne. Riya zanînê jî ev e. Di nav van rewşên bîrên kurd de, çend zimanzan û wêjezanên wek Qanatê Kurdo jî nikanibûne tu rastiyekê bi yê din bidin pejirandin. Li gorî van "zimanzanên" me yê hêja, her tişt hatiye li ser bikaranîn û ne-bikaranîna kumikê tîpekê maye. Li ku devera dinyayê zimanzanî bûye mijara guftûgo û gengeşiyên ew qas basît? Li ku meriv û saziyên divê alfabe yê bi kar bînin, rabûne ji zimên re alfabe çêkirine. Ji ber vê yekê, di civînên heta îro hatin li darxistin de, bi qasî serê derziyê jî pêşveçûneke ber bi çareseriyê derneketiye holê. Ji ber ku ne mimkûn e. Divê êdî her kes di warê pisporiya xwe de bixebite û êdî kes ji kesî re nebe asteng. Hobî û pisporî ne heman tişt in. Di nav me kurdan de, her merivê ku li ser rêziman, rênûs, ferheng an jî perwerdehiya zimên çend gotin gotibin, an jî çend hevok nivîsibin, hema bi navê zimanzan deng didin. Ev rêziman, ferheng, rênûs an jî pirtûkên perwerdehiyê çî qas li gor pîvanên zanistî hatine amadekirin, ji bo zimanzanên kurd ên xwedêgiravî hêj nebûne xwedî

hêjahiyekê. Li aliyê din her merivê pirtûkeke baş a rêzîmên, rastnivîs, hînkirina zimên binivîse û çap bike, an jî ferhengeke baş a zimanekî binivîse jî, ne mecbûr e zimanzan be. Piraniya zimanzanên bi nav û deng ên wek Alfred de Saussure, Jakobson, Noam Chomsky û hwd. li ser van waran tu berhemek jî nedane. Tu carî bi hezaran merivên li ser van warên jorîn berhemên giranbiha dane jî, hemî bi navê zimanzan nehatine binavkirin. Rêziman û rênûsa hêja ya firenkî Le Bon Usage ji aliyê mamostekî firenkî ve hatîye nivîsandin. Bi qasî raya giştî û pisporên rêzîmên, ji aliyê zimanzanan ve jî bi navê berhemeke hêja û giranbiha hatiye binavkirin. Tu kesî ev mamoste wekî zimanzanekî bi nav nekiriye. Li gor pîvanên zanînê ji kê ra zimanzan tê gotin aşkera ye. Gelên ku îro di nivîsandina zimanê xwe de alfabe ya latînî bi kar tînin, her yekî tîpên vê alfabe yê li zimanê xwe anîne. Heman tîpên dengdêr û dengdar di nivîsandina zimanên cur bi cur de, bi qasî ji bo heman dangan, ji bo dengên nêzîkî hev û dengên li gor veguherînên dengîn (phonologic) bi hev re têkildar in jî hatine bikaranîn. Heman rewş ji bo pevdengan (diphthongs) jî rastiyekê zimanzanî ye. Li ser vê bingehê ji bo dînya kurdofon amadekirina alfabeke standard a kanibe bi hêsanî bersivê bide hemî dengên xwedî hêjahiya ji hev derxistina du peyvyan (valeur pertinent) û

pîvanên din ên zimanzanîya hemdem li kurdî anîna vê alfabe yê peywira me ye. Ji ber ku piraniya kurdan ji bo duwarojê di bikaranîna vê alfabe yê de hemraman in. Vê alfabe yê em bi vê nivîsê pêşniyarî we dikin, li ser vê bingehê hatiye amade kirin.

### Alfabeya nû ya kurdî

Di alfabe ya kurdî de 26 tîp hene. Tîpên gir: A, B, C, D, E, F, G, H, I, J, K, L, M, N, O, P, Q, R, S, T, U, V, W, X, Y, Z  
Tîpên biçûk: a, b, k, d, e, f, g, h, i, j, k, l, m, n, o, p, q, r, s, t, u, v, w, x, y, z

### Bikaranîna tîpan:

A: mîna "A"ya berê tê xwendin: av, ard, ta, der, agha, al, van...

B: mîna "B"ya berê tê xwendin: baz, beand, bi, bouc, bera, buhurin, buhar...

C: mîna "K"ya kalo tê xwendin: cani, cen, con, ceaj, ca, culli, cund, ceim...

D: mîna "D"ya berê tê xwendin: dar, dac, doz, durr, diten, dems, dealal...

E: mîna "I"ya berê tê xwendin: del, gers, pers, beren, ceren, mex, tegh...

F: mîna "F"ya berê tê xwendin: Fearat, fend, fero, fit, ferar, foll, farsi...

G: mîna "G"ya berê tê xwendin: geall, gian, gorea, gul, goushi, goten, guloc, gazin...

H: mîna "H"ya berê tê xwendin: haten, heivar, hodea, hozan, hour, heavir, hiro, hesh-ten...



I: mîna "ê"ya berê tê xwendin: iro, isal, isot, icar, Iran, isheav, iscec, in...

J: mîna "J"ya berê tê xwendin: jir, jan, jor, jouji, jen, jeir, jin...

K: mîna "K"ya kurd tê xwendin: kean, kelam, kor, kour, kum, kash, kendj...

L: mîna "L"ya berê tê xwendin: law, lor, listen, learezin, leiv, lotec...

M: mîna "M"ya berê tê xwendin: masi, mam, meah, meir, mej, mina, mezgin, moz, muzic, Moush...

N: mîna "N"ya berê tê xwendin: na, neah, neirgez, nevis, nivro, noc, nousear...

O: mîna "O"ya berê tê xwendin: ol, org, ordeac, ogher, ox, oqyanous...

P: mîna "P"ya patin tei xwendin: peleng, peir, pari, pir, ponejin, poung, peapo...

Q: mîna "Q"ya berê tê xwendin: qalouts, qout, qeat, qit, qouts, qoregh, qurs...

R: mîna "R"ya berê tê xwendin: rast, rend, reaz, rei, , roj, ris, rou...

S: mîna "S"ya berê tê xwendin: sar, seawz, seil, seng, sing, sor, sousec...

T: mîna "T"ya tîrêj tê xwendin: tav, tir, teang, teri, touj, tersh...

U: mîna "U"ya berê tê xwendin: tu, gur, du, gulan, curr, buhar...

V: mîna "V"ya berê tê xwendin: van, veaceren, veisanden, verni, vi, volt...

W: mîna "W"ya berê tê xwendin: war, wei, wi, wealat, wer...

X: mîna "X"ya berê tê xwendin: xani, xeawn, xeiv, xurt, xouz, xezan, xoshav..

Y: mîna "Y"ya berê tê xwendin: yar, yom, yeaqin, ya, yeac...

1- Di nav dengdêrên I, A, O'yê da nayê nivîsandin: jian, diar, koi, bioc, sai, paiz, zain, baoci, goi, xweadao, aghao...

2- Gava peyva pêşîn bi dengdêrê biqede, li serê peyva li pey tê nayê nivîsandin, lê mîna ku nivîsandî be tê xwendin: Ba e. Thi e. Chawa i? Ki i? Rou e. Le ku e. Tu i. A kei i? Ei kei e? Sai e. Wi a xwe got. Wea ein

wan ji anin. Reasho i li jor ea. Agha ei li jor e. Berfei a li rastei e.

Z: mîna "Z"ya berê tê xwendin: zanin, zeand, zendi, zei, zin, zo, zou...

Xwendin û bikaranîna pevdengan EA: mîna "E"ya berê tê xwendin: eam, eaw, eaz, neaw, cealeam, bear, zear, cheall...

1- Le pey pevdengên KH û XH'yê dengê di nav A û A-E'yê da dide: kheawr, heard, kheayni, Kheali, xheaci, xhealal, xheash...

CH: mîna ç'ya çawa tê xwendin: char, choc, choun, chei cheang, chortan...

CS: mîna SEI'ya erebî tê xwendin. Ev pevdeng di transkrîpsiyona berhemên kurdî yên bi alfabeya erebî hatine nivîsandin de tê bikaranîn. Di nivîsên zaravayên kurdî yên xwedî vî dengî ne de jî tê bikaranîn.

DH: mîna "DAT"ya erebî tê xwendin. Ev pevdeng di transkrîpsiyona berhemên kurdî yên bi alfabeya erebî nivîsandî de tê bikaranîn. Di nivîsên zar-

avayên kurdî yên xwedî vî dengî ne da tê bikaranîn.

DJ: mîna 'C'ya berê tê xwendin: djan, djigear, djeajn, djeirr, djot, djewan, djouten...

EI: mîna 'Ê'ya berê tê xwendin: eidi, eish, eizeng, eista, eizedi, eithoun...

GH: mîna 'X'ya axû tê xwendin: agha, qachagh, Beaghda, aghou, ghurbet, gaghan...

HX: Dengê di nav "KH, XH û H"yê da dide: tseahxv, meahxr, teahxl, jeahxr, tseahx, yeahx, tuhok...

Li Herêma Botan di şûna vî pevdengê da dengdara "H"yê tê bikaranîn û heman peyv wekî tseahv, meahr, teahl, jeahr tîrêj kirin. Li hin deveran jî ev dengê "pêşiya xwe dirêj dîke û ji bilêvkirinê dîkeve. Di vî rewşê de, heman peyv wekî tsav, mar, tal, jar tîrêj kirin. Di berhevkirina berhemên folklorîk ên edebiyata devkî de bikaranîna her siyan jî peywîst e. Di nivîsandinê de standardkirineke wiha rê li ber nîşandayîna her sê bilêvkirinê jî vedike.

KH: mîna 'E'ya erebî tê xwendin: Khisa, khalim, kheayni, belloukhi, kheawr, khilm, khaleam...

OE: mîna "...ya almanî û tirkî tê xwendin. Ev pevdeng di peyvên biyanî yên zimanên xwedî alfabeyeke derî ya latînî ne de, tê bikaranîn. Di nivîsên zaravayên kurdî yên xwedî vî dengî ne de de tê bikaranîn.

OU: mîna "Û"ya berê tê xwendin: dour, thoum, nou, ou, zou, phouc, rouneshten

PH: mîna 'P'ya pak tê

xwendin: phac, phin, phearr, phorr, pherr, phoush, phesic....

SH: mîna “Ş”ya berê tê xwendin: shevan, shar, shoushten, sheir, shir, sheav, shox û sheang”...

SZ: mîna ‘SAT’ a erebî tê xwendin. Ev pevdeng di transkrîpsiyona berhemên kurdî yê bi alfabeya erebî hatine nivîsandin û nivîsên zaravayên kurdî yê xwedî vî dengî ne de, tê bikaranîn.

TH: mîna “T”ya tirkî tê xwendin: tha, thi, thoum, their, therci, thu, theashi... TP: Dengêkî taybetî yê kurdî yê bi hezandina her du lêvan derdikeve dide: tputp tputp, tpuwi tpuwi...

UI: mîna “Ü”ya almanî û tirkî tê xwendin. Ev pevdeng di nivîsandina peyvên zimanên biyanî, di berhevkirina berhemên folklorîk û di nivîsên zaravayên kurdî yê xwedî vî dengî de, tê bikaranîn. TS: mîna “ç”ya çem tê xwendin: tseam, tselo, tsal, tsenin, tseilec, tsoutsec, tsirr...

XH: mîna “H”ya hût tê xwendin: xheadji, xhile, xhout, xheatta, xheac, xhealanden...

XW: Dengêkî ji bi hev re xwendina “X û W”yê dide: xweanden, xwasten, xwea, xweang, xwaren, xwei....

ZH: mîna” “ZAL” a erebî tê xwendin. Ev pevdeng di peyvên zimanên biyanî da, di tîp-guhestena berhemên kurdî yê bi alfabeya erebî nivîsandî de, tê bikaranîn. Di nivîsên zaravayên kurdî yê xwedî vî dengî ne de, tê bikaranîn.

ZS: mîna “ZI”ya erebî tê

xwendin. Ev pevdeng di transkrîpsiyona berhemên kurdî yê bi alfabeya erebî nivîsandî û di nivîsên zaravayên kurdî yê xwedî vî dengî ne de, tê bikaranîn.

### Dengdêrên dirêj

Dengdêrên bi rewşa xwe ya kurt û dirêj wateyên du peyvan ji hev vediqetînin, di nivîsandinê de tîp nîşandayîn:

AA: dengê “A”ya dirêj dide: xwar (jêr) û xwaar (nerast); thaa (navê nexweşiyekê), tha (alî, teref); kar (qezenc), kaar (xebat, şuxul); sal (12 meh), saal (kevirekî tenik),

AE: dengê “EA”ya dirêj dide: dear (ber û paş), baer (berê rezan)

AU: dengê “O”ya dirêj dide: sol (şekkal), saul (xwê), lor (awayekî penîr); laur (merivên bi lorî di axivin); djot (je lêkerê cot kirin) djaut (vajayê ferê).

EE: dengê “E”ya dirêj dide: ger (meazen), geer (kash, theapea) IE: dengê “I”ya dirêj dide: bir (aqil) bier (bîra avê); bi (dara biyê) bie (jina bî)

OO: dengê “OU”ya dirêj dide: hoor (mîde), hour (biçûk); touj (îsota tûj), tooj (kêra tooj).

UE: dengê “EI”ya dirêj dide: djeirr (cêrê avê), djuerr (weşiyê piçûk); bei (were), bue (bêkes); lei (lê û lo), lue (feqet) Divê bi riya dengzanîna hemdem peyvên hemdeng (hînonym) werin tesbîtkirin. Peyva “XWAR” a di wateya jêr de û peyva “XWAR” a je lêkerê

xwarinê peyvên hemdeng in.

### Dengdarên stûr

Di nivîsandina dengdarên stûr de heman tîp cot tîp nivîsandin. Dengdarên “R û L”yên serê peyvê tim stûr in. Je ber vê yekê peywîst nîn e li serê peyvê stûriya wan were nîşandayîn. Pêşgir, daçek û hevedudanîbûna peyvê, vê rewşê naguherîne. Sê dengdarên je hev, nayên cem hev: dereisea, bereisea, veareshin, neareawesine, dereawesand, dereaweti, belevea, delevea, perreang.... Di nav peyvê û dawîya peyvê de ev dengdar bi “RR û LL”ê tîp nivîsandin. Ev qeyda ji bo dengdarên kurdî yê din jî eynî ye: perr, geall, thunnea, perr, gearreac, phorr, qerrash, zarr, xheannea, djenni,

### Navên tîpan

A : av

B : bî

C : ka

D : dot

E : ê

F : fend

G : gul

H : hay

I : î

J : jîn

K : key

L : lo

M : med

N : new

O : ox

P : pî

Q : qot

R : roz

S : sî

T : tî

U : û

V : vî

**W : war**  
**X : xwe**  
**Y: yar**  
**Z: zend**

**Berhemên jê hatine îstîfadekirin:**

Bedirxan, Emîr Celadet & Lescot, Roger; Kürtçe Grameri, Doz yayınları İstanbul, 1989.

Borakaei (Sefizade), Sadegh. Mêjûyî Wêjeyî Kurdî, Kurdistan, Baneh Hîcrî 1375.

De Francis, John. Visible Speech: The Diverses Oneness of Writing Systems. Honolulu: University of Hawaii Press, 1989.

Ganeri, Anita. The History of Writing and Printing. New York: Oxford University Press, Inc., 1995.

Gaur, Albertine. A History of Writing. New York: Charles Scribner's Sons, 1984.

Grevisse, Maurice. Le Bon Usage. Édition Duculot, Paris - Louvain-la-Neuve (1993)

Haley, Allan. Alphabet: The History, Evolution and Design of the Letters We Use Today. New York: Watson Guptill Publication, 1995.

Jacson, Donald. The Story of Writing.

New York: Taplinger Publishing Co., Inc., 1981.

Jean Georges. Writing: The Story of Alphabets and Scripts. New York: Harry N. Abrams, Inc., 1992.

Karcadağ, Nurettin. Ziman ê Kurdî (Kürt Dili). Kendi yayını, Ankara 1993.

Kovar û rojnamên bi kurdî, kurdî tirkî û tirkî yên piştî 1990 î heta 1999 an ji alî kurdan ve li Tirkiyeyê hatine weşandin.

Kurdo, Qanatê; Gramera Zımanê Kurdî, kurmanci sorani, Koral yayınları, İstanbul 1991. Lecia@geocities.com 19-99.

Robinson, Andrew; The Story of Writing: Alphabets, Hieroglyphs and Pictograms. New York: Thames and Hudson, Inc., 1995. Saûn İç,

Feqi Huseyn; Rêzmanê Kurdî, Melsa yayınları, İstanbul 1991

Siamakr@cogsci.ed.ac.uk 1999 Science & Vie, No: 983, Août 1999

Skoyles, John R. "Alphabets: its origins and history." (17 April 1998). Todd,

Terry Lynn. A Grammar of Dimili (Also Known as Zaza), The University of Michigan, 1985.

Varlı, Ebdullah Memê Mehmed (Hoko); Diroka Dugelên Kurdan. Sipan, İstanbul 1997.

Walker, C. B. F., et al. Reading the Past: Ancient Writing from Cuneiform to the Alphabet. Berkeley: University of California Press, 1990.

**Nîşe:**

Ev nivîsar wek danezan ji Konferansa Zımanê Kurdî ya ku ji aliyê enstîtuya me ve di 16. 04. 2000'î de li Stenbolê çêbû, hatiye şandin

## PLURALÎZMA ÇANDÎ Û DEMOKRASÎ

**Şefik BEYAZ**

Globalîzm di roja me de rastiyeke cîhanê ye. Ev rastî nikare bê înkarkirin. Hêzên ku îro li cîhanê serdest in, hewl didin ku sermaye, teknoloji û zanyarî bi awayekî serbest bigere. Sazûmanên siyasî, wek netewe dewlet ku îro li hember sazûmana nû ya cîhanê asteng in, tên tasfiyekirin, li cihên van, bazar û pergalên siyasî yên hîn îstîkrardar û ewledar tên bicihkirin. Şartên sazûmana nû ya cîhanê zorî didine çandên serdest ku çandên hindika-

*Globalîzm di roja me de rastiyeke cîhanê ye. Ev rastî nikare bê înkarkirin. Hêzên ku îro li cîhanê serdest in, hewl didin ku sermaye, teknoloji û zanyarî bi awayekî serbest bigere. Sazûmanên siyasî, wek netewe-dewlet ku îro li hember sazûmana nû ya cîhanê asteng in; tên tasfiyekirin, li cihên van, bazar û pergalên siyasî yên hîn îstîkrardar û ewledar tên bicihkirin.*

hiyan bipejirîne û bi wan re bi hev re bijîn. Dinamîzma komên neteweyî û neteweperesîtiya hindikahiyan, ji nû ve tarîfkirina demokrasîyê û ji nû ve şekildana pergalên siyasî, kirine rojeva cîhanê. Bi gotineke din, bi geşbûna pirçandîtiyê, demokrasîyên rojavayê pêncî sal zêdetir e ku di nav lêgeranekê de ye.

### TA KU RASTIYA KURDÎ NEYÊ FAMKIRIN KÊŞEYA KURDÎ NAYÊ ÇARESER-KIRIN

Li Tirkiyeyê demeke direj e ku têgeha hemwelatî tê şirovekirin. Pirsgirêka herî girîng ku vê têgehê dike mijara şirovekirinê jî kêşeya kurdî ye. Wekî tê zanîn, li Tirkiyeyê hemwelatîbûn bi şertên tirkbûnê, yan jî pejirandina tirkbûnê ve hatiye girêdayîn. Ev feraset wekî sedema sereke ya pirsgirêkên ku bi hemwelatîtiyê eleqedar in, di serî de jî wekî sedema sereke ya kêşeya kurdî, derdikeve hemberî me.

Bi damezirandina Komara Tirkiyeyê re, polîtîkaya tirkirinê ku dixwest li ser yekçandîtiyê, neteweyeke hem cu-re ava bike, ji bilî kurdan, bi piranî biser ketiye. Kurd ku di damezirandina Komara Tirkiyeyê de ked û alîkariya wan hene, li hember van kirinan derketine û xwestine ku ji nasnameya wan re, ji mafên ziman û çanda wan re hurmet bê nîşandan. Kurd ji bo ku wekî hemwelatî bûn pejirandin, tirkbûnê red kirine û red dikin. Di navbera polîtîkaya tirkirinê ya dewletê û daxwaza kurdan a ji bo nasnameya xwe de nokoki-

yek ku îro jî didome derketiye holê. Di cihê rêbazên demokratîk de rêbazên asimilasyon û terorê hatiye bikaranîn. Ji ber vê yekê jî "Kêşeya Kurdî" ta roja îro hatiye.

Kêşeya kurdî, di eslê xwe de pirsgirêka demokrasîyê ye, pirsgirêka rûmetdayîna mafên mirovan û mafên hemwelatîyê ye. Lê belê, ji ber sîstema Tirkiyeyê ya antîdemokratîk ji bilî polîtîkayên fermî yên tirkirinê, mixabin awayê çareserkirinê din gengaz nebûye. Lê belê, li cîhanê dest ji hewldanên pêkanîna neteweyeke hemcure tîn berdan û modelên cîvakî yên li ser feraseta hemwelatîya li ser bingeha wekhevî û pirçandîti tîn pejirandin. Ji bo çareserkirina pirçandîtiyê jî, di saziyên navneteweyî de, gelek belge û peyman hatine amadekirin. Tirkiye ji wan hinekan re bûye alîgir û bi riyeke nerasterast ketiye bin berpirsiya modela pirçandîtiyê. Digel vê yekê, ji ber ku Tirkiye di vê polîtîkaya xwe de li ber xwe dide, kêşeya kurdî bêçareserî maye.

Em bawer dikin û difikirin ku mirovên baweriya wan bi rastî bi demokrasîyê û nirxên demokrasîyê tê, dixwazin kêşeya kurdî bigihêje çareserîyeke mayînde. Ew kesên ku biratiya gelan dixwazin, ji dil li hember pêşdarazî û îdeayên nijadperest dernakevin û tîna-koşin.

Ji sê payê nifûsa Tirkiyeyê yek kurd in. Kurd xwedî dîrokeke kevn in û di gelek belgeyên girîng ên navneteweyî de cih digirin. Bi înkarkirina kurdan polîtîka nayê meşandin û dewlet nayê birêvebirin.

Tirkiye divê dest ji vê siyaseta pêkenî ku kurdan înkâr dike, berde, mafên nasname, ziman û çanda kurdan nas bike. Ji wan re statukoyeke azad û wekhev ava bike û bi vî awayî jî riya aştiyê veke. Dewleteke demokratîk, aşti û biratiyê pêk tîne, ji mafên mirov û hemwelatiyan re rêzdar e û di qada navneteweyî de rêzdariya wê heye.

Tirkiye 'dixwaze' ku nirx-rojavayê bipejirîne, ji ber vê yekê bûye endamê Konseya Ewrûpayê, Peymana Mafên Mirovan a Konseyê îmze kiriye û di hemû saziyên wê de cih girtiye. Ji bo ku bibe endamê Yekîtiya Ewrûpayê serî lê daye, ketiye Yekîtiya Gumrikê û di saziyên girîng ên YE'yê de cih girtiye. Jixwe, Tirkiye Belgeya Helsînkîyê îmze kiriye û di pêvajoya 'REHE'yê (AGÎT) de beşdarî hemû civînan bûye, biryarên ku hatine girtin, belgeyên ku hatine weşandin, bi piranî îmze kirine û di van peymanan de bûye alîgir. Ji bilî van, ji bo ku vesazkirinên qanûnî yên Yekîtiya Ewrûpayê, Belgeya Hevpariya Beşdarbûnê raber dike, pêk bîne, Bernameya Neteweyî amade kiriye.

Dema welatek bixwaze bi vî awayî bi rojava re bibe yek hingî mafê wî tune ye ku li hember nirxdarziyên wî tevbigere. Rewş wisan e, lê belê Tirkiye rexne û îkazên van welatan wekî "mudaxele-yên emperyalîst" dibîne û reaksiyonên neyînî yên tund nîşan dide. Ev tevger, derî aqil û mantiqê ye.

Tirkiye ev siyaseta durûtî nikare heta bêdawiyê bidomî-

ne. Mecbûr e ku tercihek bike. Ya dê wekî Îran, Suriye û dewletên din ji dinyayê dûr bikeve û rejimeke otokratîk û despot hilbijêre, yan jî ji mafên mirov û hemwelatiyan re wê

.....

**Ji sê payê nifûsa  
Tirkiyeyê yek kurd in.  
Kurd xwedî dîrokeke  
kevn in û di gelek belgeyên girîng ên  
navnetewî de cih digirin.  
Bi înkarkirina kurdan  
polîtîka nayê meşandin û  
dewlet nayê birêvebirin...**

rêzdar bibe. Birastîni wê bibe dewleteke demokratîk û bi hiqûqdar û bi vî awayî bi rê ve biçê û wê bi rojavayê re bibe yek. Şertê vê yê yekemîn jî, avakirina pergaleke demokratîk e. Ev pergal divê mafên nasname, ziman û çandê ên kurdan bipejirîne û li ser bingeha pirçandîti, pluralîstî û hiqûqê ava bibe.

Li Tirkiyeyê, ji bilî kurdan civatên din ên etnîk, ya asîmîle bûne yan jî bi rêbaza paqijkirina etnîkî, li hember pêkanîna neteweya hemcureyê astengbûna wan ji holê rabûye. Li Tirkiyeyê îro êdî ji mozaîka etnîkî (du grûbên neteweyî) bi tenê tirk û kurd mane.

Rewşa kurdan ji gelên misilman ên din ku bi vîna xwe ya azad bûne tirk pir cuda ye. Kurd neteweyek e ku di nav wan de yekîtiya jiyana civakî, yekîtiya zimên, taybetiyên çandî û giyanî yên xweser hene. Di cografyayeke hevpar de dijîn, xwedî nifûseke mezin in,

daxwazên xwe yên mafên nasname, ziman û çandê herdem zindî digirin û bi lêv dikin. Kurd, digel zilm û zordestiyên cihêreng, li hember polîtîkayên tirkirinê li ber xwe dane û nasname xwe ya neteweyî parastine.

Ji ber vê yekê, pêşniyazên realist ên ku bikaribin ji kêşeya kurdî re bibin çareserî, divê dewleteke demokratîk ku ji mafên mirov û hemwelatiyan re rêzdar e û li ser bingeha wekhev û biratiyê ava bûye biparêze.

## **PIRSGIRÊKA SEREKE YA TIRKIYÊ JI NÛ VE AVABÛN Û DEMOKRATÎKBÛN E**

Wekî gelek pirsgirêkên din, ji pirsgirêkên sereke yên Tirkiyeyê kêşeya kurdî jî, bi demokratîkbûnê dikane bê çareserkirin. Tirkiye di nav demokrasîya rojavayê de cihgirtiye û dixwaze bi wê re bibe yek.

Dema ji bo pêkanîna van armancan hewl dide, divê hemû pirsgirêkên xwe di nav demokrasîyê de çareser bike. Êdî bi riya zordestî û şidetê çareserkirina pirsgirêkên civakî ne mumkûn e. Di demokrasîyên rojava de, bi hiqûq û rêbazên aşti çareserkirina pirsgirêkan şertê rejîmê yê yekemîn e, ku ev nebe nabe. Ji mafên mirovan re rêzdarbûn û bê binpêkirina van mafan çareserkirina pirsgirêkan, taybetiyeke girîng a van demokrasîyan e. Taybetiyeke girîng a din jî, li hember neteweyên cihêreng ji mafên

nasname, bi zimanê zikmakî perwerdehî û çandê re rêzdarbûn û sepandina kargêriyeke li ser bingeha pirçandîti û rastîbîni ye.

Di civatên demokratîk de, zimanê zikmakî, parçeyekî nasnameya kesane ku nikane jê bê veqetandin û bi zimanê zikmakî perwerdehî jî ji mafên mirovan mafekî sereke ye. Di sazîyên perwerdehiyê de xwendina dîrok û çanda neteweyên cihêreng jî wekî mafê hindikahiyan hatiye pejirandin. Tirkiye hin beşên belgeyên ku van hêmanan dihewînin îmze kirine û li xwe girtine (teahûd kirine) ku wê van mafên hindikahiyan xwe binase. Belgeya Kopenhagê ji van yek e. Tirkiye bi îmzekirina vê belgeyê, li xwe girtiye (teahûd kirine) ku, wê mafên nasname, ziman û çanda hindikahiyan xwe binase û ji bo ku hindikahiyan wî bi zimanê xwe yê zikmakî perwerdehî bibînin, di dibistanan de, dîrok û çanda xwe bixwînin, ji bo ziman û çanda wan bê parastin û pêşvebirin, li gorî daneyên dîrokî û heremî divê îdareyên xweser (otonom) bên damezirandin.

Xala 90/5 a Zagona Binge-hîn a Komara Tirkiyeyê, peymanên navneteweyî yên ku bûye alîgir, wekî qanûn pejirandine û sepandina wan jî ji dewletê re wekî peywîr diyar kirine. Li gorî vê yekê û Belgeya Kopenhagê, nasîna mafên nasname, ziman û çandê ya kurdan, ji bo zarokên kurdan dabînkirina derfeta perwerdeya bi zimanê zikmakî, ji bo parastin û pêşvebirina ziman û çanda kurdî li gorî daneyên dîrokî û heremî damezirandina

îdareyên xweser (otonom), ji bo Tirkiyeyê diviyatiya hiqûqî ne. Lê belê, Tirkiye ji pêkanîna van teahûdan direve. Wekî sedem jî îdîa dike ku kurd ne hindikayî ne û belgeyên ku mafên hindikahiyan dihewînin, ji bo kurdan ne lê ne.

Di hiqûqên dewletan de ji bo statuya hindikahiyan tarîfeke gerdûnî nehatiye kirin. Lê belê, di kirin û belgeyên navneteweyî de, ji bilî neteweya

**Di hiqûqên dewletan  
de ji bo statuya  
hindikahiyan tarîfeke  
gerdûnî nehatiye kirin.  
Lê belê, di kirin û belgeyên  
navneteweyî de, ji  
bilî neteweya serdest,  
neteweyên din, bêferq  
wekî hindikayî tîn**

serdest, neteweyên din, bêferq wekî hindikayî tîn binavkirin. Statu û mafên hin civatan ku di vê rewşê de ne, di peymanên navnetewî de hatine darazdan. Lê belê, ev kirin (sepandin) ne rêzîkek e, beravajiyê vê awarteyek e.

Digel hemû nêrînên zorandinê ku li gorî Belgeya Kopenhagê bi nixandina têgeha hindikahiyanê tê gihîştin, Belgeya Kopenhagê ku Tirkiye îmze kiriye, hiqûqa kurdan jî diparêze û raber dike ku mafên ku dihewîne ji bo kurdan jî bên sepandin. Nasîna van mafan, ji bo Tirkiyeyê mecbûrîtiyeke êtîkexlaqî ye ku ew xwe dispêre hem peymanan û hem jî wijdana giştî.

Bi hinceta ku kurd ne hindikayî ne, ji bo kurdan nenasî-

na mafên hindikahiyan ên di belgeyên navneteweyî de cih digirin û Tirkiye jî bûye alîgirê van, ji Tirkiyeyê re ji hêla hiqûqê ve pirgirêkeke din derdixe holê. Li Tirkiyeyê ji bilî tirkan kurd jî dijîn û ev yek jî tê pejirandin. Li gorî vê yekê, dema kurd wekî hindikayî neyên pejirandin, divê kurd wekî tirkan, gelekî damezirînerê dewleta Tirkiyeyê bên pejirandin û bi tirkan re xwedî mafên wekhev bin. Li gorî vê yekê, divê mafên ku ji bo tirkan hatine dayîn, di hemû qadên jiyandê de ji bo kurdan jî bên dayîn. Li gorî vê mantiqê, li Tirkiyeyê ku ew ji du gelên xwedî mafên wekhev pêk tê, divê du zimanên fermî bên bikaranîn.

Di serî de Peymana Lozanê, li gorî belgeyên ku Tirkiye îmze kirine, ku bi mafên hindikahiyan re eleqeder in, kurd an hindikayî ne an jî, gelekî ku bi tirkan civata Tirkiyeyê pêk tîne û wekî wan xwedî heman maf in. Li hember rastiyên civaknasî (sosyolojîk) yê berbiçav û peymanên ku Tirkiye bûye alîgir, ji bo kurdan vebijarkeke (alternatîfeke) sêyemîn nikane bê fikirîn.

Dema kurd hem wekî hindikayî neyên pejirandin, hem jî wekî gelekî ku ji tirkan cûda ne, û bi wan re xwedî heman maf in neyên pejirandin, vê demê, pirgirêkeke hem hiqûqî, hem siyasî hem jî exlekî derdikeve holê. Ev jî tevgerê inkarker e ku ji kurdan re ji bilî tirkbûnê rîyeke din nahêle û ev tevger, li dijî nixandina YE ye. Li gorî wijdana giştî ya navneteweyî jî ev inkarkerî ne rewşa (meşrû) ye. Jixwe, Tirkiye bi

pejirandina hebûna kurdan, destjiberdana înkarkirinê îlan kiriye.

Li Tirkiyeyê ta ku demokrasîyeke ji mafên mirov û hemwelatîyan re rêzdar, nûjen û pêşketî neyê avakirin, ev pirs-girêk nayê çareser kirin. Ta ku ev pirs-girêk neyê çareser kirin, li Tirkiyeyê demokrasî nikane berfireh bibe û di jiyane de bibe çandê hevdem.

Dewleta demokratîk ew dewlet e ku ji mafên hemwelatîyên xwe re rêzdar e, serdestiya huquqê azadiya raman û rêxistinê diparêze, mafê pîreçandî, piluralîzma siyasî îdeolojî dinase. Dewlet pergala xizmetê ye, ta ku ev feraset di bingeha dewletê de cih negire, dewlet nikane demokratîk be. Ji bo bicihanîna vê armancê divê zagona bingehîn û vesazkirinên zagonî yên nû divê bîn amadekirin. Divê li hember perspektîfa demokratîk bûnê astengên îdarî û hiqûqî bîn rakin. Ji bo vê yekê, pêwîstî bi makeza goneke nû heye. Ev makezagon divê dewletê wekî saziyeke xizmetê rave bike, mafên mirovan û azadiya raman û rêxistinbûnê biparêze, li gorî feraseta civakeke pîreçandî be, hemwelatîyeke nûjen rave bike. Rê bide pluralîzmê û îdareyên xweser. Ew zagonên ku rejimê diyar dikin divê li gorî vê makezagonê ji nû ve bîn saz kirin. Li gorî vê yekê, divê qanûnên ku li jêr hatine nîşandan bîn guherandin.

- Qanûna Hemwelatîyê
- Qanûna Komeleyan
- Qanûna Partiyên Sîyasî
- Qanûna Civîn, Meş û Xwepêşandanê
- Qanûna Wezîfe û Selahiyeta Polîsan
- Qanûna Têkoşîna li Dijî Terorê
- Qanûna Cezayê
- Qanûnên Sereke yên Perwerdeya Neteweyî
- Qanûna Zanîngeh û Dibistanên Bilind
- Qanûna Radyo û Televîzyonê

Ji bo ku kargêriyeke xweser û modeleke ku li ser bingeha pîreçandîti ava bibe divê qa-

**Divê jiyana aborî, rewşa erdnîgarî, taybetiyên etnîk û çandî li ber çavan bîn girtin û li gorî van li Tirkiyeyê eyaletên xweser bîn avakirin. Her eyalet, divê xwedî meclis û hikûmeteke xweser be û ji aliyê vê meclisê ve bê birêvebirin.**

nûnên jêr bîn derxistin.

Ji bo eyaletan:

- Qanûna Kargêriya Xweser (Otonom)
- Qanûna Esasên Xebata Dibistanên Fermî û Taybet
- Qanûna Damezirandina Enstîtuyan
- Qanûna Esasên Weşanên Radyo û Televîzyonê

Li Tirkiyeyê ji bo pêkanîna demokrasîyeke rastîn, modela herî baş û realîst federalîzm e. Jixwe Tirkiye, di sala 1988'an de "Peymana Kargêriyên Herêmî ya Ewrûpayê" pesend kiriye û wê wekî qanun pejirandiye. Bi vê yekê, meşandina politikaya desantralîzasyonê û sepandina rêgezên karîgêriya di cihê xwe de tê meşandin, pejirandiye û li xwe girtiye.

Divê jiyana aborî, rewşa erdnîgarî, taybetiyên etnîk û çandî li ber çavan bîn girtin û li gorî van li Tirkiyeyê eyaletên xweser bîn avakirin. Her eyalet, divê xwedî meclis û hikûmeteke xweser be û ji aliyê vê meclisê ve bê birêvebirin.

Her çiqas pêkanîna vê sazûmanê di nêv sîstema unîter de mumkûn be jî federalîzm çêtir e. sazûmana Spanyayê unîter e lê bi pergala eyaletên xweser hem pîrs-gireka xwe ya etnîkî-neteweyî çareser kiriye, hem jî ji bastûra hembil, birokratîk û navend parêziyê xelas bûye. Ev mînak divê baş bê nîrxandin.

Tirkiye, hem ji bo çareserîya kêşeya kurdî, hem jî ji bo çareserîya pîrs-girêkên din yên kargêriyî, ji modela Span-yayê divê sûdwergire. Pîrs-girêka sereke ya Tirkiyeyê ji nû ve avabûn û demokratîkbûn e.

## PERWERDEKIRINA BI ZIMANÊ KURDÎ

### Çeto Özel

Divê em di serî de baş zimanin ku perwerdekirina her mijarekê taybetiyên xwe yên cuda cuda hene. Perwerdekirina zimanî jî, nemaze zimanê kurdî ku ev çend sal in qedexe ye û ji bo perwerdekirinê kêmlêkolîn li ser hatiye kirin, gelek taybetiyên xwe hene. Heke em bixwazin di perwerdekirina bi zimanê kurdî de serfiraz bibin, divê em li gorî analîza pêwistiyên xwendekaran, bernamêyêke bi rêbaz û teknîkên nûjen amade bikin û bi awayekî zanistî li serê rawestin. Di fêrkirina zimanî de, analîza pêwistiyên xwendekaran gelekî girîng e. Berî her tiştî pêwîst e ku em xwendekarên xwe baş nas bikin û bizanin ew kî ne, temenê wan çî ne û ew çima dixwazin zimanî fêr bibin. Heke em bersivên pêwistiyên xwendekarên xwe nedin, hingî tu armanca fêrkirina zimanî namîne. Pêwistiyên xwendekaran jî tenê ne fêrkirina rêzimanî ye.

Ew kesên rêzimanê zimanekî dizanin, nikarin bibêjin ku em bi vî zimanî dizanin; ji ber ku zimanzanîn ne tenê rêzimanzanîn e. Ligel rêzimanî, axaftina zimanî, nivîsandina zanîna zimanî, xwendin, guhdarîkirin û têgihiştina zimanî pir girîng e. Xwendekar dixwazin bikaribin bi zimanê kurdî bi axivîn, raman û daxwaziyên xwe binivîsin, rojname û

kovaran bixwînin, ji panel û konferansên bi zimanê kurdî tê bigihin, guhdarî muzîka kurdî bikin û têkiliyan bi wî zimanî çêkin. Diyar e ku pêwistiyên xwendekaran cuda cuda ne. Pêwistiyên zarokan, xwendekarên zanîngehan, nivîskaran,

**Di fêrkirina zimanî de, analîza pêwistiyên xwendekaran gelekî girîng e. Berî her tiştî pêwîst e ku em xwendekarên xwe baş nas bikin û bizanin ew kî ne, temenê wan çî ne û ew çima dixwazin zimanî fêr bibin. Heke em bersivên pêwistiyên xwendekarên xwe nedin, hingî tu armanca fêrkirina zimanî namîne. Pêwistiyên xwendekaran jî tenê ne fêrkirina rêzimanî ye.**

rojnamegeran, karkeran û hwd. ne yek in. Hingî em dikarin bibêjin bernamêya perwerdekirina zimanî divê li gor pêwistiyên xwendekaran bê çêkirin. Berî ku em bibêjin "Em çawa zimanî fêr bikin?" divê em bibêjin "Em çima zimanî fêr bikin?" Wekî din serfirazbûna perwerdekirina zimanî gelek kêmlêkolîn e. Piştî analîza pêwistiyên xwendekaran, divê bernamê li gor wan pêwistiyên bîn çêkirin.

Amadekirina bernamêyê divê bi awayekî sistematîk û zanistî be. Ji bo bernamêyêke di ray de ew xalên jêrîn bingehîn in.

1) Naskirin û hîlbijartina pêwistiyên xwendekaran

2) Nîşankirina armancan

3) Hîlbijartina naverokê

4) Formulasyona naverokê

5) Biryardana rêbazên fêr-

bûnê û hêlsingandina encaman. Gava ku me biryara pêwistiyên xwendekarên xwe da, em dikarin armancên xwe kifş bikin. Armancên perwerdekirina zimanî divê li gor zimanzanîn û zanîna xwendekaran bê danîn. Mamostayên ziman fêrkirinê, divê baş biryar bidin ku armancên wan çî ne û dawiya bernamêyê ew dixwazin çî bi dest bixin. Piştî biryardana armancan, divê hîlbijartina naverokê bê organîzekirin. Di nav naverokê de divê bêje, çand, hevoksazî, fonolojî, morfolojî, semantîk û hwd. Cihê xwe bigirin. Ew jî, ji bo perwerdekirina zimanê Kurdî tişteki nû ye; ji ber ku piraniyan pirtûkên ziman fêrkirinê tenê li ser rêzimanê Kurdî hatine nivîsandin. Formulasyona naverokê, sefheyên ziman fêrkirinê ne. Li vir divê em biryar bidin ku em dê çî ziman û bi çî awayî fêr bikin. Biryardana rêbaz û hêlsingandina encaman cihekî mezin hildigire. Divê em bizanibin xwendekar bi çî rê, bi çî awayî tiştên ku ji bo wan nû, baştir fêr dibin. Em dikarin bibêjin psîkolojiya per-



werdekirinê alîkariyeke mezin dide mamosteyan û nivîskarên pirtûkên fêrkirina zimanî. Ji ber vê hindê pêwîst e ku em analîz bikin ku mirov çawa tiştên nû fêr dibin. Ji bo gihiştina wê armancê em dikarin bernameya perwerdekirina zimanî bikin şeş beş. Ji wan şeş beşan a yekemîn agahdarî ye. Mamoste bi riya pirsan, tiştên didenî (vijual), bi senaryoyekê an jî bi devkî agahî dide xwendekarên. Xwendekar wan agahiyan ji nav mêjiyê xwe derbas dike. Bi gotineke din, xwendekar agahdariya ku mamoste dide, ligel agahiyan xwe yên ku wî/ê bi xwe heyî girê dide. A duyemîn têgihiştin e. Piştî agahdarkirinê divê mamoste li ser tegihiştina agahdariyê raweste. Gava ku xwendekar agahdar bûn û tê gehiştin, divê ew bèn pirsyarkirin da ku wê agahdarî û têgihiştina xwe bi kar bînin. Bikaranîna tegihiştina agahdariyê, di zimanfêrbûnê de sefheya sêyemîn e. Tenê bi tegihiştinê em nikarin bibêjin xwendekar agahdariya ku me daye wan fêr bûne. Piştî ku xwendekar agahdarî bi kar anîn, em dê bikaribin wê bi awayekî zanistî analîz bikin ku fêrbûnê cihê xwe girtiye an jî negirtiye. Piştî analîzê sentez tê. Di wê sefheyê de xwendekar dikarin agahdariya xwe ya nû ligel agahdariyên xwe yên ku hene bidin berhev. Ew berhevki, ji bo têgihiştineke baştir gelek alîkariyê dide xwendekarên. Di bernameya

fêrbûnê de sefheya dawî jî hêlsingandin e. Hêlsingandina fêrbûnê, serfirazbûn an jî têkçûna bernameyê nîşanî me dide. Di wê sefheyê de xwende-

**Mamosteyên ziman fêrkirinê, divê fersendeyê bide xwendekarên xwe da ku her şeş sefheyên jorîn ji bo fêrbûna zimanî bi kar bînin. Dîsa pêwîst e ku mamosteyên ziman fêrkirinê bizanibin ku sîstema zimanî çî ye, çima ziman pêwîst e, gavên ziman fêrbûnê çî ne û bi awayî fêrkirina fîzîkê, dîrokê, matematîkê û hwd. li gel fêrkirina zimanî ne yek in.**

kar dibin xwediyê ramanekê û ew dê bikaribin bi ramanên xwe ragihandinan ligel mirovên din bikin. Mamosteyên ziman fêrkirinê, divê fersendeyê bide xwendekarên xwe da ku her şeş sefheyên jorîn ji bo fêrbûna zimanî bi kar bînin. Dîsa pêwîst e ku mamosteyên ziman fêrkirinê bizanibin ku sîstema zimanî çî ye, çima ziman pêwîst e, gavên ziman fêrbûnê çî ne û bi awayî fêrkirina fîzîkê, dîrokê, matematîkê û hwd. li gel fêrkirina zimanî ne yek in. Heke sîstema zimanî neyê zanîn, hingî bernameyên ji bo perwerdekirina zimanî dê têk biçin û serfiraz nabin. Digel zanîna sîstema zimanî û agahiya zimanzanîne (lînguîstîk) divê mamoste gelek rêbaz û

teknîkên nûjen ji bo ziman fêrkirinê bi kar bînin da ku di mamostetiya xwe de serfiraz bibin. Her wekî zimanzanekî berketî Noam Chomsky di pirtûka xwe ya "Aspects of the theory of syntax" de dibêje: "Ziman fêrbûn ne tiştêkî hût-bûyîni ye, ziman fêrbûn tiştêkî afirandêrî ye." Ew dibêje mirovan qabiliyet û perfonmansa zimannasiyê heye. Ji ber wê hindê ew dikarin hevokên berê nehatine gotin biafirînin. Em dikarin bibêjin di perwerdekirina zimanî de rêbazên berî Noam Chomsky û rêbazên piştî wî hene. Berî Noam Chomsky, gelek rêbazên wekî wergera rêzimanî, rêbaza dîrekt (pêşdariya wê rêbazê Profesor E. W. Gatenby û Dr. Roert Lado kiriye) û rêbaza avdiongual hebûn. Di sala 1959'an de rêbazeke nû, rêbaza cognî-tîvîsm, ji aliyê Noam Chomsky ve hate damezirandin. Di wê rêbaziye de ziman bi awayekî komînikasyonî tê fêrkirin. Ziman bi her çar qabiliyetan, axaftin, xwendin, nivîsandin û guhdarîkirinê, wekhevî bi gelemperî di nav konteksekê de tê fêrkirin. Di wê rêbazê de, ji para hemûyan pirtir rexê komînikasyona ziman cih digire. Ji ber kirin an jî ducarkirina zimanî, di wê rêbazê de gelek nîn e. Li cihê wê divê xwendekar bîpînjîn û afirandêr bin. Di perwerdekirina zimanî de rêbaza lognîvîsm ji hemû rêbazan serfiraztir derketiye; ji ber ku giraniya wê li ser

komînîkasyona zimanî û qabilîyetên zimanî ye. Her çi qas ew rêbaz baştirîn rêbaz jî be, bi tena serê xwe car caran kêma dimîne. Bi rastî, tu rêbaz bi serê xwe têr nîn e. Ji ber wê hindê divê mamoste di rêbaz û teknîkên perwerdîkirinê de hindê eklektîk bibin. Bi gotîneke din divê mamoste rexê rêbazan ên ku bi kêrî wan tîr hilgirin û bi kar bînin. Ji bo serfirazbûnê, her wiha divê pirtûk û materyalên ziman fêrkirinê bi zanistî bîn amadekirin. Dîsa rêbaz û teknîkên nûjen li gel pêwîstiyên xwendekaran cihekî mezin li ser amadekirina pirtûk û materyalên ziman perwerdîkirinê digirin. Kêmasiyên pirtûk û materyalên perwerdîkirinê, teşneyên xwe dide her aliyên ziman fêrbûnê. Ev yek me baş ronahî dîke ku em divê pirtûk û materyalên xwe li gor rêbaz û teknîkên nûjen û pêwîstiyên xwendekaran amade bikin. Vê gavê pirtûk û materyalên ji bo perwerdîkirina zimanê kurdî têr nakin, bi rastî gelek kêmasî heye. Piştî ku me çavkaniyên xwe (pirtûk, materyalên xwendin, axaftin, guhdarîkirin û nivîsandinê) û agahdariya der barê xwendekaran de amade kir, em dikarin dersên xwe yê Kurdî li dar bixin. Serfirazbûna dersên me yê kurdî girêdayî gelek tiştan e. Ji wan a herî girîngtir a mamosteyan e. Ên din rêdanên

dibistanê û xwendekaran, rewşa xwendekaran a der barê ziman fêrbûnê, nêzîkbûna wan ji bo materyal û lidarxistina dersan.

Bêguman berpirsiya mamosteyan û amadekarên materyal û bernameyê li vir naqede.

**Ji bo serfirazbûnê, her wiha divê pirtûk û materyalên ziman fêrkirinê bi zanistî bîn amadekirin. Dîsa rêbaz û teknîkên nûjen li gel pêwîstiyên xwendekaran cihekî mezin li ser amadekirina pirtûk û materyalên ziman perwerdîkirinê digirin.**

Rexêkê din a girîng, hêlsingandîneke gelemperî ye. Heke mamoste û amadekarên materyal û bernameyê hemû tiştên wan ji bo perwerdîkirina zimanî kirî, nehêlsingînin ew tu caran nikarin rêbaz, teknîk û bernameyên xwe baştir bikin. Her çiqas me bername li gor pêwîstiyên xwendekaran, psikolojiya perwerdîkirinê, rêbaz û teknîkên nûjen jî çêkiribe, divê em dîsa dawîya wan hemûyan bi gelemperî bihêlsingînin. Ji ber ku, pêwîstiyên xwendekaran tîrê guhartin, an jî dibe ku kêmasiyên wê bernameyê derkevin holê.

Bi kurtî, ji bo bernameyê

xurt û di ray de gelek tişt hene ku em bînin ber çavan. Divê amadekarên bernameya ziman perwerdîkirinê hemû agahdariyên der barê bernameyê xir birin, wan analîz û organîze bikin. Ew riyek û lêkolîneke zanistî ye. Lêkolîn, xurtkirina agahiyê, analîz û hêlsingandîna dawî.

Li vir tiştên ji hemûyan girîngtir pêwîstiyên mirov an jî xwendekarên ku beşdarî bernameya zimanî dibin, divê bi giranî cihê xwe bigire. Wekî din, bername her çend nûjen û baş jî be, mamoste her çend biqabiliyet û jêhatî jî be, serfirazbûna wê bernameyê ne gengaz e. Belê her wekî me pêşî jî got, ji bo serfirazbûna bernameya perwerdîkirinê divê pêwîstiyên xwendekaran, psikolojiya fêrbûnê, rêbaz û teknîkên nûjen bi awayekî sistematîk û zanistî bîn lidarxistin.

#### Çavkanî:

1. Chomsky, Noam; Language and Mind enlarged ed, New York Harcourt Brace Javanovich 1972  
2. Dubin, F. and Olshtain, E (1986); Course designs Dewhapînp programs and materials for language learning, Cambridge University Press.

## DI ZIMÊN DE ZAYENDÎ

### Adar JIYAN

Li gorî zimanzanên îro, li ser rûyê erdê çar komên bingehîn ên ziman hene. Wekî tê zanîn îro, di cîhanê de bi sedan ziman hene. Belê her zimanek di koma xwe de cih digire û bi navê wê komê tê nasîn. Lewre her zimanek li gorî rêpîvanên zimanê xwe yê bingehîn bi kar tê. Îcar komên bingehîn ên herî mezin ên zimên ev in:

1. Koma Zimanê Îndo-Germen (Hîn-Ewropî; wekî kurdî, firensî, farisî û hwd.)
2. Koma Zimanê Samî (wekî îbrani, erebî û hwd.)
3. Koma Zimanê Ural-Altay (tirkî, ermenî, gurgî û hwd.)
4. Koma Zimanê Rojhilata Dûr (çînî, japonî û hwd.)

Wekî ku li jorê jî me got, bi sedan ziman û zarava hene ku li gorî rêz û rêçikên van zimanên bingehîn pêk tên. Îcar di hin zimanan de; jîndar û ne jîndar (bêruh), zayendiya hemû heyberan heye. Ango çî tiştê ku heye di axaftin û nivîsandinê de wekî "mê" an jî "nêr" bi lêv dibe. Kurdî jî yek ji van zimanan e ku her gotineke wî li gorî zayendiya xwe bi kar tê. Bi rastî zayendiya gotinan (di zimên de) ragihandin û têgihîştina navbera mirovan hêsan

tir dike. Heke di zimanekî de zayendiya hebûnekê nediyar bê gotin, bi carekê re nayê fêmkirin û pêdivî bi pirsê dimîne. Bi taybetî jî, ji bo hebûnên jîndar (wekî mirov û lawiran) pêdivî bi gotinên "mê" û "nêr" heye. Jixwe, di zimanên ku tişt bi zayendiya xwe ji hev cuda dibin de, zêde gengeşî û alozî dernakeve û wekî ew ziman di

**Kurdî jî yek ji van zimanan e ku her gotineke wî li gorî zayendiya xwe bi kar tê. Bi rastî zayendiya gotinan (di zimên de) ragihandin û têgihîştina navbera mirovan hêsan tir dike. Heke di zimanekî de zayendiya hebûnekê ne diyar bê gotin, bi carekê re nayê fêmkirin û pêdivî bi pirsê dimîne.**

cîhanê de wekî zimanên dewlemend û pirgotin têne peji-randin. Berî ku em ji zimanê Kurdî mînanan bidin, em dixwazin, girêdayî mijara xwe û di vî warî de, rêpîvanên du zimanên cîhanê yên dewlemend zimanê firansî û erebî wekî mînak nîşan bidin. Di zimanê firensî de her tişt wekî "femînen" (mê) an jî "masquelen" (nêr) tê zanîn. Wekî mînak: derî, nêr e. pace, mê ye. Lênûsk, mê ye. Pênûs, nêr e.

Di zimanê firensî de "mêbûn" an "nêrbûn" a tiştan bi

pêşgirekê diyar dibe, an jî tê fêmkirin. Pêşgira "le" bo tiştên "nêr" û ya "la" ji bo tiştên "mê" bi kar tê. Mînak: la profeseur (mamosteya jin) le profeseur (mamosteyê mêr) Di zimanê erebî de jî "mûennes" (jin) û "mûzekker" (mêr) heye.

Belê ji ber ku koma zimanê erebî û firensî ne yek e, rêpîvanên wan naşibine hev. Di zimanê erebî de, gotina "mûzekker" (nêr) bi paşgireke "mê" dibe. Wekî mînak: mûallîm (mamosteyê mêr) Bi paşgira "et"ê, bi kurtasî bi paşgira "e" yê dibe mûallîme (mamosteya jin) hakîm (dadgerê mêr) hakîme (dadgera jin). Zimanê kurdî bi rêz û rêçikên xwe dişibe zimanê firensî. Lewre kurdî di nav koma zimanê Hîndî-Ewropî de cih digire û li gorî rêpîvanên wê bi kar tê. Di zimanê kurdî de, çî tiştê ku heye zayendeyeke wî/wê heye. Heke ku em her gav "wî" û "wê" bi kar tînin, ne bêsedem e. Lewre her hebûn bi zayendiya xwe tê zanîn. Zayendî jî bi "wî" û "wê" tê danasîn û fêmkirin. Zayendiya tiştan bi me didine fêmkirin. Îcar ez dixwazim hinekî li ser van qertaf û paşgiran rawestim û çend mînanan bidim. Di kurdî de zayendiya heyberan bi paşgiran diyar dibe. Car heye gotin bi serê xwe be jî, zayendiya wî/wê, wekî "mê" û "nêr" tê zanîn.

Wekî ku me li jorê jî got zimanê kurdî girêdayî malbata (koma) zimanê Hînd û Germen (Hînd-Ewropa) ye.

Gotinên me: jin, keç, qîz, mih, bizin, mirîşk, mehîn, pîr, bûk...

Gotinên nêr: nêrî, dîk, belgîr, kal, zava, mêt, kur, beran, xort... Peyvin hene ku zayenda wan nediya e, lê ji bo her du zayendan jî tên bikaranîn: mirov, zarok, ciwan, sewal, yextiyar, porspî, seg, gur, kew... Car heye zayendiya sewalan bi pêşgiran diyar dibe: Mêkew, nêrker, dêlegur...

Ew jî wekî frensî, çi heyber û hebûnên ku hene wekî "mê" an jî "nêr" nîşan dide. Berî ku em paşgiran bi kar binin, em dixwazin gotinên mê û nêr bidin nasîn û pey re mînanan bidin.

#### Di cih waran de zayendi

Ji bo yên mê: xak, roj, deşt, navçe, kanî, av, mal...

Ji bo yên nêr: welat, asîman, çiya, gund, çem, nan, rez... mê (a/ya): xaka pîroz, roja nû, Dešta Mûşê, Navçeya Êlihê, Kaniya Spî, ava sûr, mala Evîn... nêr (ê/yê): welatê hêja, asîmanê heftan, Çiyayê Agirê, Gundê Fîsê, Çemê Hêzilê, nanê tisî, Rezê Şoreş...

#### Di têgehnan de zayendî

Ji bo yên mê: raman, aştî, evîn, çand, dîrok, netewe, sal... Ji bo yên nêr: hest, dil, ziman, text, gel, qirn... mê (a/ya): ramanazad, aştîya gel, evîna Zî-nê, çanda Mezopotamyayê, dîroka şoreşê, neteweya kurd, sa-

la par... nêr (ê/yê): hestê biyan, şerê kirêt, dilê Mem, zimanê kurdî, textê Dehaq, gelê Rojhilat, qirnê bîstan...

#### Di alavan de zayendî

Ji bo yên mê: sênî, mûçink, çek, desmal, televîzyon, gustîl, bêr... Ji bo yên nêr: kevçî, şeh, rext, kum, radyo, guhar, bivir... mê (a/ya): sênîya te, mûçinka wê/wî, çeka min, desmala spî, Televîzyona Medya, gustîla Derwêş, bêra karker... nêr (ê/yê): kevçiyê min, şehê we, rextê te, kumê reş, radyoyê Mizgînê, guharê Xecê, bivirê ko... Bi kurtasî hemû têgih û hebûn (jîndar û ne-jîndar) bi zayendiya xwe tene nasîn. Wekî ku me li jorê çend mînak dan; mêtûn û nêrbûna tişt di hundirê hevokê de diyar dibe. Heke ku tişt mê be, qertafa "a" an jî "ya" yê bi dawî dibe. Belê heke tişt nêr be, bi qertafa "ê" an jî "yê" bi dawî dibe. Lê belê her gav ne wisan e. Lewre, tiştêkî din jî heye ku mêtûn an jî nêrbûna tişt (an jî hebûnê) diyar dike. Wekî mînak: Vê malê binase (vê, tiştê nêzik nîşan dide) Di vê hevokê de cînavka şanîdanê bi tîpa "ê" yê bi dawî dibe û cînavka "vê" û "wê" her gav bo tiştên "mê" bi kar tên. Wekî ku me li jorê jî dît, "mal" gotineke mê ye û cînavk jî, wekî "mê" bi kar hatiye. Girêdayî vê em dikarin mînakeke din jî bidin: Wê kaniyê neçikîne (wê, dûriyê nîşan dide) Di vê hevokê de, dîsa

cînavka şanîdanê bi tîpa "ê" yê bi dawî dibe û cînavka "wê" li pêşiya gotina "mê" bi kar tê. Wekî ku me li jorê jî dît, "kanî" gotineke "mê" ye. Îcar dibe ku bê gotin "Mal û kanî her du jî gotinên mê ne. Gelo çima "mal" bi qertafa "ê" yê bi dawî dibe û "kanî" bi qertafa "yê" bi dawî dibe?!" Belê sedem ev e; "mal" bi tîpa dengdar bi "l" yê bi dawî dibe, lê "kanî" bi tîpa dengdêr bi "î" yê bi dawî dibe. Di kurdî de, gotina ku bi tîpa dengdar bi dawî bibe, divê ku qertafa ku were bi tîpa dengdêr dest pê bike. Na, heke ku gotin bi tîpa dengdêr bi dawî bibe vê carê, divê ku qertaf bi tîpa dengdar dest pê bike. Ango ev rêpîvan girêdayî rewşa reh (kok) û qertafê (ek) ye. Divê ku girêdayî vê mijarê em mînakeke din (bo tiştê nêr) jî bidin: vî rextî bişidîne (vî, nêzik nîşan dide) Di vê hevokê de cînavka şanîdanê bi tîpa "î" yê bi dawî dibe û cînavka "vî" û "wî".

Ji bo ku mijar were fêmkirin em dikarin mînakeke din jî bidin: Wî kevçiyî bişo (wî dûriyê nîşan dide) Di vê hevokê de, dîsa cînavka şanîdanê bi tîpa "î" yê bi dawî dibe û cînavka "wî" li pêşiya gotina "nêr" bi kar hatiye. Wekî ku me li jorê jî dît, "kevçî" gotineke nêr e. Îcar dîsa dibe ku bê gotin "Rext û kevçî, her du jî gotinên nêr in. Gelo çima "rext" bi qertafa "î" yê bi dawî dibe û "kevçî" bi qertafa "yî" yê bi dawî dibe?" Sedem ev e; gotina "rext" bi tîpa dengdar, bi "t" yê

bi dawî dibe, lê "kevçî" bi tîpa dengdêr, bi "î" yê bi dawî dibe. Wekî ku me li jorê, gotibû; di kurdî de gotina ku bi tîpa dengdar bi dawî bibe, qertafa ku digire bi tîpa dengdêr dest pê dike. Ango di zimanê kurdî de du tîpên dengdêr (bê awarte) li nik hev bi kar nayên. Heke tiştêkî wisa hebe jî, dibe ku gotin ne kurdî be. Wekî mînak: Saat (demjimêr).

Saet, gotineke erebî ye. Berî ku em ji mijara xwe bi dûr Kevin, divê em hinekî din li ser zayendiya gotinan rawestin. Me li jorê bi kurtasî çend mînak dan. Belê di zimanê kurdî çî hebûn û têgih dibe bila bibe, hemû bi zayendiya xwe tîn nasîn. Di cureyên gotinan de jî ev tişt diyar e. Em dixwazin li vê derê çend mînakên din bidin:

Di rengdêran de zayendî Ji bo rengdêran: kej, dîn, reben, zindî, şervan, nexweş, birçî... Jin (mê): ê/yê, kejê, dîne, zindiyê, şervanê, nexweşê, birçiyê... mêr (nêr): o/yo, kejo, dîno, rebeno, zindiyo, şervano, nexweşo, birçiyoo...

Di kiryar de zayende kiryar, karker, kujer, pale, xebatkar, têkoşer, xwendekar, êrîşkar... jin (ê): ê, karkerê, kujerê, paleyê, xebatkarê, têkoşerê, xwendekarê, erîşkarê... mêr (nêr): o, karkero, kujero, paleyo, xebatkaro, têkoşero, xwendekaro, êrîşkaro...

Wekî ku li jorê jî tê dîtin, gava ku rengdêr an kiryar ne diyar be (zayendiya wî/wê), gotin bi serê xwe bi kar tê. Lê

gava ku zayenda rengdêr an kiryar diyar be, ji bo kesên jin an lawirên mê qertafa "ê/yê" bi kar tê û ji bo kesên mêr an lawirên nêr jî, qertafa o/yo bi kar tê. Wekî mînak: zarok kej e Di vê hevokê de zayendiya zarok ne diyar e. Pêdivî bi pirsê heye. Belê heke hevok wekî;

.....

**Di kurdî de zayendiya heyberan bi paşgiran diyar dibe. Car heye gotin bi serê xwe be jî, zayendiya wî/wê, wekî "mê" û "nêr" tê zanîn.**

.....

"Kejê porê xwe dişikine" an jî "Kejo li mal dilize" were gotinan jî nivîsandin, zayendiya zarok diyar dibe û pêdivî bi tu pirsê namîne. Mînakeke din: karker ji kargehê derket û çû malê Di vê hevokê de jî zayendiya kiryar (karker) ne diyar e û pêdivî pirsê heye, ango karker jin e an mêr e nayê zanîn. Lê belê gava ku hevok wekî "Karkerê karê xwe hişt û çû" an "Karkero, tu car mafê xwe nediparast?" were gotin an jî nivîsandin, dê zayendiya karker diyar bibe û pêdivî bi pirsê namîne. Zayendiya gotinan, nîşana dewlemendî û zengîniya zimên e. Di zimanê kurdî de ev taybetî, rêzaneke jênager e. Bê awarte ev rêz û rêçik, ango mêbûn û nêrbûna hebûnan di her warî de derbas dibe. Heta gotinan "Yezdan" jî gotineke

nêr e. Lewre em dibêjin "Yezdanê dilovan" Tu kes nabêje "Yezdana dilovan." Belê li gora olên yekyezdanî, bi taybetî ola îslamê, Xwedê yek e û bêhevpar û bêheval" e. Zayendiya "wî" nîn e. Lê cînavka kesaniya "wî" li şûna mirovê mêr an heyberên nêr bi kar tê. Gava ku mirovên kurd lava (dua) dikin, destê xwe vedigirin û dibêjin: "Xwedêyo!" an jî "Xudanê min! Xwedayê min!"

Di vir de her sê gotin jî ji bo hebûneke nêr bi kar tê. (Biborin, lê belê di zimanê kurdî de zayendiya Xwedê diyar e û nêr e. Ne gengaz e ku mirov bi awayekî din şirove bike. Dîsa jî em bawer dikin ku zanyar û seydayên me der barê vê mijarê de tiştêkî bibêjin û vê rewşê zelal bikin.) Em dixwazin çend mînakan ji têgihên olî bidin û zayendiya wan hîn bibin.

Zayendiya têgihên olî Ji bo yên mê: ol, Quran, bihuşt, dojeh, dêr, mizgeft, rojî, Yezdan, pêxember, baş, agir, keşe, seyda, rûpel... mê: (a/ya); ola Zerdest, Qurana pîroz, Bihušta Fîrdews, dojeha dadayî, Dêra Zafferan, Mizgefta Mezin, rojiya Remezanê.... nêr: (ê/yê); Yezdanê mezin, pêxemberê umetê, Baxê îrem, agirê sor, keşeyê ciwan, seydayê gund, rûpelê incîlê... Wekî ku li jorê jî me mînak dane, di têgihên olî de, bi giranî cih û war û alav wekî "mê" û avakar, ramangeh û peywirdar wekî "nêr" bi kar tên. Lewre jin, di tu olan de peywir negirtiye û tu car ne-

bûye xwedî erk. Bi rastî tenê ne di olan de jî, mixabin jin, di hemû civakên çînî yê dîrokî de bi tebatî (pasîf) tevgeriyaye û bindest maye. Îcar her çendî ku zanistiya vê yekê were niqaşkirin jî, ez bi xwe di vê baweriyê de me ku "mêbûn" û "nêrbûn" a gotinan girêdayî vê rewşê teşe girtiye. Ango, em dinêrin, di zimanê kurdî de çi tiştê ku bilebat (aktîf) be, wekî "nêr/mê" hatiye dîtin û hesibandin/pejirandin. Li dijberî wê, çi tiştê ku bitebat (pasîf) be, wekî "mê" hatiye dîtin. Teqez ev rêz û rêçik girêdayî serdestiyê (serdestiya mêr) û bindestiyê (bindistiya jinê) teşe girtiye û heta îro dom kiriye. Jixwe ziman jî li gora rewşa aborî angoyê, hilberînê teşe digire. Di hemû civakên çînî de mêr serdest bûye û rasterê ew beşdarî hilberînê bûye. Ji bo wê navê alavên hilberînê jî li gora ramana mêrê serdest, wekî "mê" an "nêr" bi kar hatiye. Em dixwazin li vir çend mînakên bidin.

#### **Zayendiya alavên hilberînê**

Ji bo yê mê: bêr, halet, das, melhêb, şal, têr, derzî, nêr bivir, gîsin, qeynax, mîrkut, bar, ferd, ta... mê: (a/ya); bêra nû, haleta kevn, dasa palehiyê, melhêba hesinî, şala kayê, têra genim, derziya hûr... nêr: (ê/yê); bivirê tûj, gîsinê ko, xeynaxê pale, mîrkûtê kin, barê hespê, ferdê arvên, tayê zirav... Alavên hilberînê yê bilebat wekî "nêr" û

yê bitebat jî wekî "mê" bi kar tên. Wekî ku tê zanîn; bivir ji bêrê bi lebatir e. Di nav alavê cot de, alavê herî girîng gîsin e. Das di fermana qeynax de dixebite; mîrkût ji melhêbê hêzdartir e. Her şal dibe bar, belê her bar ne şal e. (bar, ji şalê berfirehtir e). Ferde, ji têrê mezintir e. Ta bi derziyê vedibe. Ango di zimanê kurdî de tiştên hêzdar (bilebat) nêr û tiştên qels û lawaz mê ne. Ma sedema ku jin, bi hezaran salan wekî

#### **em dinêrin, di zimanê kurdî de çi tiştê ku bilebat (aktîf) be, wekî "nêr/mê" hatiye dîtin**

"darê şikestî" dihate/tê dîtin çi ye? (Dibe ku, jin jî di nav de, tu kes nikaribe di zimên de vê rêpîvanê biguhere. Belê jin dikare çarenûsa xwe biguhere û diguhere jî. Ya qels û lawaz ne jin e. Qelsî û lawazî di mêtî û ramana mêrê serdest te ye.) Wekî din jî di zimanê kurdî de, hemû têgih û bêjeyên civakî, bi zayendiya xwe têne nasîn: Demokrasiya welatê Rojhilata Navîn. Li jorê gotina "demokrasi" wekî "mê", gotina "welat" wekî "nêr" û "rojhilat" dîsa wekî "mê" bi kar hatiye. Mirov dikare çend mînakên din jî bide. Têgih û biwêj hemû bi heman awayî, an wekî "mê" an jî wekî nêr bi kar tên: Têkoşîna Rizgariya Gelê Kurdistanê. Di vir

de "têkoşîn" têgihêke "mê", "rizgarî" mê, "gel" nêr û "Kurdistan" jî mê ye. Li jorê jî me dît ku "welat" têgihêke nêr e. Li vir nakokî nîn e. Lewre "welat" û "Kurdistan" ne du gotinên hemwate ne. Welat têgihêke gelemperî ye, belê Kurdistan navêkî taybet yê welatê ye. Girêdayî vê, em dikarin tiştêkî din bibêjin. Hin gotin hene hemwate têne zanîn, lê belê bi rasteqînî ew gotin ne ji heman zimanî ne. Em dixwazin vê mijarê bi çend mînakên rave bikin. Wek mînak: "dîn" û "ol" du gotinên hemwate ne. Lê çawa? Dîne Xweda. Di vê têgihê de "dîn" nêr e û bi reseniya xwe erebî ye. Pênûsê min tûj e "Pênûs" mê ye, lê gotin bi reseniya xwe kurdî ye. "Qelem" û "pênûs" du gotinên hemwate ne, lê ne ji heman zimanî ne. Em çûn ser mezêlê şehîdan. "Mezel", gotineke nêr e û bi erebî ye. Me goristana cangoriyên welêt, bi kulîlkên rengîn xemiland. Goristan, gotineke mê ye û bi kurdî ye. Mezel û goristan, du gotinên hemwate ne, lê ji du zimanên cuda tên. Bi kurtasî di zimanê kurdî de her gotin, her tişt û her hebûn xwedî zayendî ye. Ango her tişt bi zayendiya xwe têne nasîn û bi zayendiya xwe têne fêmkirin.

# DI KURDÎ DE ERK Û ROLA TEWANGA NAVDÊR Û CÎNAVKAN

## Samî Berbang

Bi boneya vê konferansê me dil heye li ser çend taybetiyên rêzimana kurdî, bi taybetî jî li rêzimana kurmancî û dimilkî rawestin. Mijara ku em ê li ser rawestin, tewanga navdêr û cînavkan e. Sedema tengkirina çarçoweya xebatê ev e ku dê gelek beşdar li ser gelek mijarên cur bi cur dîtin û ramanên xwe pêşkêş bikin û mijarên gelemperî dê di gelek teblîxan de cih bigirin. Lewre jî heta ji me hat me bal kişand ser hin arîşeyên ku di xebatên nivîskî de herî zêde dibin sedema alozî û tevliheviyê. Ziman li gorî hin taybetiyên xwe hatine senifandin ango ji yê din hatine veqetandin. Zimanê kurdî ji ber hin taybetiyên xwe di nava koma Îndo-Ewropî de hatiye bicihkirin. Taybetiyeke zimanê kurdî jî tewangbarî ye. Di zimanê kurdî de hinek birên hevokê li gorî erka ku digirin ser xwe diguherin, hinek qertafan digirin; jî vê yekê re tewang tê gotin. Di kurdî de birên hevokê yê guherbar (lêker, navdêr, cînavk, veqetandek, jimarnav) ditewin. Lê zaravayên kurdî di vî warî de ji hev vediqetin. Di kurmancî û dimilkî de bi riya tewangê zayend û mêjera (yekjimarî û pirji-

marî) peyvê tê nîşandayîn. Lê di soranî de ji ber ku zayenda peyvan nîn e, tewang pirjimarî û yekjimarîya peyvê û binavkirî nebinavkirîbûna wê nîşan dide. Di kurmancî de pirjimarîya navdêr û cînavkên xwerû bi alîkariya veqetandek û lêkerê diyar dibin, lê di dimilkî de pirjimarî bi alîkariya qertafa "î" diyar dibe.

### **Wekî mînak:**

Kurmancî: Min sêv xwar (yekjimar û binavkirî)

Min sêv xwarin (pirjimar û binavkirî)

Min sêvek xwar (yekjimar û nebinavkirî)

Min sêvin xwarin (pirjimar û nebinavkirî)

Dimilkî: Min say werd Min sayî werdî

Soranî: Min sêv werd (nebinavkirî û yekjimar)

Min sêveke werd (binavkirî û yekjimar)

Min sêvekan werd (pirjimar)

Li vê derê dê mijara me tewanga navdêr û cînavkan be. Ji ber ku soranî di vî warî de ji zaravayên bakurê Kurdistanê kurmancî û dimilkî cuda dibe, emê bi taybetî li ser van her du zaravayên dawîn rawestin. Armanca me zelalkirina erka tewanga cînavk û navdêran û destnîşankirina çend arîşeyan e.

Erka tewanga navdêr û cînavkan çî ye? Ji bo çî hin navdêr û cînavk li hin cihan diguherin. Bo nimûne peyva "bajar" ji bo çî û li gorî çî dibe "bajêr" an jî çima li hin cihan hevok bi cînavka "ez" dest pê dibe, lê li hin cihan dibe "min"? Ji ber ku zimanzanên kurd ên mîna Celadet Bedirxan ji mêj ve li ser vê mijarê agahiyên zelal dane, pêwîst nake em heman tiştan dubare bikin, lê divê bê gotin ku erka wê tewangê ji ber cudakirina kirde û bireserê ye. Bi qasî ku em dizanin, di zimanê latînî de jî guherîneke bi vî rengî heye. Yanî, bi alîkariya qertafekê erka peyvê tê diyarkirin. Em li gorî qertafa ku girtine, têdighêjin ka ew peyv bireser e an kirde ye. Tewang li gorî zayend û mêjerê pêk tê. Mirov bi riya tewangê zayenda peyvê û mêjera wê jî fêhm dibe. Ji bo zelalbûna mijarê em dikarin li ser tewangê çend mînanan bidin. Tewanga navdêran:

.....

**Ziman li gorî hin taybetiyên xwe hatine senifandin ango ji yê din hatine veqetandin. Zimanê kurdî ji ber hin taybetiyên xwe di nava koma Îndo-Ewropî de hatiye bicihkirin. Taybetiyeke zimanê kurdî jî tewangbarî ye. Di zimanê kurdî de hinek birên hevokê li gorî erka ku digirin ser xwe diguherin, hinek qertafan digirin; jî vê yekê re .....tewang tê gotin.....**

Kurmancî: Zînê nan xwar.  
Zîn nênanî dixwe. Zîn sêvan  
dixwe.

Dimilkî: Zîne nan werd.  
Zîn nanî wena. Zîn sayan  
wena.

Tewanga cînavkan

Kurmancî: Ez (e)wî dibî-  
nim. (E)wî ew dît.

Dimilkî: Ez ey vînena. Aye  
o diyo.

### Arîşeyên tewangbariya kurmancî

Stûna rêzimana zaravayê  
kurmancî tewangbarî ye. Di  
kurmancî de tiştê biarîşe, te-  
wandina navdêr û cînavkan e.  
Pirjimarî û yekjimariya navdê-  
ran an jî nêr û mêtiya wan bi  
alîkariya veqetandek û qerta-  
fên tewangê û cînavkên pêve-  
bestî diyar dibe. Ji ber ku di  
hevokên ku bi lêkerên gergu-  
hez tên ristîn de kirde û bireser  
(subje-obje) heye, tewanga  
navdêr û cînavkan dema lêkera  
di hevokê de gerguhez (transîf)  
be pêwîst dike. Bi heman ar-  
mancê cînavkên ku cihê nav-  
dêran digirin jî ditewin, lewre  
jî di kurmancî de du kom cî-  
navk hene; koma xwerû û ko-  
ma tewandî. Ji bo ku mijar baş-  
tir bê fêmkirin mirov dikare  
mînakekê bide:

Zozan avê vedixwe

Zozanê av vexwar

Li vê derê her du hevok jî  
mîna hev in, bi tenê dema wan  
guheriye, lê guherîna demê bi  
xwe re cihê qertafa (ek, affix)  
guhartiye, di hevoka pêşîn de  
peyva "av" ango bireser tewi-  
yaye, di hevoka duyemîn de  
"Zozan" ango kirde tewiyaye.  
Heke em di cihê wan navdêran  
de cînavkan bi kar bînin, ewê jî  
xwe li heman rêpîvanê bînin.

Ew wê vedixwe

Wê ew vexwar

Heman rêpîvan (qayide) ji bo  
cînavk û rengdêr şanîdanê jî ka-  
rîger e. Wekî mînak; Min ew dît.  
Ez vî/vê dibînim. Ez vî/ê hevalî/ê  
dibînim. Min ew heval dît.

Her wekî me li jorê daxu-  
yand, rêpîvana tewandina navdêr  
û cînavkan ji mêj ve di serî de

### Stûna rêzimana zaravayê kurmancî tewangbarî ye.

#### Di kurmancî de tiştê biarîşe, tewandina navdêr û cînavkan e. Pirjimarî û yekjimariya navdêran an jî nêr û mêtiya wan bi alîkariya veqetandek û qertafên tewangê û cînavkên pêvebestî diyar dibe.

Celadet Bedirxan ji aliyê gelek  
lêkolîner û zimanzanên kurdî ve  
hatiye zelalkirin, lê dîsa jî em bi  
çend hevokan bînin bîra we. Di  
demên bê û niha de bireser (obje)  
û di demên borî de jî kirde (subje)  
ditewe. Jixwe mînakên li jorê jî  
vê dîtîne diselmînin. Di kurmancî  
de qertafên tewangê ev in: -ê (ji  
bo navdêr û cînavkên mê). -î (ji  
bo navdêr û cînavkên nêr). -an (ji  
bo navdêr û cînavkên pirjimar).

Mînak:

**Navdêr**

Ez sêvê dixwim.

Ez nanî dixwim.

Ez sêvan dixwim.

**Cînavk**

Ez (e)wê dixwim.

Ez (e)wî dixwim.

Ez (e)wan dixwim

Di kurmancî de arîşe dema ku  
lêker li gorî cînavkan têne ki-  
şandin derdikeve holê. Lêker di-  
vê tim li gorî navdêr û cînavkên

xwe bê kişandin, lê di hin devo-  
kan de ev yek pêk nayê. Bo ni-  
mûne li cihê ku bibêjin, "Min sêv  
xwarin", dibêjin "min sêvan  
xwar" an jî li şûna "min ew dît"  
"min wî dît" û li şûna "min ew dî-  
tin" jî "min wan dît" tê gotin. Ev  
yek bingeha rêzimana kurmancî  
ji binî ve têk dibe. Lewre bireser  
û kirde tevlihev dibin. Ev çewtî  
her çiqas di devokên gelek he-  
rêmên Bakur de hebin jî, neka-  
rîne bandorê li zimanê nivîskî  
bikin. Lê dîsa jî di gelek weşanên  
kurdî de mirov rastî nivîsên ku bi  
van devokan hatine nivîsandin tê.  
Bo nimûne, di kovara Nûdem,  
hejmara 32'yan de Zekî Boz-  
arslan li ser tewangê nivîsek da-  
rîjtiye. Em dikarin jî vê nivîsê  
çend mînanan pêşkêş bikin: "Min  
bi alîkariya swêdî mijarê ji ma-  
mosteyên cihê cihê re îzeh kir.  
Wî semavan netewandiye. Din-  
yayê biçûk kirine." Ev nivîs bi  
mînakên wiha mişt e, lê ji bo me  
evqas bes in. Dîsa di Medya TV  
de jî em gelek caran rastî mî-  
nakên wisa tînin. Bi kesên ji wan  
herêman hevokên mîna: "Wan ez  
dîtîm, min tu dîtî, min ew dîtî,  
wî em dîtî" jî gelekî dijwar tînin  
lêwre jî dibêjin; "wan min dît,  
min te dît, min wan dît." Lê ev  
hevok rêzimana kurmancî ji binî  
ve xera dikin, li mantikê zimên  
nayên. Heke mirov guh bide  
xwediyê van devokan bi tu awayî  
zimanekî hevgirtî pêk nayê. Lê  
arîşeya ji vê mezintir arîşeya  
diyarkirina mêjera bireserên yek-  
jimar ên dema borî ye. Her wekî  
me diyar kir, lêker di van he-  
vokan de her tim bi bireserê re  
lihevkişî ye. Heke bireser yekji-  
mar be, lêker jî yekjimar e, heke  
bireser pirjimar be, lêker jî pirji-  
mar e. Ji bo zelalkirina mijarê em  
dikarin van mînanan bidin:



Gundiyan hevalek dît

Gundiyan heval dîtin

Di van hevokan de lêker li gorî peyva "hevale" hatiye kişandin, di hevoka yekemîn de "heval" yekjimar û di ya duyemîn de jî pirjimar e. Tu bandora kirdeyê (gundiyan) li ser lêkerê nîn e. Lê di zimanê axaftinê de bi piranî "gundiyan hevalek dîtin" tê gotin, ev yek jî tevliheviyê çêdike, lewre bi kişandina lêkerê tê xwestin ku mêjera navdêr û cînavkên xwerû bîn diyarkirin. Heke bi alîkariya lêkeran nebe, ne pêkan e ku mêjera wan navdêr û cînavkan diyar bibe. Hin caran kirde bi temamî ji holê radibe ango qertafa /in/a dawiya lêkerê erka kirdeya veşarî (gizli özne) dibîne.

Wekî mînak:

Elî şandin girtîgehê

Li vê derê tê xuyakirin ku kesine nediyar an jî kesine ku li wir nehatine binavkirin, Elî şandîye girtîgehê, li gorî rêpîvana tewangê diviya "Elî şand girtîgehê" bihata gotin, lê wê çaxê jî mirov nikare pirjimariya kirde diyar bike. Mirov dikare bibêje, bila ew wekî awarteyekê bimîne, ziyana wê tune, lê mixabin ziyana wê heye, lewre bandora wê her diçe zêdetir dibe û wekî vîrûseke ku bikeve mêjîyê kompûterê, rêpîvana tewangê xera dike. Lewre tenê di dema kirdeya veşarî de di dema ku kirde diyar be de jî, ew xwe li ser zimên dike ferz. Çend mînakên ku me ji nivîsa Bozarşan a navborî girtine vê yekê baş nîşan didin. Her ziman xwediyê qeyîdeyên taybetî ne (Her ziman xwediyê qeyîdeyên taybetî ye) Yanê ew xwediyê wan e. Wî qeyîdeyên taybetî bi

kar aniye. (Wî qeyîdeyên taybetî bi kar anîne.) Yanê wî ew bi kar anîne. Dinyayê biçûk kirine (Wan dinya biçûk kiriye) Yanê wan ew biçûk kiriye.

Wekî encam, mirov dikare forma cînavkê veşarî "Elî şandin girtîgehê" wekî rewşeke awarte hilde dest, lê heta derkef hebin divê ber li wê formê bê tengkirin, da ku bandora wê belav nebe. Wekî din divê di mijara mêjera (pirjimar/yekjimarî) lêkeran de gelekî baldar be. Heta derfêr hebin di şûna cînavkên nediyar de jî divê navdêr an jî cînavk bê bikaranîn. Wate, "Polîsan Şoreş girtin de û birin girtîgehê" gotiye, divê teqez, "Polîsan Şoreş girt û bir girtîgehê" bê gotin. Her wiha divê "Şoreş girtin û birin" neyê gotin, "Wan Şoreş girt û bir" bê gotin.

#### Arîşeyên tewangbariya di-milkî

Di dimilkî de jî rêpîvana tewanga navdêr û cînavkan wekî kurmançî ye. Di vî zaravayî de jî wekî kurmançî du bir cînavk hene, cînavkên xwerû û yên tewandî. Qertafên tewangê: "-e" ji bo navdêr mê. "-î" ji bo navdêrên nêr. "-an" ji bo navdêrên pirjimar.

Mi saye werd

Min nanî werd

Ez embazan vîna

Di vî zaravayê kurdî de tevliheviyek di warê tewandina navdêrên mê de balê dikişîne, di hin devokan de navdêrên mê qet nayên tewandin, di hinekan de cihê qertafa "-e" qertafa "-î" digire. Kêşeyekê din jî bi taybetî di devoka Dêrsimê de ji bo diyarkirina zayenda gelek peyva li cihê ku peyv natewe jî qertafa tewangê tê

bikaranîn. Ev yek jî erka wê ya bingehîn ji holê radike. Bo nimûne; deyirbaz/ deyirbaze, nuştox/ nuştoxe, asinkar /asinkare, kurd/ kurde, wendox/ wendoxe, embaz/ embaze, waştox/waştoxe û hwd. Heman arîşe di kurmançî de di hinek sernavan de derdikeve pêşberî mirov, wekî mînak: navên wekî "Zîn, Zelal" wekî Zînê û Zelalê bi cih bûne. Lewre jî dema ku nav xwerû be jî tewandî xuya dike û ev jî tevliheviyê çêdike. Wekî mînak:

Zînê nêr dixwe

Zîne nanî wena

Her wekî ji mînanan jî diyar e, hem kirde hem jî bireser tewandî xuya dikin û ev yek jî bingeha rêpîvanê dirûxîne. Li vir divê serenava "Zîn" neyên tewandin û hevok bi vî rengî be:

Zîn nanî dixwe

Zîn nanî wena

#### Gotina dawîn

Ji bilî van arîşeyên ku hatin rêzîkirin gelek mijarên ku di rêzîmanê kurdî de divê mirov li ser raweste hene. Lê di çarçoweya konferanseke wiha de em tenê van xalan pêşkêşî dehn û bala beşdaran dikin da ku bi karibin li ser van xalan û gelekên din rawestin û ronî bikin. Heke ku pirs-girêka derketina derveyî welêt tunebûya û me karibûya em beşdariyê di vê konferansê de bikin, dê baştirbûya lê mixabin mercên heyî dest nadin vê yekê. Di encamê de em silav û hurmetê xwe pêşkêşî beşdaran dikin û hêvî dikin ku di vê konferansê de gelek kêşe û arîşeyên zimanê kurdî bêne çareserkerin da ku rê li ber zimanekî hevgerî yê kurdî be.

# BIKARANÎNA TEORIYA MUFREDATÊ JI BO ÇÊKIRINA BERNAMÊN ZIMAN Û RÊBAZÊN FÊRKIRINA ZIMAN

## Çeto ÖZEL

Yek ji pirsgirêkên zimanê kurdî ya ji hemûyan girîntir kêmasiya mufredateke neteweyî ye. Mufredat neqşa perwerdehiyê ye. Di tecrûbeyên hemû neteweyan de em dibînin ku di seranserê welatê wan de dibistan û zanîngeh xwedîyê mufredatên neteweyî ne, ji ber ku tenê mufredatek neteweyî dikare zimanê neteweyî ava bike. Sedemên cudatîyên di nivîs û axaftinan de ne tenê di nav gelê kurd; belê di nav rewşên kurd de jî nebûna mufredateke neteweyî ye. Pêwistiya mufredateke ziman a neteweyî ji bo standardîzekirina zimanê kurdî diyar e, belê ji bo mufredateke neteweyî çi pêwîst e?

Di çêkirina bernameyên ziman de, heke em bixwazin serfiraz bibin û bersiva pêwîstiyên kesên ku tevli bernameyê dibin bidin, divêt em di bikaranîn û pêkanînê de sistematîk bin. Rêberiya pîrensîbên rasyonel divêt bê bikaranîn. Pêwîst e ku bername bi awayeke zelal û sererast bê amadekarin da ku ji bo hemû biryardanan bibe pîvan.

Teoriya çêkirin û pêşvebirina mufredatê di mijara per-

werdê de arîkarî dide kesên ku di nav perwerdê de cihê xwe girtî ne da ku ev pirsyar û pirsgirêkên der barê çêkirin û bikaranîna bernameyên perwerdehiya neteweyî de çareser bikin. Teoriya çêkirin û pêşvebirina mufredatê bersiva pirsyaran wekî çi divêt bihêt fêrkirin, çawa dê bihêt fêrkirin û çawa ku ew yên hatine fêrkirin dê bîn hêlengandin dide.

Ew teoriye arîkariya zelal-kirina têkiliyên navbera faktorên perwerdê de her wekî xwendekar, mamoste, civak, dibistan, agahdarî û zanistiyê dîke. Teoriyên mufredatê her cih û her gavên pirsgirêkên der barê naveroka perwerdê hatiye holê bi awayekî hebûye. Belê, teoriya çêkirin û pêşvebirina mufredatê di serê sedsala bîsttan de li zanîngeh û dibistanên perwerdê bi awayekî zanistî li ser hatiye rawestîn û vekolandin.

Bingeha teoriya çêkirin û pêşvebirina mufredatê ew e ku çêkirin û bikaranîna bernameyê perwerdehiyê karekî kompleks e û divêt ew kar bi awayekî sistematîk û rasyonel bihêt bi serûberkirin. Armanca çêkirina mufredatê ew e ku perspektîfêkî bide û têkiliyan di navbera hemû faktorên ku di nav çêkirina bernameya per-

werdê de cihê xwe girtine dane. Ev teorî hewl dide ku yekitiya beşên bernameya perwerdê bi cihbîne da ku perwerde bigê armanca xwe û fêrbûnê xurtir û têrtir bike.

Bi rêberiya proseseke sistematîk em dikarin bersivên pirsyaran wekî çi rê û rêbaz ji bo fêrkirinê divêt bîn bikaranîn, çi konseptên ziman divêt bîn fêrkirin bi çi rêz divêt ew konseptên ziman bîn danasîn, çi pirtûk divêt bîn bikaranîn, çi materyalên arîkar ji bo xurtkirina pirtûkan divêt bihên bikaranîn û çi rêbazên hêlengandinê divêt bihên bikaranîn.

Gava, Tyler di sala 1950 an de modela xwe ya çêkirin û pêşvebirina mufredatê da nasîn, wî bingeha xebata xwe danî li ser çar pirsyaran bingehîn ên der barê perwerdê de. Ev

**Di çêkirina bernameyên ziman de, heke em bixwazin serfiraz bibin û bersiva pêwîstiyên kesên ku tevli bernameyê dibin bidin, divêt em di bikaranîn û pêkanînê de sistematîk bin. Rêberiya pîrensîbên rasyonel divêt bihêt bi kar anîn. Pêwîst e ku bername bi awayeke zelal û sererast bihêt amadekarin da ku ji bo hemû biryardanan bibe pîvan.**

her çar pirsyarên ku bingeha çêkirin û pêşvebirina mufredatê ye ev in:

Çi armancên perwerdeyî divêt dibistan bidin ber xwe da ku bi ser bikevin?

Çi rê û rêbazên perwerdê em dikarin peyda bikin da ku wan armanca bi ser bixî?

Çawa em dikarin wan rê û rêbazan bi awayekî xurt organîze bikin?

Em çawa dikarin biryar bidin kanî ew rê û rêbaz ji bo armanca perwerdê tîn pêkanîn?

Ev her çar pirsîyar ligel her çar faktorên bingehîn ên çêkirina mufredatê (1) danîna armanca (2) helbijartina naverokê (3) bikaranîn û (4) helsen-gandina encaman, yek in. Di hemû modelên çêkirin û helsen-gandinên mufredatan de ev çar faktor bingehîn in.

Di sala 1962 an de Hilda Taba her çar pirsîyarên Tyler firehtir kirin. Wê sê elementên din dane ser û mufredateke bi beşên bingehîntir, kûrtir û firehtir çêkir. Her heft elementên dîzaynkirina mufredatê ev in:

**Analîza pewistiyên xwendekar**

**Formîlosyona armanca**

**Helbijartina naverokê**

**Pêkanîna (organîzasyon) naverokê**

**Hilbijartina rê û rêbazên fêrbûnê**

**Pêkanîna rê û rêbazên fêrbûnê**

**Helsen-gandin**

1. Her wekî Tyler û Taba di modela xwe ya çêkirina mufredatê de diyarkirî ne pêngava yekem biryardana pêwistiyên xwendekar e.

Armancên xwendekarên civakê ji bo fêrbûna zimên

pêwistiyên wê civakê dide ber çavan. Bi taybetî civaka kurdan ku zimanê wan bi salan e qedexa ye pêdiviyên taybetî yên cuda cuda hene. Ji xwendekarên dibistana îptidaî bigire

**Em çawa dikarin biryar bidin kanî ew rê û rêbaz ji bo armanca perwerdê tîn pêkanîn?**

**Ev her çar pirsîyar ligel her çar faktorên bingehîn ên çêkirina mufredatê (1) danîna armanca (2) helbijartina naverokê (3) bikaranîn û (4) helsen-gandina encaman, yek in. Di hemû modelên çêkirin û helsen-gandinên mufredatan de ev çar faktor bingehîn in.**

heta xwendekarên zanîngehan divêt kesên mufredatê çêdikin pêwistiyên cuda cuda bînin ber çavan. Ji bilî xwendekarên dibistanan û zanîngehan di civaka kurdan de gelek komeleyên din, wekî karkeran, mamosteyan, rewşenbîran, siyasetmedaran, jinên malan û hwd hene ku divêt bersivên pêwistiyên wan jî bînin dayin. Bi zelalî diyar e ku pêwistiyên van komeleyên civaka kurdan cur bi cur in û her yekî taybetiyên xwe hene. Dibe ji hindekan re tenê xwendin û nivîsandin, ji hindekan re kurdiya akademîk û politik pêwist be. Rastiyek din jî heye ku îro kurdî ji bo gelek kurdan her wekî zima-

nekî biyanî ye. Bêguman pêwistiyên wan jî cuda ne.

2. Piştî biryardayina pêwistiyên xwendekarên pêngava duyem ew e ku di çarçowaya van pêwistîyan de armanca bînin diyarkirin.

Di encama bernameya perwerdehiyê de em dixwazin çî bi destê xwe bixî.

Di bernameyêke xurt de divêt armancên nêzik (rojane, hefteyî û hwd) û yên dûr (mehane salane û hwd) baş bînin pêkanîn.

**Mînak ji bo armancên nêzik:**

Di encama vê dersê de dê xwendekar bikarin rojê xwe ya rûtin bi kurdî binivîsin.

Dawiya vê dersê de dê xwendekar bikarin prosesa nivîsandinê fêr bibin.

Di vê dersê de dê xwendekar bêjeyên ku ji bo wan nû ne di nav hevokên nû de bikarbin.

**Mînak ji bo armancên dûr.**

Di dawiya vê mehê de dê xwendekar dema niha ya fireh, dema niha ya têdayî û hevokên mercî (şertane) fêr bibin.

1. Di dawiya çar mehan de dê xwendekar kurdiya despêkê fêr bibin.

2. Di dawiya vê salê de dê xwendekar kurdiya destpêk û navîn fêr bibin.

Ji bo helbijartina armancên bernameyên perwerdê û ji bo biryardana armancên bername-

ya perwerdê ramanên mamos-teyan, xwendekaran, nivîskarên pirtûkên bernamê û kesên din ên ku bi bernamê ve girêdayî pêwîst e.

3. Gava biryara armanca ji bo bernamê hate dayîn, helbijartina naverokeke taybetî divê bihêt pêkanîn. Di nav naverokê de dibe ku giranî li ser bêjeyan, nivîsan, xwendinan, an jî beşên rêziman û lînguîstîkî, her wekî fonolojî (zanîstiya dengan) sentaks (hevok-sazî) û morfolojiyê an jî çand, helbest û wêjeya kurdî be.

Helbijartina naverokê karekî sanayî nîn e. Bi taybetî ev kar ji bo zimanê kurdî hêsta zortir e ji ber ku materyalên ji bo fêrkirina zimanê kurdî gelek kêr in. Materyalên îro di destê me de ne nûjen nîn e û têrê jî nakin. Ji bo naverokê rayda û bi seng divê materyalên nûjen bîn amadekirin û bikaranîn. Her wiha divê materyalên kêrhatî yê ku niha di destê me de bîn bikaranîn. Her çiqas karê helbijartina naverokê giran be jî, heke bi rêk û pêk bihêt kirin bandoreke gelek erênî li ser bernamê dike.

4. Pêkanîna naverokê di amadekirina bernamêyên zimanfirkirinê de cihekî girîng digire. Ew konseptên ji bo naverokê hatine helbijartin divê bi awayekî serûber bihêt pêkanîn. Di vî warî de kesên pispor dikarin biryarên binetî bidin; kanê kîjan konsept dê kîjan demê de bihêt fêrkirin. Kîjan konseptên ziman ji kîjanê gi-

rîngtir e. Pêkanîna naverokê an jî amadekirina beşên ziman ji bo qursên cuda cuda, polên cuda cuda divê teoriya xwedî, çêbûna ziman, bîngêhên lînguîstîkê, teoriya fêrbûna ziman

**Çi kes nikare lîsta hevokên zimanekî çêbike, belê em dikarin lîsta qeyîdan, rêzan yê ku bi hevra girêdayî ji bo axaftin û têgihistina hevokên bê sînorkêrtin çêbikin.**

û rêbazên fêrkirina ziman bi awayekî profesyonel bihêt bikaranîn. Pêkanîna naverokê divê girêdayî armacên ku hatine diyarkirin be.

Ji bîngêhên teoriya mufredatê yeka herî girîng ji ew e ku kesên ku mufredatê çêdikin divê entegrasyona qabîliyetên ziman (xwendin, nivîsandin, axaftin û guhdarîkirin) û nasandina konseptên ziman di demê rast de bike.

5. Piştî ku naverok hate helbijartin û pêkanîn divê gavên rêbazên fêrbûna xwendekaran bîn helbijartin û pêkanîn. Dibe ku kesên mufredat nivîsî û pêkanî arîkariya mamostayan ji bo amadekirina dersan bike, belê berpirsiyariya herî mezin di babeta gavên helbijartin û pêkanîna rêbazên fêrbûna xwendekaran a mamosta bi xwe ye. Sê mijarên ji bo mamostayan girîng ev in:

**Agahdariya der barê zimanê ku têt fêrkirin**

**Zanîna rê û rêbazên fêrkirina ziman**

**Zanîna psikolojiya fêrbûnê**

Li vir em dikarin ku bibêjin agahiya zimanzanînê (lînguîstîk) pir girîng e. Ew gava mirov zimanekî bizane ew dikare wî zimanî biaxife û mirovên din yê ku wî zimanî diaxifin têbigihin. Wateya wê ew e ku, mirov dikare dengên bi wateyên aşîkar bide û dengên ku mirovên din didin jî têbigebe.

Hingî, zanîna zimani, zanîna sazûmana deng û wateya wê ya pevgerêdayî ye. Gava yek bi zimanekî nizanibe, dengên wî zimanê biyanî yê ku tene gotin ji bo wî bê wate ne. Ji ber ku pevgerêdanîya deng û wateya wan pevgerêdanîyeke serbixwe ye.

Agahîya ziman zanînê, hêza pêkanîna bêjeyan ji bo çêkirina hevokan dide mirovan. Zimanzanîn ew e ku mirov hevokên berê nehatine bihîstin û gotin çêbike û bibêje. Her wiha hevokên berê nehatine gotin û çêkirin têbigihi. Zimanzanekî berketî Noam Chomsky dibêje wê qabîliyetê rexê afirandêriya ziman xebitandinê.

**Tu kes nikare lîsteya hevokên zimanekî çêbike, belê em dikarin lîsteya qeyîdan, rêzan yê ku bi hev re girêdayî ji bo axaftin û têgihistina hevokên bê sînorkêrtin çêbikin.**

Ew qeyîdeyên hevoksazîya (syntax) ziman dihilgire hundirê xwe. Ew gava kesek zi-

man fêr dibe, ew wan qeyîdên sazûmana deng (fonolojî) û rêya deng, têgih û wateya (semantîk) wê fêr dibe. Hingî, em dikarin bibêjin ziman sazûmana deng û wateyê ye, ku serbixwe bi hev re girêdayî ye. Ew gava mirov zimani dizane mirov wê sazûmanê dizane.

### Rebazên zimanzanînê

Ji berê heta niha gelek rêbaz li ser fêrbûna wê sazûmanê hatine damezirandin. Ji bo kurdên derveyî welat yê ku kurdî nizanin an jî kêman dizanin em dikarin çend rêbazên ziman fêrkirinê bikarbin. Ya ji hemuyan kevntir rêbaza wergera rêzimanî ye. Ew rêbaz berê bigelempêrî ji bo fêrbûn û xwendina Grekî û Latinî hatîye xebitandinê. Bikaranîna wê metodê em di nêzikî dawîya sedsala nozdehan de pirtir dibinin. Binetarê wê jiberkirina rêzên rêzimanî, li ser tekstên helbijartî ye.

Her wekî reaksiyoneke li dijî metoda jorîn metodeke nû ya ku dibêjinê rêbaza direkt derket. Pêşengiya wê metodê Profesor E. W. Gatenby û Dr. Robert Lado kirine. Di wê rêbazê de ziman bi terzekê din têt fêrkirin. Ders bi diyalogekê an jî bi anekdotekê dest pêdike û hindari jî bi pirsîyarên di derbarê diyalogê-anekdote de cihê xwe digire. Rêziman û çanda xwediyê wî zimani bi îndaktîvî têt fêr kirin. Bêje, pêşiyê tene bikaranîn û gelek dawî de tene aşîkarkirin.

Hindek xebatên li ser psîkolojiyê û zanînê bi xasmetî zanîna zimanan rêbazekî nû debejinê rêbaza audîolingual derxiste meydanê. Pêşengiya wê rêbazê Skinner û Bloomfield kiriye. Skinner di xebatên

### Hindek xebatên li ser psîkolojiyê û zanînê bi xasmetî zanîna zimanan rêbazekî nû debejinê rêbaza audîolingual derxiste meydanê. Pêşengiya wê rêbazê Skinner û Bloomfield kiriye

xwe da li ser şiyarker, bersiv û destekdan an jî xurtkirinê (stimulusresponsereinforcement) rawestîye. Ew metode encama teorîya behaviourismê ye, û pirtist jî, ji metoda direkt wergirtîye. Psîkolojiya behaviourismê dibêje hemu fêrbun (fêrbûna ziman jî) bi hûtbuyînê cihê xwe digire. Mamosta û zimannasan ew teorî ji bo zimanzanînê bikar anîne. Ew dibêjin zanîna zimên tiştekî hûtbuyîn e, ji ber vê yekê ziman bi rêya diyalogan, ducarkirinê û jiberkirinê baştir têt fêr kirin. Rêziman jî di nav diyalogan da bi arikariya ducarkirinê têt dan. Her çar qabîlyetên zimên guhdarîkirin, axaftin, xwendin û nivîsandin tene bikaranîn. Lê belê, guhdarîkirin û axaftin ji her du qabîlyetên din; xwendin û nivîsandinê girîngtir in di wê metodê da. Ew rêbaz niha jî li gelek cihên dinyayê têt bi-

karanîn.

Sala 1959 an Noam Chomsky li dijî wê teorîya Skinner ya Behaviourism derket û ew teorî serûbin kir. Wî binetarê rêbaza Cognitivismê danî. Chomsky di pirtûka xwe ya Aspects of The Theory of Syntax dibêje ziman fêrbûn tiştekî hûtbuyînê nîn e, ziman fêrbûn tiştekî afirandêrî ye û qabîlyeta mirovan ya ziman fêrbûnê zikmakî de heye. Heke ne wisa ba, ew dibêje çawan zarok dikarin ku tistên wan berê negotiye niha bibêjin. Chomsky dibêje mirovan qabîlyet û performansa zimannasiyê heye, ji ber wê hindê ew dikarin hevokên berê nehatine gotin biafirinin. Li wê rêbazê de ziman bi terzekê komînikasyonî (ragihandinî) têt fêrkirin. Rêziman û her çar qabîlyetên zimên guhdarîkirin, axaftin, xwendin û nivîsandin wekhevî bi gelemperî di nav konteksekê de têt dayin. Di wê rêbazê de ji para hemûyan pirtir rexê komînikasyona zimên cih digire. Di rêbaza Cognitivism de jiberkirin, an jî ducarkirina zimên gelek nîn e. Li cihê wê divêt xwendekar bi ponijîn û afirandêr bin.

Hemû rêbazên ziman fêrkirinê rexên xwe yê baş û yê nekêhatî hene. Tu rêbaz bi serê xwe tenê têt nîn e. Ji ber wê hindê pêwîste ku rêbazek eklektîk ji bo ziman fêrkirinê bihê helbijartin. Mamosta dikarin ji her rêbazekî rexên kêrhatî, ji bo pêkanîn û lidarxisti-

na dersên xwe bi kar bînin. Ew rêbaza eklektîk dê karê ziman fêrkirinê hêsantir û xurtir bike.

### **Bikaranîna rêbazên sereke ji bo fêrkirina ziman**

#### **Rêbaza wergera gramêrê**

Ev rêbaz bitaybetî ji bo fêrkirina Grekî û Latinî hatiye bikaranîn, belê zimanên nûjen jî ev rêbaz bikar anîne.

Di vê rêbazê de:

Ders bi zimanê dayikê tînin dayin.

Parçeyên xwendinê yên ji bo xwendekaran zor zû dest rêdike.

Bêje bêtî kontekstê tînin fêrkirin.

Rêzên rêzimanî bi kêrahî tînin fêrkirin.

Telafoza bêjeyan gelek pêwîst nînin e.

Rêziman ji bo bi hev re girêdana bêjeyan tînin bikaranîn.

Hinkarî bi granî li ser bînetarê wergera hevokên ji yek û dû veqetiyayî ye.

#### **Rêbaza Rastûrast (dîrekt)**

Ji bo fêrkirina zimanên nûjen her wekî reaksiyoneke ji dijî rêbaza wergera rêziman derketiye. Di vê rêbazê de:

1. Ders bi diyalogan anjî bi anekdotan dest pêdike.

2. Materyalên dersan bi wêneyan an jî bi demonstrasyonan dest pêdike.

3. Tenê zimanê tînin fêrkirin tînin bikaranîn.

Di dersan de pirsyarkirin û bersivdayin cihê girîng digire.

Rêziman û rêzên rêzimanî direkt tînin fêrkirin. Pêwîst nînin e ku xwendekar gelek li ser rêzan biponijin.

Bêje berê tînin fêrkirin, û paşê formên wan tînin fêrkirin.

Rêziman bi awayekî îndaktîvî tînin fêrkirin.

#### **Rêbaza xwendinê**

Ev rêbaz ji bo armancên pratîk tînin bikaranîn. Bi gelemperî ji bo kesên ku tenê xwendin pêwîst e. Di vê rêbazê de:

1. Armanca yekemîn fêrkirina xwendinê ye.

2. Tenê rêzimana ji bo xwendinê pêwîst, tînin fêrkirinê.

3. Telefuz ne girîng e.

4. Di destpêkê de xwendin hem di sinifê û hem jî di derveyî sinifê bi piranî cihê xwe digire.

Bêjeyên xwendinê yên destpêkê tînin kontrol kirin, hêdî hêdî tînin fêrkirin.

Fêrkirina bêjeyan tînin firehkirin ji ber ku bêje ji qabîliyetên rêziman girîngtir tînin pejiirandin.

Wergera ziman dîsa xwe diyar dîke.

#### **Rêbaza Audiolingual**

Piraniya vê rêbazê ji rêbaza dîrekt tînin û her wekî reaksiyoneke dijî rêbaza xwendinê derketiye. Binetare wê li ser psîkolojiya behaviourismê hatiye danîn. Di vê rêbazê de:

Ziman bi diyalogan tînin fêrkirin.

Jiberkirin û dubarekirin gelek e. (Bawerî ew e ku ziman fêrbûn tiştêk hûtbûyî ye)

Ziman tînin beşkirin û beşên ziman yek bi yek tînin fêrkirin.

Qabîliyetên ziman bi rêze; guhdarîkirin, axaftin, xwendin û nivîsandin tînin fêrkirin.

Bêje di nav konteksekê de tînin fêrkirin.

Teyp, labaratuvarên ziman û arîkarên dîdenî tînin bikaranîn.

Telafoza bêjeyan gelek girîng e.

Mamosta hewl didin da ku xwendekar tu xeletiyên nekin.

Rêziman bi awayekî îndaktîvî tînin fêrkirin

#### **Rêbaza Ragihandinê**

Rêbaza Ragihandinê (Communicative approach/ cognitive approach)

Dijî rêbaza audiolingual û psîkolojiya behaviourismê derketiye.

Giranî li ser qabîliyetên ragihandinê ye.

Xwedibûna ziman **hûtbûyî** nahête ditin.

Li ser telafozê gelek nahête rawestan.

Xwendekar cot cot an jî kom kom dixebitin.

Mamosta ne wekî otorîtekê, belê wekî arîkarekê rola xwe tîne cih.

Xeletiyên ziman ji bo fêrbûna ziman arîkar tînin dîtin.

Senga kabîliyetên ziman yên nivîskî (xwendin û nivîsandin) û yên axaftinê (axaftin û guhdarîkirin) wek hev e.

Hemû mijarên fêrkirine di nav konteksekê de bi arîkariya tiştên dîdenî, wêneyan an jî bi çirokan tînin pêşkêşkirin.

Şirovekirina rêziman bi awayekî dîdaktîvî têt kirin.

### Psîkolojiya Fêrbûne

Zanîna psîkolojiya fêrbûnê gelek arîkariyê dide mamostayan û nivîskarên pirtûkên fêrkirina ziman, ji ber wê hindê pêwîste ku em analîz bikin ku mirov çawan ziman fêr dibin. Di teoriya fêrbûnê de, her wekî gelek zanist jî dibêjin şeş sefheyên bingehîn hene. Ew her şeş sefhe dikarin ji bo fêrbûna ziman bîn bikaranîn.

Ji wan şeş sefheyên a yekemîn agahdarî ye. Bi gotinek din, mamosta çî bi devkî, çî bi wêneyan, an jî bi seneryoyekê zimanê ku ew dixwaze fêr bike pêşkêş dike. Di pêşkêşkirina agahiyên nû de mamosta ji sedîsed xwedî kontrolê ye di polên ziman de. Xwendekar wan agahiyên di nav mêjiyên xwe de derbas dike. Ew girêdaneke di navbenda agahiyên xwe yê kevn û yê nû de çêdike.

Sefheya duyemîn têngihîştina zimanê ne. Ew gava ku xwendekar agahdar bûn û têngihîştin divê ew bîn pirsyarkirin de ku ew agahdarî û têngihîştina xwe bikar bînin. Mamosta divê berê bikaranîna ziman bizanibe kanê xwendekar agahiyên ku ji bo wan nû ne têngihîştine an na. Paşê wê hindê mamosta rêya xwendekaran ji bo bikaranîna ziman vedike, belê kontrola xwe ji dest bernade, xwendekar di bin bandora mamosta de zimanê ku ji bo wan hatiye pêşkêşkirin bikar tînin.

Di sefheya sêyemîn de xwendekar zimanê bê kontrola mamosta bikar tînin. Ew bi serê xwe ne. Ew zimanê ku wan di sefheya yekemîn û duyemîn de dîtibû ew dê bikar bînin. Li wir mamosta her wekî alîkarekê di sinifê de rola xwe tîne çih. Serfirazbûna xwendekaran di wê sefheyê de, girêdayî sefhaya yekemîn û duyemîn e. Heke di wan sefheya de ziman bi rêk û pêk hatibe pêşkêşkirin, û fêrkirin, bikaranîna zimanê de sefheya sêyemîn de hêsantir be.

Bikaranîna zimanê ji bo ragihandinan pêngavek gelek girîng e. Divê xwendekar xwedî însiyatîf bin da ku zimanê ku ew fêrbûnê ji bo ragihandinên xwe bikar bînin. Heke xwendekaran têri xwe di sinifê de ziman ji bo armancên xwe bikar anîn, ew dê bikarin li derveyî sinifê jî, di nav civakê de wî zimanê ji bo ragihandinên xwe bikar bînin. Xebatên didu, sê, çar, kom kom û nîqasên li ser agahiyên nû fersendekî girîng dide xwendekaran ji bo ragihandinên civakî.

Tenê piştî bikaranîna ziman, xwendekar dikarin agahiyên ji bo wan nû bi awayekî zanistî analîz bikin.

Di pêngava sentezkirinê de jî xwendekar dikarin behavanî û bereksiya agahiyên nû û yê ku ew berê fêrbûne bikin. (Ev alîkarî dide xwendekaran da ku agahiyên bastir têbigihin û wan agahiyên ji bo bîranîna

dûr ji xwe re hilgirin)

Di teoriya fêrbûnê de sefheya dawî hêlengandin e. Di wê sefhê de xwendekar derbarî fêrbûna nû de dibin xwedî raman. Xwendekar di dawiyê de zimanê ku ew fêrbûne di-hêlengînin û dibînin ku çawa jiyana wan ya civakî de ew ziman çihê xwe digire.

### Teoriya (psîkolojiya) fêrbûnê ji bo ziman

Beşa dawî ya tevahiya dîzaynkirina mifredatê hêlengandinê mifredatê ye. Encamên ku mifredat gehîştîyê pêwîst e ku bîn hêlengandin. Bêyî hêlengandinê mifredatê, kesên di nav karê perwerdê de nikarin mifredatê pêş ve bibin, baştir bikin an jî bersivên pêwîstiyên ku nû derketine bidin ji ber ku pêwîstiyên xwendekaran pêwîstiyên civakê ne û ew pêwîstî jî tu carî sitatîk namînin. Baş têt zanîn ku hêlengandin di gelek alîyan de, her wekî kontrola li ser xwendekaran, pêkanî û amadekirina dersan, motîvekîrîna xwendekaran ji bo ders kirinê û di bernamê de pêngav pêşavetî û paşavetî de arîkariyek gelek gewre dide mamostayan û kesên ku di nav karê çêkirina mifredatên neteweyî de ne.

### Dawî

Her wekî di serê vê gotarê de jî hatî gotin ji bo serfirazbûna bernamê perwerdehiyê pêwîste binetar li ser prensîbên rasyonel bihêt danin. Divê prosesek sistematîk û za-

<b>1. Pêşkêşkirina ziman( danîna agahiyan)</b>	Mamosta bi tiştên dîdenî, vîjûal an jî bi sener-yoyekê ziman pêşkêş dike. Kontrola mamosta %100 e
<b>2. Têgihîştin (bikaranîna ziman)</b>	Mamosta bi pirsîyar û hinkariyan têgihîştinê kontrol dike. Gotin Nişandan Tevlêkirin Kontrola mamosta %90 e
<b>3. Bikaranîna ziman</b>	Mamosta kontrola xwe sist dike û her wekî arîkarekê rola xwe dileyze
<b>4. Bikaranîna ziman ji bo ragihandinan</b>	Xwendekar serbest dixebitin û zimani ji bo ragihandinan bi kar tînin. Mamosta arîkar e.
<b>5. Analîz û sentez</b>	Tenê piştî bikaranîna ziman, xwendekar dikarin agahdariya nû analîz bikin. Ew arîkari dide xwendekaran da ku wan agahiyan baştir têbigihin û wan agahiyan ji bo biranîna dût ji xwe re hilgirin. Di pêngava sentezkirinê de xwendekar li wir dikarin berhavanî û bereksiya agahiyan nû û yê kevn ku ew fêrbûne bikin.
<b>6. Helsebandin</b>	Xwendekar dibin xwediyê ramanan. Bikaranîna ziman di nav civakê de nişanê wan dide ku fêrbûnê cihê xwe girtiye

nistî bihêt bikaranîn. Ji bo realîzekirina vê mebestê rêyek heye ew jî bikaranîna teoriya pêşvebirina mifredatê ye. Her çiqas cure cure teoriyên mifredatê hebin jî, ew hemû giringiyê didin li ser pêwistiyan, armancan û rêberiya sistematîk.

Mamostayên ku ji bo pêşkêşkirina ziman, fêrkirina ziman, rêbazên bingehîn û psîkolojiya fêrbûnê bizanin dikarin dersên xwe bi awayekî profesyonelî pêkbinin û pêşkêş bikin. Dîsa ew dikarin xwendekarên xwe bikêşine nav dersê de û pirsgirêkên xwendekarên xwe tespît bikin û ji bo wan çareseriyê peyda bikin.

Ji bo bikaranîna bernamê bi awayekî xurt tecrube û pis-

poriya mamosteyan bingehîn e. Ji bilî huner, qabîliyet, tecrube û pisporiya mamosta, rêdanên dibistan û mamosta, rewşa xwendekaran der barê ziman û materyalan de jî, ji bo serfirazbûna bernamê her yekî bandora xwe heye.

Ne tenê ji bo ziman belê divê mifredat ji bo her mijarekê bihêt amadekirin û materyal bîn nivîsin. Ne pêwîste ku em xwe çawrê serbestkirina perwerdeya bi zimanê kurdî bigirin, Divê mamosteyên her mijarekê matematîk, bîyolojî, fîzîk, û hwd, di nav bizaveki de bin û amadekariya nivîsina pirtukên wan mijaran bi rêbazên nûjen bikin. Dibe ku ew pirtukên ku tînin nivîsin niha ji se-

dîsed kêrî perwerde nebin, belê dîsa jî her materyalên ku tînin amadekirin dê bi kêrî gelek xebatên akademîk bîn. Bi kêrî wê ev materyal bi termonolojiya xwe bibin çavkanî ji bo mifredatek neteweyî.

Tecrube yê kurdên başur divê em bînin berçavan û li ser lêkolînan bikin ji ber ku ew bi salan e ew ji dibistanên iptidaî bigire heta zaningehan perwerde bi zimanê kurdî dikin. Heke rê hebe di seranserê welat tîkiliyên kesên di nav karê perwerde de hebe û mifredatên neteweyî bîn amadekirin ew dê rê bide nêzîkbûna zaravayan jî û dê cudatîyên navbeyna zaravayan kêmtir bike.

Ji bo bersivdana wan hemû



M I F R E D A T	1. Analîza Pêwistîyan →	-Pêwistîyên xwendekaran û yên civakê -Kurdiya gelemperî -Kurdiya akademîk -Pêwistîyên din
	2. Formilasyona Armanca →	-Armancên nêzîk ( rojane, heftiyane) -Armancên dûr (mehane, salane)
	3. Helbijartina Naverokê →	Nivîsandin, xwendin, fonolojî, hevoksazî, çand, wêje û helbest, hwd
	4. Pêkanîna Naverokê →	Duyêkbirina naverokê, kîjan konsept kîjan demê bihêt fêrkirin, beşên ziman, qursên cure cure, teoriya xwedîbuna ziman, teoriya fêrbunê bingehên lîguîstîkê rêbazên ziman fêrbunê
	5. Helbijartina rê û rêbazên fêrbunê →	- agahdariya ziman - rê û rêbazên ziman fêrbunê - psîkolojîya fêrbunê
	6. Pêkanîna rê û rêbazên fêrbunê →	Perwerdeya mamustayên ziman ji bo pêkanîna dersan û rêvebirîya mifredatê Teknikên ziman fêrkirinê
	7. Helsengandin →	Pêşvebirin, bersivên pêwîstîyên nû Pêngav pêş avêtin û paş avêtin

## TEORIYA (PSÛKOLOJIYA) FÊRBÛNÊ JI BO ZIMAN

<p><b>1. Pêşkêşkirina ziman (danîna</b></p>	<p>Mamosta bi tiştên didenî, vîjûal (wêne, vîdeo, slayt, demonstrasyon) anjî bi senaryoyekî ziman pêşkêş dike. Kontrola mamosta %100 e</p>
<p><b>2. Têgihiştin (bikaranîna ziman)</b></p>	<p>Mamosta bi pirsiyaran û hinkariyan têgihiştinê kontrol dike. Gotin, nîşandan, tevlêkirin. Kontrola mamosta %90 e</p>
<p><b>3. Bikaranîna ziman</b></p>	<p>Mamosta kontrola xwe sist dike û her wekî arîkarekê rola xwe dileyîze.</p>
<p><b>4. Bikaranîna ziman ji bo ragihandi-</b></p>	<p>Xwendekar serbest dixebitin û zimên ji bo ragihandinan bi kar tînin. Mamosta arîkar e.</p>
<p><b>5. Analîz û sentez</b></p>	<p>Tenê piştî bikaranîna ziman, xwendekar dikarin agahdariya nû analîz bikin. Ew arîkarî dide xwendekaran da ku wan agahiyan baştir têbigihin û wan agahiyan ji bo biranîna dûr ji xwe re hilgirin. Di pêngava sentezkirinê de xwendekar li wir dikarin berhavanî û bereksiya agahiyên nû û yên kevin ew fêrbûne bikin.</p>
<p><b>6. Helsengandin</b></p>	<p>Xwendekar dibin xwediye ramanan. Bikaranîna ziman di nav civakê de nîşanê wan dide ku fêrbûnê cihê xwe girtiye.</p>

## RÊBAZÊN SEREKE YÊN ZIMAN FÊRKIRINÊ

<p><b>1. Rêbaza wergera ziman</b> →</p>	<p>Dawiya 1900 ji bo grekî û latînî hatiye xebitandin. Binetar: jiberkirina rêzên rêzimanî û reziman bi kurahî têt fêrkirin.</p>
---	--

2. Rêbaza dîrekt →	Pêşengiya wê Prof.E. W. Gatenby û Dr Robert Lado kiriye. Ders: diyalog-anekdot Hinkarî: pirsiyar der barê diyalog-anekdot
3. Rêbaza xwendinê →	Ji bo armancên pratîk û kesên tenê xwendin pêwîst hatiye bikaranîn. Rêzimana ji bo xwendinê pêwîst tê fêrkirin
4. Rêbaza audiolinguzal →	1920-30 Di encama xebatên ser psîkolojiya behaviourismê û lînguîstîkê derketiye. Pêşengiya wê Leonard Bloomfield û Skinner kiriye. Gringî li ser şiyarker - bersiv dan - xurtkirinê ye. Fêrbûn hûtbûyîn e. Dubarekirin û jiberkirina diyalogan gelek e. Rêziman di nav diyalogan tê fêrkirin. G.A.X. N bi rêzê ten fêrkirin
5. Rêbaza ragihandinê →	Pêşengiya wê Noam Chomsky kiriye. Dijî psîkolojiya behaviourismê derketiye. Fêrbûn tiştê hûtbûyîn nîn e afirandêrî ye. Mirovan performans û qabiliyeta zimanfêrbûnê zikmayî de heye. Her çar qabiliyetên ziman G. A. X. N bi awayek ragihandinî ten fêrkirin.
6. Rêbaza eklektîk →	Çi rêbaz bi serê xwe têr nîn e. Ji bo ziman fêrbûnê rêbazek eklektîk divê bê bikaranîn. Rexên kêrhatî yên hemû rêbazan mamoste dikarin ji bo xurtkirina dersên xwe bikar bînin.

#### ÇAVKANÎ

1. Dubin, F., and Olshtain, E. (1986) Course Design: Developing Programs and Materials for Language learning. Cambridge University Press.
2. Eggen, P. D., Kauchak, D P., and Harder, R. J. ( 1979) . Strategies for Teachers: Information Processing Models in the Classroom. London: Prentice - Hall.
3. Taba: H. (1962) Curriculum Development: Theory and Practice. New York: Harcourt, Brace and World.
4. Bellon, J. J., and Handler, J. R. (1982). Curriculum development and evaluation: A desing: for improvement. Kendall/Hun
5. Munby, J. (1978) . Communicative syllabus desing: A sociolinguistic model for defining the content of purpose-specific language programs. Cambridge University Press.
6. Vollance, E.(1982) . The practical uses of curriculum theory. Theory into Practice, 21 (1):4-10.
7. White, R. V. (1988) The ELT curriculum: Desingn. Innovation. And management. Basil Blackwell. Ltd.
8. Worthen, B. R. and Sanders, J. R. (1973) . Educational evaluation: Theory and practice. Charles A. Jones Publishing Co.
9. Yalden, J. (1987) . Principles of course desing for language teaching. Cambridge University Press.
10. Chomsky Noam. Language and Mind anlerged ed. New York Harcourt Brace Javanovich 1972.

## DADGEHA WIJDAN Û TEVGERA ME YA DÎROKÎ

**Cebar QADIR**

Rojnameya Peyam di hejmaraya xwe ya heştan a meha Tîrmehê de gotareke mêjûzanê kurd Dr. Kemal Mezher Ehmed li ser navê “Wijdan û Mêjû yan Dadgey Hemey Silêman” de weşand. Gotar ji kovara “Rengîn”, ji hejmara 102 yan a sala 1997’an hatiye wergerandin. “Rengîn”, ji aliyê Komelaya Rewşenbîr û Weşanxaneya Kurdî ve ku bi ser Wezareta Ragihandinê ya Iraqê bû, li Bexdayê derdiçû. Min bi xwe deqa (tekst) kovara Rengîn nedîtiye, lewre şîroveya min dê li ser gotara Dr. Kemal Mezher a li ser bingeha deqa Peyamê be. Xalên ku di gotara Dr. Kemal Mezher de girîng in û min pêwîst dît ku ez di vir de qala wan bikim ev in:

1) Piraniya nûser û mêjûzanên kurd, bêyî ku hewl bidin xwe, da ku li bûyerên dîrokî bikolin û nixandineke zanistî bikin, navên kesayetiyên dîrokî û serpêhatiyên wan, bêyî ku bikevin nav bingeh û binyata rastî û dirustiyê, li gorî nûserên pêşiya xwe vedibêjin û rave dikin; her çend ku ji rastiye dîr bin jî. Bi vî awayî her wekî ku Dr. Kemal Mezher jî

di gotara xwe de nivîsiye, dereweke vehûnandî û jî rastiye dîr a fitnebazekî nehez bi zora zordarekî dikine rastiyeke dîrokî. Ji wan xirabtir jî, wan derewên vehûnandî dikin rastiyeke dîrokî û bi wan re pirnan û pîvazan jî dixwin, bi taybetî ji aliyê xêrnexwaz û dijminên xedar ên kurdan ve ew yek tê bikaranîn. Ger mirov bixwaze çend kesan ji wan veqetîne, ku bi tiliyên destan tene jimartin û piraniya wan heya pola pêncan a dibistana seretayî nexwendiyê û zanyarî û agahiyên xwe li ser kurd û Kurdistanê di çîrok û destanan de anîne zimên ku ji rastiye dîr in. Malxerabî di vir de ye ku wan derewên vehûnandî wekî belge li dijî kurdan bi kar tînin û helwesteke siyasî didinê û ew nûser jî dibine alîkarê dijminê neteweya xwe.

2) Her çend ku Dr. Kemal Mezher belgeyêke dîrokî ya wisa ranexistiye ber çavan ku bi yek carî rûpela Muşîrî Hemey Silêman pak û ronî bike, wa bizanim ku ew armanc jî tune bûye ku di wê gotara kurt de li ser wê mijarê raweste. Çimkî lihevanîna mijareke wisa pêwîstî bi lêkolîneke berfireh heye ku cihê wî jî ne “Rengîn” e. Ez bawer im ku

armanca wî ew bûye ku bal û dêhna nûser, mêjûzan û rewşenbîrên kurd bikişîne ser wê rastiye ku kurdan pêwîstî bi vî yekê heye ku bi awayekî zanistî bala xwe bidine dîroka neteweya xwe û ew hemû gotin û mijarên ku bi nerewa û neheqî ji dîroka wan hatine qutkirin û bidûrxistin, kom bikin û bixine nav çarçoweya dîroka xwe. Ew hemû kesayetiyên dîrbîn û navdarên kurd ku bi “dereweke fitnekarekî nehez” hatine reşkirin û ji civaka gelê kurd hatine bidûrxistin, dîsa cihê xwe di dîroka kurdan de bigirin. Her wiha pêwîstiya me bi wê heye

**Dr. Kemal Mezher  
nivîsên xwe dinirxîne û  
xwe bi tundî rexne dike  
ku çawa bêyî ku lê  
bikole û li ser wê yekê  
hûr bibe, pîrsa “xwe-  
firoşî”ya Muşîrî Hemey  
Silêmanî avêtiye holê û  
belav kiriye. Ew qise di  
nêzikî 30 berhemên wî  
de tê dîtin ku bi rûsî  
hatine çapandin.**

ku dev ji dayîna agahiyên çewt berdin. Her çend ku wekî neteweyekê pêwîstiya romanê bi dirustkirina qehreman û pehlewana hebe jî.

3) Nûser û mêjûnasên kurd ku hewleke bêeman didin xwe ku serdar û kesayetiyên dîrokî yên kurd wekî ferîşte û melek nîşan bidin û îdealîze bikin û wisa difikirin û tehmîn dikin

ku kurd tu carê naşikên û tşk naçin. Her tim ji bo tşkneçûna wan melek û pehlewana pê-wîstî bi dana qurbanekî heye, ku divê di vir de û li gorî senaryoyê kurdekî xwefiroş be ji bo tşkşikandina serdar û mîrên kurd. Wekî mînak wan kesên Îdrîsê Bedlîsî kiriye hincet û navê wî kirine Îblîsê Bedlîsî û ji bo tşkçûna mîrê Botan (Bedirxan Paşa) Yezdanşêr kir hincet û ji bo Mîrê Soran Melay Xeletî û ji bo Şêx Berzencî Muşîrî Hemey Silêman, ji bo Şêxê Pîran Qasimê Cebî û ji bo Seyîd Rizayê Dersîmê jî Rayber... û hwd. Ger mirov hinekî bi hûrbînî bifikire û bi awayekî zanistî bûyeran binirxîne divê bipirse: Çawa mîrnişînekî mezin û bizaveke cema-werî (tevgereke civakî) wisa bi hêsanî bi îxaneta yekî xwefiroş ji holê tê rakirin û tşk diçe? Gelo ew yek rûpûş û perdeya ser nixandî û lêkolînên me hilnade û şahîd û goyendeyê tiraliya nûserên me nîn e ku naxwazî bi dû rastiyan bikevî û xwe biwestî û bi wî awayî bûyer kom kirine û li gorî xwe nixandî, ango qet li bûyeran nekolane.

4) Xaleke din a wê kurtebasa Dr. Kemal Mezher helwesta xweparêz an xwepêst û agahîfiroşan derdikeve holê, lê divê neyê jibîrkirin ku Dr. Kemal Mezher Ehmed di sedsala raborî de mîjûzan û pisporê herî bi nav û bang û aferînerê berhemên kurdî bûye û yek ji lûtkeyên diyar û berbiçav ê

jiyana çandî û zanistî ya kurdan bûye. Her çend ku Şerexanê Bedlîsî û Mihemed Emîn Zekî pêşeng û siwarçakên dîroknivîsiya kurdî bin jî, lê Kemal Mezher ew mirovê ku dîrok û bi taybetî dîroka kurdî ji çîrok û efsaneyên kurdî yê bêsêrûber û tevlihev dîr xist û derxist pileyeke zanistî û ya girîng ku xwedî rêbazeke zanistî ne û di wan de rûdan ji nişka ve dernakevî holê û pêk nayên. Her wiha bi hezaran xwendekarên kurd qerdarên (deyndar) Kemal Mezher in ji bo ku ew hez û hewesa wan a ji bo dîrokê ji aliyê wî ve derketiye holê. Di demekê de ku nivîskarekî kurd çewtiyeke xwe dibîne û razî dibe rexneyeke biçûk jî li xwe bigire, ew ê heya êvarê li ser destê xwe bigerîne. Dr. Kemal Mezher nivîsên xwe dinirxîne û xwe bi tundî rexne dike ku çawa bêyî ku lê bikole û li ser wê yekê hûr bibe, pîrsa “xwefiroşî” ya Muşîrî Hemey Silêmanî avêtiye holê û belav kiriye. Ew qise di nêzîkî 30 berhemên wî de tê dîtî ku bi rûsî hatine çapandî. Mirovên zana û şareza bi vî awayî tevdişerî û dema ku di mesele û bûyereke de ketibîne nava çewtî û şaşîyan, ew qas xwedîwêrek û dilêr in ku qala wê yekê bikin û bibêjin ku ew dîtîna me çewt e yan ew xala di filan nivîs û mijarê de şaş e. Ev yek tenê ji şareza û rêza wan zaneyan kêr nake; belku hinekî din jî wî li cem xwendevanên wî rêzdarî û payebî-

lindîr dike. Hêvîdar im ku ew yek ji bo her kesî di her warî de bibe mînak. Rastî li ser kesê nehatiye tapûkirin û kes bi tenê ne xwedîye rastiye ye. Di wan raporên ku Dr. Kemal Mezher dîtîne de, îngilîzan qala Muşîrî Hemey Silêman kiriye lê ne ku wek hevê û hevalbendê xwe lê belku wekî kesekî kurdperwer

**Ev helwesteke rast û dirust e ku mirov tu carî ji rastiye netirse, her tim ji bo rastkirina şaşî û çewtiyên xwe hewl bide, tşkîkoşe ku her tim rast bibêje, binivîse, şaşiyên xwe qebûl bike û ji rexneyan re vekirî be. Renge hêştî zû bû ku doza lê borînê ji Muşîrî Hemey Silêman bike lê wisa diyar e ku gelek belgeyên zanistî di destê Dr. Kemal Mezher de hene ku wê helwestê nîşan dide.**

û welatparêz ku doza mafê kurdan dike, qala wî kiriye û navê wî bi vî rengî di raporên wan de derbas dibe. Her wiha Dr. Kemal Mezher wê rastiye dubare dike ku îngilîzan tu pê-wîstî bi alîkariya Muşîrî Hemey Silêmanî û kesekî din tune bû ku bikarin hêzeke sed kesî ya bêrêkûpêk û bêçek tşk bibin û Silêmaniyê dagir bikin, ji ber ku xwedî hêz bûn û wan bi tenê dikaribû wî karî bikin. Di dawiyê de Dr. Kemal Mezher ji Muşîrî Hemey Silêmanî û

serleşkerên Hemewendê û ji siwarên wî doza lêborînê dike û vê yekê girêdayî fermana wijdana dirokî dizane. Ev helwesteke rast û dirust e ku mirov tu carî ji rastiye netirse û her tim ji bo rastkirina şaşî û çewtiyên xwe hewl bide û têbikoşe ku her tim rast bibêje û binivîse û şaşiyên xwe qebûl bike û ji rexneyan re vekirî be. Renge hêşta zû bû ku doza lê borînê ji Muşîrî Hemey Silêman bike, lê wisa diyar e ku gelek belgeyên zanistî di destê Dr. Kemal Mezher de hene ku wê helwestê nîşan dide. Ew mafê wî bi xwe ye û bi xwe baştir dizane ku çawa tevbigerê. Ew dîtina zanistî ya Dr. Kemal Mezher ji bo nûser, mējûzan û rewşenbîrên kurd riyeye ronahiyê ye û dikare deriyekî ji wan re veke da ku bi awayekî zanistî li ser bûyerên dîrokî û cih û rola serdar, serkirde û kesayetiyên dîrokî bisekinin. Ez bi xwe çend sal in ku li ser babeteke (mijareke) bi navê “Têkşikanî bitekanî mējûman” dixebitim û min li ser daxwaza hevalên “Navenda Şanoya Koçer” di êvara 6 Reşemîya sala 1998'an de beşeke wê bi awayê semînerê li bajarê Kolnê ya Almanya pêşkêş kir û min beşeke din jî di zivistanê 1997'an de li bajarê Parisê di Konferansa Kurdo-lojiyê de pêşkêş kir û her wisa min çend beşên din jî di bernameya bi navê “Wanekanî mējûyî niwê û haw-

demî kurd” de di zanîngeha MED TV'yê de pêşkêş kir. De-

**Dîtina Sureya Bedirxan  
bû sedema vê yekê ku  
dîroknivîs serhildana  
salên 1854-1856'an ya bi  
serokatîya Yezdanşêr bi  
ser guhên xwe ve  
biavêjin û girîngiyeke  
wisa nedinê. Çimkî fer-  
manrewayê wê “cihê” şik**

ma ku ez ji çavkaniyên zanistî û jiyana siyasî û civakî ya wan kesayetiyên dîrokî digeriyam, ez rastî barekî giran hatim ku serê mirov gēj dike. Mirov nikare nirxandineke zanistî û pêbawer bike û bi giştî wê yekê ron bike. Ev bar jî ew e ku ew hîn di nav sînor û çarçoweyê mezîna de tê û diçe û pêwîstî bi belge û lêkolîneke zêdetir heye; wekî wê dimîne ku destekî reş hatibe ketibe hundir dîroka me û her çi kesayetîya dîrokî û bi kêr û jêhatî hebe jî holê rakiribe û ji dîroka me derxistibe û jê biribe û bi cihê wan (di cihê wan de) her çi mirovên xirab û bi kêrnehatî anîbin û wekî leheng, zana, serkirde û jêhatî nîşanî me dabûn û hin pût û lûtke ji wan re kiribine hêz. Ku li hember biçûktirîn lêkolîn (lêgerîn) û belgeyan ranawestî û wekî berfê dihelin û dibine av û têk diçin. Di vir de mējûzan rastî hin pirsan tînin û hin caran jî bersiveke amade tune ye. Gelo bi rastî destekî wisa hebûye? Ger hebûye kî bûye û bi fermana kê û bi çi armancê ew kar kiriye?

Ev û bi dehan pirsên din bêbersiv dimînin. Li ser wan mijaran ku hîna nehatine weşandin min belgeyên cidî û bawer-pêker, nirxandin û wêneyên nû yên kesayetiyên bi nav û deng ên kurd amade kirine û hêvîdar im ku dê di demeke kurt de bêne çapkirin û weşandin. Ez vê jî bibêjim ku ew xebat û ew dîtina bi dilê hin kesan nabe, ev jî ew in ku dîrokê bi awayekî din fêm dikin û têgihîştin û xwestek û daxwaziyên xwe ne bi awayekî rastî belku wekî dereweke rasteqîn dibînin. Di vir de zor bi kurtî ez mînakekê bidim ku her wekî Dr. Kemal Mezher jî gotiye, dereweke ve-hûnandî ya fitnekarekî nehez dikin rastiyeke dîrokî. Di vir de ez ê mînakekê bidim da ku ji we re ronaktir be. Kesekî ku kêm-tirîn agahî û şarezahî li ser dîroka kurdan hebe baş dizane Mîrnişîna Botan yek jî mîrnişînen kurd bûye û Şerefxanê Bedlîsî jî di “Şerefname” yê de qala damezirandin û mîrên navdar ên wê mîrnişîne dike, heya ku sala 1596'an de ku serdema fermanrewaya mîr Şerefxanê kurê Evdalxanê Cezîrî bû. Me li ser Mîrnişîniya Botanê di sedsalên 17 û 18'an de agahiyeke berfireh tune ye û Mihemed Emîn Zekî jî di “Tarîxeldul û Emaratil Kurdiye Fil Ehdil Îslamî” de, her ew gotin û agahiyên Şerefxanê Bidlîsî dubare kirine û Hejarê Mukriyanî jî di perawêza (1), rûpela 3314'an, çapa kurdî ya Şerefnameyê de, agahiyên pirtû-

ka bi nav û bang a Mihemed Emîn Zekî “Xulaseyekî Mêjû-yî Kurd û Kurdistan” di warê ji heyama piştî serdema Bedirxan heta niha tomar kiriye. Piraniya nivîskar û dîroknivîsên kurd li ser Mîrnişîna Botanê nivîsîne. Bi taybetî di sedsala 19'an de û çîroka têkçûna Bedirxan Paşa û têkçûna wê mîrnişîna ji aliyê wan ve tê vegotin û gişt bi yek dengî li ser xalekê li hev dikin ew jî xala xwefiroşekî xizmê Mîrê Botan Yezdansêrê birayê wî ye (hin nûser dibêjin ku kurmamê wî ye) ku dest dide dest dijmin û dibe sedema têkçûna Bedirxan û leşkerên wî û bi wî awayî mîrnişîna Botanê têk diçe. Tenê çavkaniya vê karesatê pirtûka Dr. Bleç Şêrko ye ku di sala 1930'yan de li Qahireyê bi zimanê erebî weşandiye. Her çend ku di sernivîsa (pêşgotina)çapa “Robi tekowalisqafetel kurdiye” de ku di sala 1986'an de li Beyrûtê (El-Qeziyet elkurdiye Mazî el kurd û hazirhom) hatiye weşandin, tê gotin ku ev pirtûk ji aliyê Mîr Celadet Bedirxan ve hatiye nivîsîn jî, xatûn Duriye Ewnî ya keça Mihemed Elî Ewnî ku di çaxa xwe di Şerefname û pirtûkên Mihemed Emîn Zekî wergerandine ser zimanê erebî, çend cara bi xwe ji min re got ku nûserê wê pirtûkê bavê wê ye. Ji ber ku Mihemed Elî Ewnî wergêrê fermî yê qesra paşayê Misirê bûye, ji wî hatiye xwestin ku dema ew li ser kurdan ango di warê kurdan de

tiştêkî dinivîse navê xwe yê rastî bi kar neaniye da ku têkiliyên wan û dewleta Tirkiye û dewletê din ên dagirkerên Kurdistanê pê nerihet nebin, ji ber vê yekê wî navê xwe (nasnavê xwe) kiriye Bleç Şêrko û bi wî navî ew pirtûk weşandiye. Hin nûserên din wekî kak Selman Osman (Konê Reş) ku jiyana mîr Celadet Bedirxan nivîsiye, Rewşen Bedirxan ji nêzîk we nas dike û gelek agahî jê wergirtine, dibêje: Ew pirtûk berhema Sureya Bedirxan e. Ya herî eşkere ku guman tê de tune ye ev e ku tu Bedirxaniyan ne Celadet, ne Sureya û ne jî Kamûran ew qas baş zimanê erebî nedizani ku bikaribin bi wî zimanê pirtûkan binivîsin. Ji bo wan kesên ku di wê gotinê de şik û gumana wan hene re ez wê serpehatiyê vedibêjim: Dema ku ez xerîk bûm doktoraya xwe bistînim, Xwedê jê razî Qenatê Kurdo li bajarê Moskowayê dawe li min kir (ji min xwest) ku digel Xwedê jê razî Kamûran Bedirxan têkiliyê deynim û ji wî re nameyekê binivîsim û her çi pirsên min ku hene di warê tevgera kurdên Bakur de (di navbera Şerê Yekem û Şerê Duyem de) arasteyî wî bikim da ku biber-sivîne.

Min jî di destpêka sala 1977'an de nameyeke dûr û dirêj bi zimanê erebî nivîsî û ji wî re şand û di nameyê de min gelek pirs ji wî pirsîbûn. Ez demeke dirêj li benda bersîva nameya xwe mam, di dawiyê de bersî-

va Kamûran Bedirxan di roja 5'ê meha Avrêla sala 1976'an de gihîşte ber destê min û ji min gazindeya vê yekê kiribû ku min ji wî re bi zimanê erebî name nivîsiye û gotibû ku ew bi erebî nizane û di dawiyê de hevalek ji navçeya Badînan dîtibû ku di nivîsîna bersîva nameyê de bi zimanê erebî alîkariya wî kiribû û ji wî re name nivîsîbû ku di nameyê de xwe wekî Kak Yusif dabû nasîn. Rastiya vê bûyerê ev e ku, ew pirtûk cara yekemîn ji aliyê Sureya Bedirxan ve bi frensî hatiye nivîsîn û dûre li zimanê îngilizî hatiye wergerandin û Mihemed Elî Ewnî jî ew wergerandiye ser zimanê erebî û wekî pêşgotin çend mijar lê zêde kirine. Wate, çavkaniya vê dîtinê û ramanê Sureya Bedirxan e. Kesên ku piştî wî hatine bêtî ku lê bikolin û lê bigerin jê girtine û wergerandine ser zimanê din. Yekemîn kes jî mêjûnûsê mezin ê kurd Mihemed Emîn Zekî bûye ku bi dû wî re hema bêjin tu nivîskarên kurd li ser Mîrnişîna Botanê tiştêkî nivîsiye. Ya herî balkêş ku mirov jê şaş û metel dimîne ev e ku, gelo çima piştî nêzîkî sedsalekê li paş wê bûyerê Sureya Bedirxan ev derew vehûnandiye. Ger mirov bûyerên wê çaxê hîn bibe, jixwe helwesta Sureya Bedirxan jî eşkere dibe. Ya ku eşkere ye ev e ku bavê Bedirxan Mîr Seyfedînê birayê xwe wekî cîgirê xwe kifş kiriye, lê Bedirxan bi planekê Mîr Seyfedîn ji ser tex-

tê mîrîtiyê anî xwarê. Li ser vê yekê wî û Yezdanşêrê kurê wî dest bi şer kir. Dema ku leşkerên Osmaniyan êrîşî ser mîrnişîna Botanê kir, Yezdanşêr dîl bû û ne serfermandarê destê çepê û ne jî serkêş û fermandarê destê rast bû û ne jî xwefiroş bû û ne jî ew bû sedema têkçûna Bedirxan û ji holê rabûna mîrnişîniya Botan. Ji bo ku bêhtir ew yek ronî bibe pêwîst e em vegerin çend salan pêşiya wan bûyeran. Dema ku leşkerên Osmaniyan êrîş dibin ser mîrnişîniya Soran û wê demê di ser Botan re derbas dibin, wê çaxê jî Bedirxan xwe li wir ranagire û penahê dibe Çiyayê Cûdî. Ger Yezdanşêr li benda derfetê bûya ku îxanetê bike ji wê demê baştir tunebûn. Ger biçûktirîn neyarî li hember Berdirxan nîşan dabe dema ku Bedirxan ji Çiyayê Cûdî vedigeriya Cizîrê, dê ew tawanbar bikira û bi tundî ceza bida wî. Wisa diyar e ku tu tiştê an tu meseleyê di navbera wan de rûnedaye, heke na Sureyayê dê gelek çîrokên din li ser wan vehûnandana. Di dawiyê de dema ku "hêzên mezin" biryar girt ku bi yek carî Mîrnişîniya Botan têk bibin û ji holê rakin, wê çaxê dema ku dewletê soz da Bedirxan ku dê jiyana wî bê parastin, wî xwe da dest dijmin angî teslîm bû û ew ji Kurdistanê hate bidûrxistin. Piştî ku Mîrnişîniya Botanê têk çû, leşkerên Osmaniyan Yezdanşêr wekî rêveberê kar û barê navçeyê hilbijart û tê gumankirin

ku wan di wî karê xwe de çend armanc hebûne: Yekem ji wê dijminatîya binemaleyî ya fermanrewayan kelkê wergirin ji bo ku careke din hêzên wan hev negirin û li dijî dewletê (dagirkeran) serî hilnedin, her wiha di wê katê de piştî xwe bidine fermandarê bihêz da ku bi alîkariya wî fermandarî rewşa navçeyê asayî bikin û bi dewletê ve girê bidin, her wekî ku di gelek navçeyên din ê Kurdistanê de pêk hat. Piraniya çavkaniyên mêjûyî li ser vê xalê li hev dikin ku hejmara alîgirên Bedirxan ji 15 hezar kesan derbas nedibû, lê alîgirên Yezdanşêr di wê serhildanê de digihîste 100 hezar kesî. Bêyî lêkolîn mirov nikare serhildana Bedirxan û Yezdanşêr bide ber hev û wan binirxîne. Di vir de ya ku pêwîst e ez qala wê bikim ew e ku neviyê Bedirxan Paşa û serkêşê binemala (malbata) Bedirxan Emîr Elî Bedirxan xwe her tim wekî mîr û xwedî desthilatdariya kurdan dide nasîn û tu carî amade nedibû ku ne di nav malbata Bedirxan de û ne jî di nav malbatên din ên kurdan de, serê xwe ji tu kesî re bitewîne. Yekemîn nakokîya siyasî di nav wan û malbata Nehriyan de di dema jidayîkbûna bizava siyasî û rêxistinên kurdan de, her ji ber vê helwesta Bedirxan pêk hat. Helbet ev nayê vê wateyê ku aliyê din di wî warî de qet xwe ji hin tiştan daye alî. Sureya Bedirxan ê ku ew meseleya xwefiroşîya Yezdanşêr

aniye rojevê ji ber ku di wî karî û helwesta xwe de çend armancên wî hebûn:

1) Ji bo ku maf bide Bedirxan Paşa ku bi destê zorê dest bi ser desthilatdariyê de girt û ji destê xwefiroş û welatfiroşan rizgar kir. Ev jî maf dide neviyên Bedirxan, ku Sureya bi xwe ji yek ji wan e ku bi tenê xwe wekî malbata fermanrewa û desthilatdarê Kurdistanê bibînin.

Xwedê jê razî Kamûran Bedirxan ku bi salan li Fransayê bû û doktora wergirtibû û bi xwe mamosteyê Zanîngeha Sorbonê bû, lê digel vê yekê her tim dixwest ku ji wî re bibêjin mîr angî wekî mîr bangî wî bikin. Celadet û Sureya jî her tim digel mirovên mezin û binav û deng radibûn û rûdiniştin.

2) Di wê demê de hemû maf ji destê malbata Mîr Seyfedîn tîn wergirtin. Çimkî aliyekî reş di dîroka wan de heye û hêjayî wê yekê nîn in ku bibîne fermanrewayê Kurdistanê. Berî çend mehan ez rastî xwediye meseleyê û neviyê Yezdanşêr hatim ku navê wî Kak Seyfedîn Bedirxan bû. Ew bi xwe ji kurdên Êrdûnê ye û niha li Amerîkayê dijî; xortekî xwende û agahdar bû û di warê dîroka neteweya xwe de şarezahiya wî hebû û amade bû ji bo bidestana mafê gelê xwe tîbikoşe. Di wan çend rojên ku em li cem hev bûn de, me bidûr û dirêj qala Bedirxan, Seyfedîn, Yezdanşêr û neviyên



wan kir û min her çî ji wî dipirsî, wî bersiveke amade hebû û pirsên min bi başî dibersivandin. Wî ji min re got ku ew heşt sal in ku birayekî wî li ser wê yekê dixebite û mijûl e ku wê meseleyê ronî û safî bike û her wiha got ku di demekê nêzîk de dê pirtûka xwe biweşîne, li gorî gotinên kak Seyfedîn ku ji min re qala wan xebatan kir, dibe ku xebat û lêkolîneke pir baş be.

3) Her wiha, wekî Dr. Kemal jî gotiye yên ku difikirin û dibêjin kurd tu carî têk naçin û ji bo ku Bedirxan pak bikin dibêjin ku xwefiroşek bû sedema têkçûna wî û bûyerê têkçûnê girêdayî Yezdanşêr dibînin û li gorî wan ew çîrokeke di cih de ye.

4) Her wiha ew dîtina Sureya Bedirxan bû sedema vê yekê ku dîroknivîs serhildana salên 1854-1856'an ya bi serokatiya Yezdanşêr bi serguhên xwe ve biavêjin û girîngiyeke wisa nedinê. Çimkî fermanrewayê wê "cihê" şik û gumanê ye. Di katekê de ku ez dikarim bi hêsanî bibêjim ew serhildan yek ji serhildan û raperînên herî mezin û girseyî yên gelê kurd e, ne tenê di sedsala 19'an de belku ji hin serhildanên sedsala 20'an jî mezintir bûye û hin girîngî û taybetiyên xwe hebûn wekî beşdarbûna gelê aşûrî, ermen û ereban di wê serhildanê de. Divê ez vê jî bibêjim ku piraniya stran û lawik û kilamên mêrxasî û egiştîyê li ser Yezdanşêr û serhidana wî hati-

ne gotin, lê li ser Bedirxan qet kilam nehatine gotin. Ev jî bi xwe sened û belgeyên girîng in û ew jî bîr û baweriya dîrokî ya gelan e. Ez bawer nakim ku gel ew qas bîrkor be ku rabe bi

**Li ser Yezdanşêr û serhildana wî kilam hatine gotin, lê li ser Bedirxan qet kilam nehatine gotin. Ev jî bi xwe sened û belgeyên girîng in û ew jî bîr û baweriya dîrokî ya gelan e. Ez bawer nakim ku gel ew qas bîrkor be ku rabe bi dehan kilaman li ser xwefiroşekî bibêje û navê wî bi salan heya vê serdemê biparêze.**

dehan kilaman li ser xwefiroşekî bibêje û navê wî bi salan heya vê serdemê biparêze.

Ez dikarim bibêjim ku gelek nakokî û valahiyên bi vî rengî di dîroka gelê me de hene ku ne bi gotar û beskirinê, ne bilezê û ne jî bi reşkirinê bi sedan rûpel û belge û ne jî bi rexneyên dîrokî tijî nabe. Heya ku em neçin nav dîroka xwe ango lêkolîna dîroka xwe nekin û kesayetiyên dîrokî bi belgeyên eşkere û dekumantên bawerpêker (rast) û bi awayekî zanistî nenirxînin, kelk wergirtin ji ezmûnê dîrokî wekî xewneke dûr ji rastiyê dimîne. Ev bi kurtî mînakekê ji wan di-

rewên vehûnandî ku fitnekarê nehez bi zora zordarekî hewl daye ku bike rastiyeke dîrokî lê kes nikare ji bo hemîşe û yek carî dîrokê bixelitîne û çewt bide fêmkirin. Dîroka rasteqîne ne gengaz e ku derawan bi xwe ve bigire û qebûl bike, çî zû yan dereng rastî derdikeve holê. Ez hêvîdar im ku dema li rol û serpêhatiyên kesayetiyên dîrokî dikolin yan dixwazin lê bikolin, ev neyê jibîrkirin berî her tiştî ew serdar û serkirde mirov bûne û wekî her mirovekî hez, hêvî, hest û nestên wan hebûne û xortên civaka kurdan bûne û ji asîmanan nehatine

**Tîpguhezî:  
ÎKRAM BALEKANÎ**

**Têbînî:** Ev nivîs ji rojnameya Peyamê hatiye wergirtin.

## MIHRÎCAN Û ROLA WAN

**Cemil Oğuz**

Di van salên dawîn de mihrîcan zêdetir ketin rojeva kurdên Bakur. Ev mihrîcan dikin ku kurd hem bi çanda xwe û çanda gelên din bihesin, hem jî qedexeyên li ser çalakîyên çand û hunerî hêdî hêdî bêne rakirin. Bi zêdebûna lidarketina mihrîcanan re me jî xwest em seriyekî li nav mihrîcanan bidin ku yekem car li ku derê li dar ketine, bi hin mînakên nîha rewş çî ye, di nav kurdan de mihrîcanên bi çî awayî hene û ji aliyê kî ve tene lidarxistin? Kerem bikin em bikevin nava rûpela mihrîcanan.

### Mihrîcan çî ne?

Mihrîcan, bi gotinên, "Lidarxistina çalakîyên hunerî ye ku dema lidarketinê, cihê ku lê lidardikeve, jîrbûn û hejmara beşdaran, ji aliyê taybetiyên wan ve berhemên ku di nava bernameyê de cih digirin, ji aliyê girîngî ve, rêzeçalakîyên konseran an pêşkêşkirineke hunerî" tê binavkirin. "Şahiya ku di beşeke hunerê de pêşkêşkirina listik an filman û piştî pêşkêşkirinê xelatdayîn an jî derecekirin" jî tê binavkirin û naveke wê ya din jî, "Şa-

hiya ku ji bo berhema herî navdar a herêmekê tê lidarxistin" e.

Her wiha di mihrîcanan de carinan berhemên herêmî tene pêşkêşkirin, nixandî, ew berhem bi gelê herêmê, bi gelên welat û gelên cihanê didin nasîn, carinan mihrîcan ji bo nasandina dîrok û erdnîgariya herêma ku lê lidardikeve tê pêkanîn. Dîsa mihrîcan dikin ku gel were cem hev, hev binase, çanda hev bi hev re par ve bike, tatkiliyeke civakî saz bike. Beşek din a mihrîcanan jî, aliyên wê yên pêşkêşkirina çand û huner, wêje û hwd. e. Li gorî van pênasan mihrîcan tene lidarxistin, çalakî tene pêşkêşkirin.

### Li cihanê yekem mihrîcan

Li cihanê mihrîcanên herî kevn di sedsala 18'an de li Îngilîstanê li dar ketine. Ev kevnepî di sedsala 19'an de li Norwichê (1824) û Leedsê (1874) berdewam kirine. Li Almaniyayê navê Mihrîcanên Beethoven û ê Bach ku di sala 1845'an de li Bonnê lidarketin gihîşt roja xwe ya îro.

Her wiha li cihanê mihrîcanên ku hêdî hêdî li dardiketin, kevnepîyên wan, piştî Şerê Cihanê yê Duyemîn bi îstikrar-tir bûn, bi taybetî li Ewropayê her ku çû mihrîcan zêde bûn. Mihrîcanên ku berê di heman demê de wekî bînalekê jî dihatin lidarxistin her ku çûn ji hev hatin veqetandin û beş bi beş hatin lidarxistin.

Di vî warî de, li cihanê di

nav mihrîcanên sinemayê de mirov dikare mihrîcana CANNES'ê (1948), Locarno (1946), Edinburgh (1946), Berlin (1951) û hwd. bihesibîne. Dîsa mihrîcana Venedîkê ev 59 sal in, yê Selanîkê 42 sal in li dar dikeve. Piştî van, mihrîcanên bi vî rengî zêde bûne.

Di beşa mihrîcanên şanoyê de jî, mihrîcana dramatik ya yekem li bajarê Orange ya Fransayê di sala 1869'an de li dar ketiye. J. Copeau kiriye ku ev mihrîcanên dramatik li dar bikevin. Chartres (1927), li bazilikaya Domremy (1938), li Hotel-Dieu de Beaume (1943) hatine lidarxistin.

**Li Tirkiyeyê yekem car li Qesra Beylerbeyî ku li Stenbolê ye mihrîcanek bi navê "Mihrîcanên Lîstîkên Balkanan" ji bo Konferansa Duyemîn a Balkanan di sala 1931'ê de hate lidar xistin. Yekemîn Mihrîcana Şanoyê, di gulana 1959'an de li Anfiya Aspendosa Antalyayê de ji aliyê Şanoyên Dewletê ve hate lidarxistin.**

### Mihrîcanên li Tirkiyeyê

Li Tirkiyeyê yekem car li Qesra Beylerbeyî ku li Stenbolê ye mihrîcanek bi navê "Mihrîcanên Lîstîkên Balkanan" ji bo Konferansa Duyemîn a Balkanan di sala 1931'ê de hate lidarxistin. Yekemîn

Mihrîcana Şanoyê, di gulana 1959'an de li Anfiya Aspen-dosa Antalyayê de ji aliyê Şanoyên Dewletê ve hate lidarxistin. Piştî wê roje heta niha mihrîcanên cur bi cur têne lidarxistin.

Niha li Tirkiyeyê yek ji mihrîcana kevnar û navdar Mihrîcana Porteqala Zêrîn a Antalyayê ye. Her wiha li Tirkiyeyê bajarê ku herî zêde lê mihrîcan têne lidarxistin jî Stenbol e. Li Stenbolê her sal mihrîcanên film, şano, muzîk, caz, mihrîcanên li ser mijaran ên wekî hawirdor, mihrîcanên kurtefilman, belgefilman, mihrîcanên ciwanan û hwd. têne lidarxistin. Li Stenbolê mihrîcana herî kevnar, Mihrîcana Navneteweyî ya Muzîkê ye ku ev 31 sal in li dar dikeve.

Mihrîcanên ji bo nasandina berhemana li bajar û welatan digel mihrîcanên li ser çand û hunerê, li hin bajaran mihrîcanên ji bo nasandina berhemên wî bajarî, dîroka wî bajarî jî mihrîcan têne lidarxistin. Dîsa mihrîcanên ji bo tûrîzmê jî ciheke taybet digirin di nav van mihrîcanan de. Mîrov hinekî mînak bide; li bajarên kurdan ên Bakur li Meletî Mihrîcana Mişmişan, li Qersê Mihrîcana Penîrê Qaşar, li Pulumura Dêrsimê û Erdexanê Mihrîcana Hinguvê, li Dîlokê Mihrîcana Fisteqan, li Golbaşîya Semsûrê Mihrîcana Tirî, li Kolikê (Kexta) jî Mihrîcana Komagene ya Kextayê ya Navneteweyî û hwd. çend mihrîcanên ku têne bîra mirov in.

Dîsa li Amedê Mihrîcana Zebeşan ku ji sala 1966'an ve têne lidarxistin yek ji kevntirîn mihrîcan e ku li bajarê kurdan têne lidarxistin. Di vê mihrîcanê de zebeş bi hev re dikevin pêşbaziyê, mezinahiya wan têne pîvan, yên herî mezin têne xeletkirin.

Mihrîcan dikin ku ew tişt bêne nasîn, li gelek deran jî ew cih bi wê mihrîcanê û bi wê berhemana têne nasîn. Mînaka herî ber bi çav Amed e, Amed bi zebeşê, zebeş bi Amedê êdî têne nasîn.

Ev mihrîcanên ku me mînak dan zêdetir ji aliyê şaredarî, wîlayet, ji aliyê sazîyên sîvîl ve têne lidarxistin. Hin ji wan jî bi organîzeyek bi hev re têne lidarxistin. Ev mihrîcan her çiqas li ser wan deran, herêman û tiştên wê derê bê lidarxistin jî bi zîmanê tirkî, ango ne bi zîmanê wê derê têne lidarxistin. Ev yek wekî kêmasiyeye xwe nîşan dide. Li vir pêdiviya mihrîcanên bi zîmanê kurdî, çanda kurdî jî xwe dide der.

### Mihrîcana Amedê

Ji bilî ev mihrîcanên ku me jor qala wan kir, di nava van salên dawîn de bi bidestxistina Şaredariyan ên ji aliyê HA-DEP'ê (niha bûne DEHAP'î) ve nêrîn û rewşa mihrîcanan jî guherî. Li ser vê yekê li Amedê, Şaredariya Mezin a Amedê 1'em Mihrîcana Çand û Hunerê ya Amedê di sala 2001'ê de 26'ê gulanê dest pê kir û 2'yê pûşepera 2001'ê de bi dawî kir. Mihrîcan her çiqas yekem bû û

li bajarên kurdan ên Bakur destpêka serdemek mihrîcanan a nû bû jî lê rexne hatin girtin ku çima bername ne bi kurdî ye. Mihrîcana ku di nav Rewşa Awarte (OHAL) de hate lidarxistin bû gava yekem ji bo lidarxistina çalakîyên çand û hunerî. Di mihrîcanê de film hatin nîşandayîn, konser hatin pêşkêşkirin, lîstikên şanoyên hatin lîstin, xebatên atolyeyan hatin kirin, panel hatin lidarxistin, şeva helbestan hate pêkanîn. Ji vî alî ve tertihebûna bernameyê kir ku mihrîcan bi ser bikeve û ji bo salên pêş riyeke nû veke.

Bi vê yekê demeke nû dest pê kiribû, mihrîcanên cihê cihê wê bihata lidarketin. Di mihrîcanên Duyem û Sêyem ên Amedê de naveroka mihrîcanan dewlementir bû û zîman û çande kurdî zêdetir têne de xwe nîşan da. Bi taybetî mihrîcana îsal ku 3'yemîn Mihrîcana Çand û Hunerê ya Amedê bû, bi stran, şano û panelên bi kurdî rewşek nû nîşan da, riya pêdiviya guherîna mihrîcanan û divêbûna mihrîcan jî li gorî çand û zîmanê wî gelî nîşanda.

Her wiha piştî Amedê, Êlihê hewl da mihrîcanê li dar bixe, Bazîdê mihrîcan lidarxist, Pira Hunerê ya Stenbol-Culemêrgê berga xwe fireh kir û Wan jî girt nava xwe.

### Mihrîcanên li parçeyên din

Li bajarên parçeyên din ên kurdan jî mihrîcan têne lidarxistin. Ji wan li bajarên Başûrê



Rojavayê ji ber nêzîktêdayîna dewleta Sûrî kurd ne bi awayê fermî lê bi awayekî veşarî çend heb mihrcanan li dar dixin. Kurd û rewşenbîr ev 11 sal in ku di 22'yê meha kewçêrê de ji bo bîranîna helebestvanê navdar Cegerxwîn, Mihrcana

Helbestê li dar dixin. Ji sala 1990'î û vir ve jî ji bo bîranîna hunermend Mihemed Şêxo her sal di 9'ê adarê de diçin ser tirba Mihemed Şêxo û êvarê jî ji bo bîranîna Şêxo şevbûhêrkê li dar dixin. Her wiha wan îsal yekem car di 25'ê pûşperê de

Mihrcana Toreyê Zarokan li gundê Tenûriye ku girêdayî Qamişloyê ye li dar xist.

Li Başûr carinan mihrcanan li dar dikevin. Heta niha li Başûr Mihrcana Cizîrî li Dihokê (Ji bo bîranîna Mela Ehmedê Cizîrî), Mihrcana Mukriyanî li Dihokê (Ji bo bîranîna Hejar Mukriyanî) û Mihrcana Bedlîsî (Ji bo bîranîna Şedefxanê Bedlîsî) li Hewlêrê hatine lidarxistin.

Li Rojhilat û welatên din ên ku kurd lê dijîn jî kurd hin mihrcanên cur bi cur li dar dixin.

Îro kurd hînê mihrcanên çand û hunerî bûn, di mihrcanan de hînê sazkirina bi kurdî jî bûn. Wisa diyar e ku wê ev rewş xurtir bibe û wê mihrcan jî bigihên armanca xwe. Di vir de xaleke din ku em lê zêde bikin, divê kurd li mihrcanên aborî yên ku li ser navê herêm û berhemên wan têne lidarxistin jî xwedî derkevin.

Peyva mihrcanê ji ferhengên tirkî, dîroka mihrcanan jî Ansîklopediya Meydan Laro-ussu, navên mihrcanên bajarên kurdan ên Bakur jî ji xebatên wan bajarên hatine girtin.

## ZANA Û PÊXEMBERÊÊ KURD ZERDEŞT (2)

### Kerem SOYLU

Dema Zerdeşt biryara çûyîna xwe ya nav mirovan da, derket derê şikefta xwe li mar û qertelê xwe mêze kir. Bi zimanê hal bi wan re axivî û got: "Ez gelek ji we hez dikim. Lê divê ez êdî herim nav mirovan." Di deh salên xwe yên serê Çiyayê Sabalanê, di şikefta xwe de tamamî zanistên xwe di ber çavên xwe re biribû û anîbû. Perwerdehiya ku ji heft saliya xwe heya sî saliya xwe ku tê de gelek bi serkeftibû, bi fkir û ramanên xwe yên herî bilind nixandibû. Ew ders û perwerdehiyên ku li cam gelek mamostiyên jîrek û zanyar di zanîngehên herî bilind de xwendibû tê de gelek mahir û jîrek bû. Zanyarî û tenhabûna xwe ya şikeftê da ber hev, li serê şewirî û biryara xwe da ku here nav mirovan. Zerdeşt bi tena serê xwe ji serê çiyê daket xwar. Dema ku ew gihîşt daristanê di wê demê de dît ku mirovekî kal li cem wî sekiniye. Kalê got: "Ev rêwiyê hanê li min ne nas nayê. Berî çend salan bi rêbîwarkî di vir re derbas bibû. Erê erê ew Zerdeşt e. Lê wî xwe guhartiye." Kalo got: "Zerdeşt te di wê

demê de xweliya xwe anî serê çiyê. Gelo tu dikî niha agirê xwe bibî deşt û newalan? Ma tu ji cezayê ku mirov pê teneşewitandin û êşandin natirsî? Erê Zerdeşt nas dikim. Çavên wî pak û zelal in. Tu xerabî di devê wî de cih nagire. Zerdeşt zarok bû, hatiye guhartin. Zerdeşt niha mirovekî sere û hişyar e." Kalê pîroz jê re got: "Ma tu li bal mirovên razayî çî digeri, tu ji çûyîna bal wan çî hêvî dikî? Di tenêbûnê de tu wek di nav deryayê de bûyî. Te

**Zerdeşt bi tena serê xwe ji serê çiyê daket xwar. Dema ku ew gihîşt daristanê di wê demê de dît ku mirovekî kal li cem wî sekiniye. Kalê got: "Ev rêwiyê hanê li min ne nas nayê. Berî çend salan bi rêbîwarkî di vir re derbas bibû. Erê erê ew Zerdeşt e. Lê wî xwe guhartiye."**

li deryayê ferman dikir. Deryayê tu li ser pêlên xwe hiltanî dibir û dianî. Weyl li te tu dikî niha bikevî erdê. Ax ji te re, tu dikî ji nû ve barê hinekên din hilgirî û pê re kaş bibî?"

Zerdeşt birsîv da û got: "Ez

ji mirovan pir hez dikim." Mirovê pîr û pîroz got: "Ma çira min xwe kişandiye nav tenhatiya rêl û daristanan? Ji sedema hezkirina min a ji wan re nebû? Niha ez ji Xweda hez dikim ji mirovan hez nakim. Mirov ne pêkhatîne. Hinek ma ku wan ez bikuştama." Zerdeşt lê vegerand û got: "Mebesta min jî hezkirinê ew e ku ez ji mirovan re diyariyekê (xelatekê) bibim." Mirovê pîr û pîroz got: "Tu tiştê nede wan. A qenc ew e tu tiştêkî ji wan re bibe û pê barê wan siviktir bibe. Barê wanê mayîn jî bi wan re hilgire. Ewê pê kêfxweş bibin. Ew dem tu jî pê kêfxweş dibî. Heke tu bi pêwîstiya dayînekê ji wan re îsrar diki, wê demê sedeqeyekê bide wan bes e." Zerdeşt got: "Na, na ez bi qendî ku sedeqe bidim belengaz nîn im." Mirovê kal û pîroz bi Zerdeşt kenî û got: "Wê demê tu şîret û nesîhetên xwe bi wan bide pejirandin. Mirov li hember biyaniyan (ew ên di tenhatiyê de man) bêewle ne. Hatina me ya ji bo diyariyê bawer nakin. Pêjna piyê me li wan ne xweş tê. Bi dema ku di cih û nivînên xwe de ne, wek meşa mirovekî ku seh bikin dibêjin gelo ev diz dihere ku derê. Dibêjin û pê ra qîr dikin. Zerdeşt, neçe nav mirovan. li daristanê bimîne; here nav tebayan (cinawir) hêj çêtir e. çira naxwazî mîna min bibî. Di nav hirçan de hirçek bî û di nava teyranan de teyrek bî." Zerdeşt

jê pirsî: "Ma tu di nav rêl û daristanan de çi dikî?" Mirovê kal û pîroz got: "Ez stranan çêdikim û dibêjim. Wê demê ez dikenim û digirîm. Bi kalekal, nalanal pesnê Xwedayê xwe didim. Ka diyariya te ji me re çi ye? Niha ji me re wê bibêje." Dema ku Zerdeşt ev peyv ji mirovê kal û pîroz seh kirin lê silav kir û got: "Ka çiyê min ê hebe ku ez bidim? Min bi lez berdîn ku ez tiştêkî ji we nestînim." Bi vî terzî mirovê pîr ê pîroz û mêrê sere (Zerdeşt) bi

**Zerdeşt dema ku çû nav mirovan, bi wan re axaftin kir. Dû re jiyana mirovên tenhatiyê tîne ber çavên xwe û difikire. Dibêje: "Ez axivîm, lê ev dînîti bû. Min bi civakê re axaftin kir, lê her wekî ez bi tu kesî re neaxivîm. Wê êvarê cenaze û canbazên sêrbend bi min re bûn heval, ez jî her wekî cenazeyekî bûm. Dema ku sibeheke bi xêr hat pê re ez gihîştîme rastiyan**

ken û kêf xweşiyên ku du heb ciwan bi hev re dikin û pê şa dibin, ji hev û din qetiyân. Zerdeşt dema ku çû nav mirovan, bi wan re axaftin kir. Dû re jiyana mirovên tenhatiyê tîne ber çavên xwe û difikire. Dibêje: "Ez axivîm, lê ev dînîti bû. Min bi civakê re axaftin kir, lê her wekî ez bi tu kesî re

neaxivîm. Wê êvarê cenaze û canbazên sêrbend bi min re bûn heval, ez jî her wekî cenazeyekî bûm. Dema ku sibeheke bi xêr hat pê re ez gihîştîme rastiyan. Di marezê (panayir) de min rewşa mirovan, terzê axaftina bi wan re gelek di ber çavên xwe re bir û anî. Min jê gelek feraset hilanî." Bi vî awayî Zerdeşt ket nav mirovan, bi gel re axivî, têkildar bû. Her wisa xwe nêzî kom û civakan kir, bi wan re bi rojan, bi mehan hevaltî kir û axivî. Berî destpêka sefha pêxemberiya Zerdeşt, divê hinek ji axaftinên wî yên mucîze em bînin zîmên: Xwendin û nivîsandin "Nivîsa ku bi xwînê hatiye nivîsandin ez pîrî ji wê hez dikim. Hûnê bibînin xwîn ruh bi xwe ye. Fêmkirina xwîna biyaniyan ne hêsan e. Ez ji xwendevanên belengaz nefret dikim, hez nakim. Ruh demekê Xweda bû paşê bû însan, niha jî ber bi sewaliyê (heywanetiyê) ve diçe. Cesareta ku ji zor û zehmetiyan bitirse ew ji xwe re dêwan çêdike. Cesaret, ken û kêfxweşiyê dixwaze. Dema hûn bilindahiyê daxwaz bikin, divê hûn li jêr mêze bikin, lê ji sedem ez bilind im li jor mêze dikim. Di hezkirinê de tim hinek dînîti heye. Di dînîtiyê de her tim gelek aqil heye. Ez hîmî bîrvêçûyîne bûm, ji wê demê û bi vir de ez xwe rind bi rêve dibim." Zerdeşt wiha digot:

**Şer û gelên ku şer dikin**

- Heke aqilê we pîrozwer

nebe jî lê hûn şervan in. Şervan; hogir û pêşketiyê aqilmendan in.

- Ez tim daxwaz dikim, çavên wê yên tûj, tûj li dijminê we be.

- Ji sedem ramanên xwe li dijminan bigerin, bi wan re şir bikin.

- Heke fikr û ramanên we têk herin jî, divê daxuyaniyên we bi ser bikevin.

- Ji aştiyê jî bo pêwendiya şerekî nû hez bikin. Ji aştiyê kin jî, ji aştiyê dirêj pirtir hez bikin.

- Ez ji we re ne kar, lê şer, ne aştiyê lê serketinê şirit dikim. Divê karê we şer be, aştiya we serketin be.

- Hûn ji min re dibêjn tu şer pîroz dikî. Ez ji we re dibêjm. Pîroziya temamî tiştan, girêdahiyê bi şerekî pak ve ye.

- Heta niha dilovaniya we na, lê cesaretên we gelek felaketzedê ji tengasiyan xelas kirine.

- Di jiyana we de divê hezkirina we girêdayî bi hêviya we ya herî bilind ve be. Hêviya we ya herî bilind divê fikra jiyana herî bilind be. Zerdeşt weha dibêje:

Dugel, tiştê herî sar ev nav e. Dugel (dewlet), ev sarîti pir viran dike. Wiha dibêje: Ez dugel im û ez gel im. Ev vir e. Afirandêran gel afirandin, bawerî û evîn li ser gerandin bi vî terzî, ji jiyana gelan re xizmet kirin. Pir tiştên ku dugel jê re hatiye gotin ew wêranker in; wan li ser gelan ne pakiyê, şûr û zordestiya xwe daliqandine. Ez nîşanê we didim. Temamî gelan bi zimanê xwe ji qencî û xerabiyên diaxivin. Lê cîranên wan jê fêm nakin.

- Temamî gelan zimanê xwe li gor tore û mafên xwe afirandine.

- Lê dugel bi qencî, bi xerabî, bi temamî zimanan diaxi-ve û viran dike.

- Çi tiştên ku dugel, ji we re dibêje tev vir e. Herçî tiştên di bin darê wê de ne, tev malê diziyê ne.

- Tiştên wê tevde sexte ne. Bi wan diranên diziyê û hovane gez dike. Rûviyê (rodîk) wê jî sexte ne.

- Binêrin, dugel van kesên bêçare çawa di xwe de dibîne, dev dike qirika wan dicû û dikayê. Wiha dibêje: Li ser rûyê erdê ji min mezin-tir tu tişt nîn e. Tiliya Xweda ya ku rêzname çêdike ez im. Ev wehşiya wiha bang dike. Lê yên ku li berê çok vedane, bi tenê ne guhdirêj û şevkorî ne." Zerdeşt dibêje: "Ax, ax gelî ruhên mezin degên van virên reş tenê we jî. Belê ewê we ji bigire

gelî serkeftiyên Xwedayê ewilîn. Hûn gelekî di şer de westiyan lê westa we bi kêrî Xwedayê nû (dugel) tê. Xwedayê nû (dugel) dil heye ku kesên namîdar û binamûs li hawirdorî xwe bicivîne. Ew cinawerê cemîdî, di ronahiya wijdanê qencyê de hez dike xwe bide tavê. Xwedayê nû ku hûn lava bikinê dixwaze her tiştî bide we. Bi vî tehrî ronahiya mezinatiya we ji rê derdixe û bîniya çavên we ji we dikire." Zerdeşt wiha digot:

"Ez ji daristanê hez dikim.

Jiyan di bajaran de ne pak e. Di wan deran de pir kesên nefstenik û ne pak hene. Ketinadest qatilekî, qey ji çûyîna xewna



jineke nefsnepak ne çêtir e? He-la, li van mêran mêze bikin. Di çavên wan de tê xwendî ku, di dinê de tu tiştêkî ji tevrazana jinan xweştir nîn e. Tu tiştên dî nizani, bingeha ruhê wan di pîsiyê de noq bûye. Xwezî ew heywanên bi rêk û pêk bûna. Lê ji boy heywanbûnê, divê ruhê mirov paqij û bêşûc be. Ev tim xwe mezin dibînin. Lê kirinên wan di her warê şehwetê de wek a kûçikekî beş dibe, dixuye. Ev sarîtiya ruh û wehşetê tim li pey wan e, wan digerrîne. Şhweta kûçikîyê; de-

ma ku piçek goşt ji wan bê qûtkirin, bi hostatî poça xwe dihejînin, goşt daxwaz dikin. Çavên we gelek ne pak e. Li zehmetkêşan pir bi xezeb dinêre. Şhweta we hin qîyafetê xwe bi navê merhemetê neguhartiye. Ezê ji we re vê mînaka hanê bidim.

- Gelekan ji bo raqetandina şeytên hêz dane xwe. Lê bi xwe ketine nav zibil. Temîzayî li kê zor bê, divê mirov jê re temîzayê tewsiye neke."

Hogirî

- Ji bo derxistina hogirekî (dost) divê mirov bikaribe şer bike.

- Ji bo mirov bikaribe şer bike, divê mirov bikaribe bibe dijmin.

- Divê dijminatîya dostê xwe bipîvî. Berî wî di şer de baz bidî herî.

- Di dostê xwe de divê dijminê xwe yê herî baş bibînî.

- Bi dostê xwe re dema tu şer bikî divê, bi dilê xwe jê re nêzik bî.

- Tu dil î, wê demê tu nikarî bibî dost.

- Tu zorbe yî, wê demê kes dostê te tune ye...

#### Çavkanî:

1. El Mîlel Wenîhel Şehris-tanî
2. Ibnî Xeldûn
3. Kovara Hewarê, C. Alî Bedirxan
4. Ferhengî Xal, 1. 2. 3, Sal 1960

## EBÛ MUSLIMÊ XORASANÎ

### M. Reşîd IRGAT

Emîr Abdurrehman Bîn Muslim, bi Ebû Muslimê Xorasanî navdar e. Yek ji xanedanê Xorasanê kevnar e û Kurd e. Ji malbateke xuyayî, mêrxas, hezkirî û birûmet e. Ebû Muslim bi zanîn, wêrekî, lehengî û ferasata xwe nav û dengê bilind vedabû. Ew, di sala 700'ê koçî de hatibû dinê. Hinek dîroknas doza Erebbûna wî û hinek jî ya Farisbûna wî dikin. Ev ne tiştê sosret e. Lewre jî gelên serdest û dagirker her tim tiştên pak û çak talan dikin û digihînin xwe. Jar û bindest jî, ji hemî hebûn, hêjan û mîrateyên xwe yên giranbuhaya qut û destbirî dimînin. Sed mixabin ev rasteqînê êşeke mejûyî û janneke dîrokî ye. Bêhejmar oldar, fermandar, nivîskar, ronakbîr û zanyar ji nav Kurdan rabûne, lê ji ber ku bindest bûne, bêdeng, bênav û winda mane an jî bi navên biyaniyan hatine danasandin û bûne malê biyan û dagirkeran. Der barê Ebû Muslim da çî qas jî hinek dîroknasê alîgir û mebestwar bi zanîn û bi mebesteke derveyê rastiyê nivîsîbin, lê dîsa jî li gor dîroknasê rastgo Îbnê Xelkan, Ebû Muslim Kurd e. Çavkanî ji bo Îbnê Xelkan helbesta Îbnê Dilame ye. Îbnê Dilame, ev helbest li dijî Ebû Muslim honandiye, wiha dibêje:

Ebû (Mucrîm) di dewleta Mensor de xedîr û bêmafî nîn e belkê bêmafî û xedîr di bav û kalên te yên Kurd de heye...

Helbestvanê Ereb û dijar û mixrikê Ebû Muslim, bi devê xwe Kurdbûna Ebû Muslim û bav û kalên wî bi lêv dike û dipejirîne. Dilame di cihê navê Muslim de mucrîm' navê gunehkar, tawanbar, dixebitîne. Ev gotina Îbnê Dilame, delîlekî mezin e di dest Îbnê Xelkan de. Dîsa delîlekî duyemîn jî nivîsara dîroknas Reşîdê Yasmî ye, ku di pirtûka xwe ya Tarîxê Kurd de ku ji pirtûka tarîxê Şebistanê hildaye, dibêje ku xelîfetiya Ebul bas Esseffah di bin siya Ebû Muslimê Kurd û hêzên wî de pêk hatiye. Ev jî nêrînek xurt û hêja ye ji bo doza Kurdbûna Ebû Muslimê Xorasanî.

Ebû Muslimê Xorasanî di ceng û têkoşîna di navbera Emewî û Ebasiyan de, roleke mezin lîstîye. Bi awakî aktîf cih li bal (rex) Ebasiyan girtiye û şerekî dijwar bi Emewiyan re meşandiye. Sedemê bingehîn ji bo serkeftina dugela (dewleta) Ebasiyan û têkçûna dewleta Emewiyan û pelişandina wan jî, bi serê xwe Ebû Muslimê Xorasanî ye. Wî dikarî ku di demeke kin de girseyeke gur û germ û hejmareke zehf û bilind ji alîkarên der û dorên xwe bicivîne, leşkerên xurt bide hev û hêzeke zext biafirîne. Her çend li ber çavan ew tevger ji bo Ebasiyan jî dixuya, lê di rasteqîniya xwe de ew kiryar di dilê Ebû Muslim de ji bo serxbûna dewleta Îranê bû. Bi bonaya (munasebeta) cenga di navbera Emewî û Ebasiyan de,

Ebû Muslim digel hevalbendên xwe kincên reş li xwe kiribûn, tev reş wergirtibûn, alên reş neqandibûn û bilind kiribûn. Ebû Muslim digel hevalên xwe bi reş berkirî û bi cilreşîkî hatibûn naskirin û navkîrin. Kinc û cilên reng reş taybetiya dewleta Ebasiyan bû di wê demê de. Kar û barên Ebû Muslim di têkoşîna Emewî û Ebasiyan de bi piştevaniya Ebasiyan ji bo Ebû Muslim di demeke kin de bi pêş ket û pêşkeftinên hêja bi dest wî ve hatin. Heya ku xelîfeyê herî dawî yê Emewiyan (Merwanê Hêmar) ji hêla hêzên Ebû Muslim ve têk çû û şikest. Bi vî awayî dawî li xelîfetiya fermandariya Emewiyan hat. Di sala 132'yê koçî de Seffahê Ebbasî li textê xelîfetiya rûnişt û êdî ji wê rojê paş de Ebasiyan xelîfetiya bi xêra Ebû Muslimê Xorasanî yê Kurd bi dest xistin. Xebat û serkeftinên Ebû Muslim tirs û xofê xist dilê Ebasiyan û jê kîn girtin û çavnebarî jê kirin. Heya ku Ebo Ceferê Mensor xelîfeyê duyemîn ê Ebasiyan di sala 136 (137 an jî 140'i) koçî de Ebû Muslimê fedakar ê Kurd da kuştin. Ev çarenûseke reş e ji bo gelê Kurd. Rûpelê dîrokê bi bêbextiyên bi vî rengî bi Kurdan re tijî ne. Ev serpêhatiyên kevnare û mejûyî ne. Gelê Kurd her tim ji biyaniyan re kar û xebat kirine û di encam de xesar jê dîtine. Ev jî ji dilzêlaliya Kurdan tê. Lê hêvîdar im ku êdî Kurd ji van sosretan sey (ders) bigirin. Xebata ji bo xelkê an bêencam e an jî xesar û malmîratî ye. A qenc ji bo Kurdan, xebata ji bo gel û welatê wan e.



# QANATÊ KURDO: ZIMANZAN, KURDOLOG Û NÎŞTIMANPERWEREKÎ MEZIN BÛ....

## Rohat

Zimanzan, kurdolog, zana û niştiman perwerê mezin Qanadê Kurdo di 76 saliya xwe de li bajarê Lenîngradê ji nav me bar kir çû dilovaniya xwe. Wî di nav vê jiyîna dûr û dirêj de, bi taybetî ji bo pêşdebirina nivîsandina pirtûkên gramatikî ji bo zarokan, amadekirina kadroyên kurdzan û wek alîkariya pêşketina karên çand û huner li derveyî welêt, bi sedan afirandinên berketî pêşkeşî gelê kurd kir. Di vî warî de Qanadê Kurdo ji sedî zêdetir pirtûk, bend û materyalên mayîn amade kirin, wek defîneyekê ji me re hiştin. Qanatê Kurdo, di sala 1909 an de li Nehiya Susizê (niha di nav erdê Kurdistanê Tirkîyê de) ji diya xwe bûye. Qanat, di dawîya Şerê Cihanê yê Yekemîn de bi tevî malbat û pismamên xwe, di sala 1918 an de bar dîke diçe Ermenistanê û di nav jiyaneke dijwar, çetîn û belengaz de rojên xwe derbas dîke.

Di sala 1928 an de Qanatê Kurdo û çend kesên din, ji bo xwendina bilind diçine bajarê Lenîngradê û dikevîne Fakolta Palan, li wir dixwînin. Qanatê Kurdo di nav salên xwendina xwe ya bilind de, dibe xwen-

dekarekî zîrek, jêhatî, çavekirî û serfiraz. Ev yek ji ber çavên mamosteyên wî nareve. Mamosteyên wî kesine binav û deng bûn, şareza, rojhilatzan û zimanzanên jêhatî bûn. Şansê Qanat di vî warî de gelek mezin bû, wek N. Y. Marr, I. A. Orbellî û A. A. Freyman. Qanat, di sala 1938 an de xwendina xwe diqedîne. Mamoste-

**Qanatê Kurdo, di sala 1909 an de li Nehiya Susizê (niha di nav erdê Kurdistanê Tirkîyê de) ji diya xwe bûye. Qanat, di dawîya Şerê Cihanê yê Yekemîn de bi tevî malbat û pismamên xwe, di sala 1918 an de bar dîke diçe Ermenistanê û di nav jiyaneke dijwar, çetîn û belengaz de rojên xwe derbas dîke.**

yên wî biryar digirin ku ew di fakulteyê de bimîne û karên xwe yê zanistî bajo û bibe kurdzan. Ew bi taybetî li ser zimane kurdî serê xwe diêşîne. Di vê tangê de karê xwe dajo. Qanat paşê bi navê "Sazmaniya Çêkirina Fêlên Bargiren Di Zimane Kurdi De" xebatekê amade dîke. Di sala 1959 an de cara pêşîn li Lenîngradê pêşengiya rojhilatzanê mezin I.

A. Orbellî beşa kurdzaniyê tê vekirin û Orbellî dibe serokê vê sazgehê. Çawa tê zanîn vekirina vê beşê wê di paşwextiyê (duwaroj) de roleke mezin bilîze. Di sala 1961 an de I. A. Orbellî diçe ser dilovaniya xwe û vê carê şagirtê wî Qanatê Kurdo şûna mamosteyê xwe tijî dîke, ew dibe serokê vê beşa kurdzaniyê. Heta roja mirina xwe jî Qanat li ser vî karî bû. Qanat nêzîkî 24 salan ev kar meşand, kar û xebatine hêja pêk anîn.

Qanatê Kurdo, di sala 1960 an de li Sovyetê tevî Kongreya Rohilatnasên Cihanê dibe û raporekê dide. Piştî sala 1970 jî biryar hatin girtin ku Qanatê Kurdo bibe mamosteyê Akademiya Kurd li Iraqê. Wî di navbera van 15 salan de, heta roja mirina xwe jî alîkariya pêşketina çanda kurdî li Iraqê kiriye û li Iraqê gelekî baş hatiyê naskirin. Qanat, di nav ronakbîr û karkerên Kurdistanê Tirkîyê de jî baş hatiyê naskirin. Wî her tim hewl daye ku pêwendî û dostaniya xwe li gel rêxistinên kurd li derveyî welêt, yê sosyalîst, welatparêz xurt bike. Qanatê Kurdo her tim piştgiriya xwe li gel van rêxistinên nîşan daye û bi wan re kar kiriye, di nav rûpelên weşanên van rêxistinên de gelek nivîsarên wî hatine weşandin. Pirtûkên wî ji aliyê weşanên ROJA Nû û Weşanên KOMKARÊ ve hatine neşîrkirin û belavkirin û gihîştine destê bi hezaran ronakbîr û karkerên kurd ên li derveyî welêt. Qanadê Kurdo her wisa bûye hîmdarekî Enstîtuya Kurdî ya Parîsê. Bi vî tehrî navê Qanatê

Kurdo ji welatê Sovyetê, ji sînorên Sovyetê hingevtiye, xwe gîhandiye hemû warên cîhanê.

Mirov dikare kar û barên Qanat, şexsiyeta wî, daxwaz û planên wî, naveroka afirandinên wî, di nav rûpelên pirtûkekê de analîz bike, binivîse û pêşkêşî xwendevanan bike. Mirov nikare vî lawê kurd di nav du sê rûpelên vê kovarê de

**Qanadê Kurdo, di sala 1960 an de li Sovyetê tevî Kongreya Rohilatnasên Cîhanê dibe û raporekê dide. Piştî sala 1970 an biryar hatin girtin ku Qanatê Kurdo bibe mamosteyê Akademiya Kurd li Iraqê**

bide nasîn, ev yek gelek dijwar e. Zimanzan Qanatê Kurdo çawa tê zanîn, bingeha karên xwe bi taybetî li ser pêşketina zimanê kurdî daniye. Piraniya kar û xebatên Qanat li ser vê mijarê ne. Di warê nasîn, analîzkirin û nivîsandina zimanê kurdî de, bi çavekî sistematîk ji hev derxistina rêpîvanên zimên bi destê Qanatê Kurdo, bi firehî hatine zelalkirin û hatine nivîsandin. Mirov dikare van karan jî li ser xalên jêrîn diyar bike.

a) Danasîna Gramera Zimanê Kurdî, ji bo kesên zana, pisporek û zimanzanan, ji aliyê din ve ji bo zarokan. Di vî warî de gelek pirtûk û lêkolînên heja amade kirine.

b) Di warê amadekirina ferhengên kurdî de, Qanatê Kurdo bi jêhatî kar kiriye. Wî hew-

cedariya ferhengên kurdî û zimanekî mayîn (bi du zimanan) pêwîst dîtiye. Qanat ev ferheng bi çavekî zanîstî amade kirine. Li ser rûpelên ferhengan, wî karakterên navan wek maskûlîn an jî femînîn nîşan kiriye, di ferhengan de hebûna her peyvekê nîşan kiriye wek nav, cînavk, fêl. Di ferhengên xwe de Qanat ji bo zelalbûn û baş têgîştina hin peyvan, di bin van peyvan de, ev peyv di nav hevokan (cumle) de bi kar anîne.


Qanatê Kurdo, di warê amadekirina ferhengên Kurdî de afrandinên baş ji me re hîştine. (Ferhenga Kurdî-Rusî. 1960, ferhenga Kurdî-Rusî, 1983-Soranî)

c) Qanatê Kurdo ji bo vekolîna bingehên zaravayên Kurdî (dîyalekt) wek Kurmancî, Soranî û Zazakî gelek afrandinên heja pêk anîne. Cudatî û nêzîktêdayîna van zaravayan çî ne, cihê wan di zimanê Kurdî de baş nîşan daye. Ev yek jî beşeke xebata Qanatê

Kurdo ya mezin e. Pirtûka wî ya bi navê "Angorî Materyalên Kurmancî û Soranî Gramatîka Zimanê Kurdî" (1978) nîşana vê yekê ye. Qanat di vê pirtûka xwe de, her du zaravayên bingehîn rûbarîhev dike. Ev pirtûk dê di demeke nêzîk de di nav Weşanên Roja Nû

de çap bibe.

Qanatê Kurdo kurdzanekî mezin bû. Ji ber ku Qanatê Kurdo ne tenê li ser zimanê Kurdî xebitiye, ew wisa jî gelek salan li ser çand, etnografiya, zargotin, edebiyat û gelek gelşên kurdzaniyê yên mayîn mijûl bûye. Dîroka kurdzaniyê (kurdologî) li Yekîtiya Sovyetê û li derveyî welêt baş vekolandiye û gelek tiştên heja li ser pirsra kurdzaniyê nivîsîne. Ew wisa jî mamoste û perwerdekarekî jêhatî bû. Bi tenê li Lenîngradê li ber destê wî nêzîkî 20 zimanzan, kurdzan gîhîştine û ew bûne zane û pisporekên jêhatî. Bi vê yekê ve girêdayî, em dikarin bibêjin Qanadê Kurdo tenê nenivîsiye, di nav rûpelên pirtûkan de rojên xwe derbas nekiriye. Ji bo vê yekê, mirov dikare bibêje ew organîzatorek bû pirtûka wi ya heja "Tarîxa Edebiyata Kurdî" di nav Weşanên Roja Nû de hatîye çapkirin.



### Navên çend afirandinên Qanatê Kurdo

1. Gramatîka Zimanê Kurdî, Leningrad 1957, bi Rûsî

2. Gramatîka Zimanê Kurdî, Bona komên (sinif) 5-8'an, Erevan 1960

3. Ferhenga Kurdî-Rûsî (34-000 peyv), 1960 Moskova

4. Zimanê Kurdî, Kitêba Dersan Bona Komên 3-4, 1979 Erevan

5. Gramatîka Zimanê Kurdî Angorî Materyalên zaravên Kurmacî Soranî, 1978 Moskova

6. Zimanê Kurdî (Rêzmen), 1981 Frankfurt

7. Ferhenga Kurdî-Rusî (Sorani), 1983 Moskova

8. Tarîxa Edebiyata Kurdî (Cîld 1), 1983 Stockholm

9. Tarîxa Edebiyata Kurdî (Cîld 2), 1985 Stockholm

### Afirandinên ku di çapxanê de ne

1. Lêgerîna Zaza (Lêgerîna Zaravên Kurdî)

2. Tekstên Folklorê Kurdî, bi Rûsî

3. Kilamên Evîntiyê (bi Musaelyan va tevayî)

4. Çapkirina Mem û Zîna Ahmedê Xanî li Stenbolê

5. Tarîxa Kurdnasiyê Rûsistan û Sovyetîstanê

### Çend destnivîsarên wî

1. Folklorê Kurdî Azerbeycanê (B.S. Eskerov re tevayî)

2. Der heqa Navên Jin û Mêran

3. Beyt û Destanên Kurdî

4. Bîr û Bawera Kurdewarî li Folklorê Kurdî de

5. Sazmaniya çekirina Peyvan di Zimanê Kurdî de

### Çend nivîsarê Qanatê Kurdo di kovarên cuda cuda de

1. Pirsên Pêşveçûna Lîteratura Zimanê Kurdî, Riya Teze, Hejmar 31, 1933 Erîvan

2. Pirsên Rastnivîsandîna Zimanê Kurdî, Riya Teze, Hejmar 58, 1955 Erîvan

3. Baweriyên Şaş û Xelet Der heqa Zimanê Kurdî de, Kovara Melûmetiyên Kurd yê Enstutiya Rohilatziyê, 1955 Moskova

4. Xaçatur Abovyan Etnograf û Kurdnas Bû, Kovara Akademiyaya Zanîstî ya Ermenîstanê, Rêza Zanîstên Civakî, 1955 Erîvan

5. Kongra Rohilatziyê, Riya Teze, 1960 Erîvan

6. Diroka Nivîsandîna Ferhengên Kurdî, Ronahî, Hejmar

7, 8, 9 û 10, 1961 Bexdat

7. Ehmedê Xanî û Efrandinên Wî, Ronahî, Hejmar 8, Bexdat 1961

8. Kurdnasî Li Lenîngradê, Ronahî, Hejmar 6, 7; Bexdat 1961

9. Kitêb û Bendên Kurdnasiyê, Çiya, Hejmar 6, 7; 1968 Berlîn

10. Nivîsarên Akademiya Kurdî Zanîstî ya Iraqê, Riya Teze, Hejmar 82, 1973 Erîvan

11. Lêgerîna Lîteratura Kurdî Li Iraqê, Kovara Gelên Asiyê û Afrîkê, Moskova 1975

12. Kurd Ne Tirk, Ne Ji Farsên Serê çiya ne, Dengê KOMKAR, hejmar 33-34; 19-81 Frankfurt

13. Pertokên Hêja û Giranbiha, Berbang, Hejmar 2, 1985

14. Du Gilî Li Ser Peyvên Sinonîm, Roja Nû, Hejmar 5, Stockholm 1985

15. Disêrtasiyên Kurdnasiyê, Roja Nû, Hejmar 8, 10, 1985 Stockholm

### Nîşe:

Ev nivîsar ji Hejmar 54'an a ROJA Nû hatiye wergirtin ku di sala 1986'an de Stockholm Swêdê hatiye weşandin. Her wiha me destê xwe neda zimanê nivîskar.

# MÎTOLOJÎ AFIRÎNEKE HEVPAR A MIROVAHIYÊ YE

## Ferat Pîr

Warê yekemîn ê mîtojiyê Mezopotamya ye. Mezopotamya erdnîgariya pîroz a hemû destpêkan e. Raman û destnîvîsa yekem li vir hatiye afirandin. Mirovan cara yekem li ser vê xakê xwe afirandiye û ketiye nava tevgerê. Şaristaniya yekem li vî warî daye destpêkirin. Ew bîr û bawerî, xweda û xwedawendên ku wê bi hezar salan bandora li dîroka mirovahiyê bikin, weke bereheme hêza raman li vê deverê hate afirandin. Mirovatîyê cara yekem xwe li vê deverê nas kir. Perestgeh, gorîgeh û zîgîruatan xwe nîşan dan. Mîtojiya Sumer Mezopotamya ew mîtoolojiya ku mirovahiyê pêşî naskiriyê ye. Mîtoolojiya yekem ramana yekem, gotina yekem û afirîneriya yekem e.

Mîtoolojiya Yunan, Misir, Hîndîstan û Rojhilata Dûr bi awayên cihêreng çavkaniyên xwe ji vê deverê girtine. Bi gotîneke mîtojojî û şaristaniya yekem ji vê deverê pêl bi pêl li ser rûyê erdê belav bûye. Bingeha mîtojojî û felsefeya Girêkiyan digihîje vê deverê. Mîtoolojiya Romayê jî ji ya Girêkiyan wêdetir neçûye. Mîtoolojiya Hînt-Misir û Rojhilata Dûr

bêhtir li ser koka xwe maye û resenîtiya xwe parastiye. Em dikarin bigihîjin vê encamê ku mîtoolojiya Mezopotamya nîn bûya, mîtojojî û felsefeya Girêkiyan dernediket holê. Mîtoolojiya Girêkiyan jî derneketana

### Warê yekemîn ê mîtojiyê Mezopotamya ye.

### Mezopotamya erdnîgariya pîroz a hemû destpêkan e. Raman û destnîvîsa yekem li vir hatiye afirandin. Mirovan cara yekem li ser vê xakê xwe afirandiye û ketiye nava tevgerê

holê şaristaniya Ewrûpa pêk nedihat.

War û erdnîgariya kurdan Mezopotamya, cihê zanyariyê ye. Cara yekem mirovbûn, afirandin, devletbûn, zagon, ol, şaristanî li vê deverê dest pê kiriyê. Navlêkirinên der heqê huner, zanyarî, felsefe, ol li vê deverê hatine bilêvkin. Çemê Dicle û Firat ji van pêkhatinan re bûye bingeh.

Mirovê pêşîn hozan bû. Ew hozan ramiya, ro kir û pîva xem û xeyalên civakê veguherandin gotinê. Gotin veguherî nîgaş û dahatûya bê-

dawî. Gotin têkilî, dialog û yekparebûn bû. Dîalog û têkilî riya wekhevî, aşitî û civakbûnê bû.

"Pêşî gotin hebû" dibêje Pirtûka Pîroz. Gotin, hêvî bû, aşitî bû, azadî bû, helbest bû ji nû ve û di asteke bilind de hildana dest û şîroveya bûyerên civakî û xwezayî bû. Mîtos vegotin û bilêvkirina wan bû.

Mîtojojî digihîje beriya nivîsê. Ji aliyê dîroknas, zanyar û utopîkan ve ev dem wek navên "Şoreşa Neolîtîk", "Dema Zêrîn", "Civaka Hoveber a Komun" û hwd. hatine binavkirin. Di hişê mirovan de dem wekî "wekhevî", "azadî", "demokrasi", "zêdehî û bereketî", "aştiya pîroz a ku tu kirêtî û xirabî tê de tune ye û hemû mirov bi biratî tê de dijîn, hevpariyê dikin" cih girtiye. Aştî, wekhevî û azadî pêşî di mîtojiyê de hatiye zimên. Dad, aşitî, azadî, xweşkahi, bereket û xwedawendên qencîtiyê û mîtosên wan wek encama vê hêvî û bêrikirinê derketine holê. Nîgaş, mîtos, der heqê aşitî, wekhevî û azadiyê de bû û kiriyara jin bû. Heta di roja me de sedema ku di civakê de jin rola aştiyê dileyîze jî ev e. Gotina pêşîn der barê jin û aştiyê de bû. Peyvên wekî jin, wekhevî û azadî di heman wateyê de dihatin bikaranîn.

Hozanê pêşîn bi gotina xwe ya pêşîn dibêje ku: "Hebû tune bû, mar nebû, dûvpişk nebû, keftar nebû, şêr nebû, ne segê kovî û ne jî gurê kovî hebû. Ne tirs hebû ne jî erjengî. Xwe-diyê mirov nîn bû."

Lê çî hebû?

Pêşî gotin hebû. Gotin xweserî mirovan e. Li gorî gotina nivîskarekî ku Platon ev bibihîstana ew ê bipirsiyana: "Kîjan gotin?"

Mîtos, epos an jî logos? Platon gotinê dike sê beş:

Mîtos; tê wateya gotin, çîrok, kurteçîrok, efsane û hêza vegotar e.

Epos; hêza hozan bi xwe ye. Gotina ku di nava ahengê de û li gorî asta pîvanekê û bi guncan tê gotin e. Her wiha epos gotina hozan e. Hozan bi gotinên xweşik û xemilandî û ahengdar bandorê li mirovan dike, mirovan hestiyar dike û dixwe nava tevgerê. Epos ji bo mirovan "diyariyeke Xwedê" ne gotine ozanên berê. Hêza nîgaşeke bêdawî û bi bandor heye. Epos; di heman demê de tê wateya helbest, destan û newayê. Gilgamêş, Memê Alan, Ilyada-Odyesseyus, Ramayena herî bijarteyên vê mijarê ne. Epîk û epepe çavkaniya xwe ji vê deverê werdigirin.

Mîtos; naveroka gotin, efsane û çîrokê ye. Epos jî şeklê vê yê xweşik ê bipîvan, parsengdar û biqafiye ye. Ev jî hev du temam dîkin.

Û logos jî heye. Logos "Sazûmaniyeye Zagonî" tîne zîman. Bilêvkirina rasteqîniyê ya bi gotinkî ye û maka zanistê ye. Zanîn û zanistiyê îfade dike.

Mîtolojî; tê wateya zanyariya efsaneyan. Di çanda Girêkiya Kevn de mîtolojî, di wateya zanîn, zanyarî, bûyerên deresiruştî yê ku ji rêgezên

hiş dibuhurin in.

Li vê deverê em rêgeza dîalektîkê ya "Yekîtiya Dijberan" dibînin. Mîtos, efsaneyên dere-

gorî ku mirov jî parçeyekî xwezayê ne tu nîgaşên ku bîngeha ji kûrahiya rasteqîniya civakê negirin nîn in. Naxwe jêderka go-



siruştî û hwd. tîne zîman, logos jî tam dijberê vê yekê zanîn, zanyarî û rasteqîniya wan tîne zîman. Ev peyvên ku wateya wan dijberî hev di heman demê de yekîtiyekê jî pêk tînin. Lewre li vir "şexs" afirînerê efsane û mîtosan e. Efsane jî jêderka zanyariya nûjen e. Ji ber vê yekê û mîtos bi qasî dijber in jî yekîtiyekê pêk tînin.

Mîtos, di lêgerîna mirovên li hember xwezayê şer dîkin de çareseriyek e. Mîtos bi bikaranîna hêza nîgaşî, bidestxistina desthilatdariyê ye. Naxwe nîgaş, efsane û gotin xweserî mirovan in. Li

tîne jî di kûrahi rasteqîniya dîrokî û civakî de veşartî ye. Em vê yekê jî dîrok û rasteqîniya civakê cuda nikarin hildin dest.

Pêşî gotin hebû.

Gotin xweserî mirov e, berhema mirov e. Mîtos jî cureyekî gotinê ye ku tiştên tîne bihîstin û tîne gotin û nîfşan derbasî nîfşan derbas dibin e. Ev di wateya çîrok û efsaneyan de ye. Ev di wateya çîrok û efsaneyan de ye.

Gotin berhemeke hêza nîgaşî ya mirov e. Hêza nîgaşî ya mirovan bêdawî ye. Çîrok û efsane berhemên ji hêza nîgaşî ya bêdawî ya mirovan e. Ji aliyekî de

jî berhemeke hêvî, daxwaz û heznên mirovan e. Ji aliyekî de jî vegotina bûyerên xwezayî û civakî yên nediyar wek, hêvî, daxwazî, hezn, tirs, dilşadî, jan e.

Mirovê pêşîn li hemberî xwezayê tiq û tenê û bêhêz bû. Bi zincîrên bêhêzî û tirsên xwe ve hatibû radan. Xweza hov û dijwar û bihêz bû. Teyr bi baskên xwe yên bihêz li asoyan difirî û diçû, şêr bi pençikên xwe bihêz parçe dikir, fil bi gewdeya xwe ya girs her asteng li ber xwe dipelçiqandin û xezal jî bi wê narîniya xwe li bayê bezê direviya. Mar, dûvpişk û mêş û mor hemû ajal xwe diparastin.

Li lûtkeyên çiyayan alav dipijiqîn, ji sotikên lavan rûbar pêk dihatin. Teqereqa asîman bû, şêrqîna birûskan bû, av bilind dibû lehiyê her tişt dida ber xwe û dibir. Wexta ku roj diçû ava şevê kirasê xwe yê reş li ser erdê radixist û her tişt dibin erjengiya reşahiya şevê de dilîsiya.

Mirov di nava van hemû qewaman de bédeng, bêxem, bi tenê, bizdiyayî û bêhêz bû. Giyanewerê herî bêparastin bû. Têjika xezalê bi zayîna xwe re radibû ser piyan û dibeziya. Têjika mêr jî çawa ku ji hêke derdiket dixuşiya. Lê zarokên mirovan? Bi salan pêwîstiya wî /ê bi parastin û xwedîkirinê hebû. Dêrdora mirovan bi ajalên hovane yên erjeng rapêçandibû.

Lê digel van hemû tiştan di destên mirovan de çekeke bihêz hebû. Mirov xwedî hiş bû. Xwediyê gotin, hêza ramanê bû û her wiha xwediyê qabiliyeta afirîneriyê bû.

Mirovan di nava vê dorpê-

çiya hovane ya xwezayê de ro kir û pîva. Hewl da ku nepêniya bûyeran fam bike. Kete nav xem û xeyalan. Xwest ku mîna teyran li asoyan bifire. Efsane "Xalîçeya ku difire" afirand. Ramiya ku ji şêr û fil bihêztir be. Ji ber vê yekê efsaneya Rustemê Zal, Herakles û Ramayena derxist holê. Bi hezaran xweda û xwedavend afirandin. Xwe kire xwediyê hêza raman, bawerî û nîgaşan û xwe bi hêz kir. Bêrawestan fikirî û fikrên xwe veguhestin gotinê.

Li vir kesê ku difikire û dirame xwe bi xwezayê re yek dibîne. Ku bixwaze dişewitîne, ku bixwaze mîna teyr û tilûran difire, ku bixwaze wekî şêrfil parçe dike û hemû aliyên xwezayê yên bihêz bi xwe re yeker dike. Naxwe mîtos bi aliyekî xwe ve .....

**Mirov di nava van hemû qewaman de bédeng, bêxem, bi tenê, bizdiyayî û bêhêz bû. Giyanewerê herî bêparastin bû.**

**Têjika xezalê bi zayîna xwe re radibû ser piyan û dibeziya. Têjika mêr jî çawa ku ji hêke derdiket dixuşiya. Lê zarokên**

lêgerîna çareseriyê û hêviya serdestbûnê ye.

Mîtos bi giştî berhemeke mirovan e û jêderka xwe raman e. Mirovê xwedî raman jî, vegotar, hozan û heta feylesof e jî. Xwe bi yekkerkirina xwezayê re xwe wekî hêzeke alternatîf dihesibîne. Mirov dikare bibêje ku ev yek hewldana bidestxistin û lêgerîna serdestiyê ye.

Ku mirov ketin xiyalan û fêrî nepeniya xwezayê bû û deshildariya xwe pêk anî û şûn de ji bo wî deriyên azadiyê jî vedibin. Lewre mirovên ku difikirin fêrî hêza hebûna xwe dibin û xwe nas dike.

Xwenasîn bi fikirinê re paralel pêş ve diçû. Bêguman li vir di navbera fikirin, bidestxistina rastiye de û pratîkirinê de cudatî heye. Lê ev jî rastiyeke e ku; giyanewerekî ku nefikire dê nebe xwediyê vegotine û efsaneyan jî. Civakên ku ramanên wê herî pêşve çûye, ji mîtolojiyê ra jî çavkanîfî kirine. Cara yekem ku nivîs ji aliyê Sumeran ve hatiye dîtin û bikaranîn, bi mîtolojiya Sumeran ve girêdayî hev e. Mîtolojî, bi gelemperî afirîneriyê beriya nivîsê ye. Ji ber vê yekê ji nivîsê ra jî çavkanîfî kiriye. Wek berhema hêza mêjî û nîgaşa mirov mîtolojî; ji bo fêrbûna nivîsê roleke hêzdar leyîstiyê. Nivîs jî, pêşveçûn û belavbûna ramanê bileztir kiriye.

Mîtolojî, hêza mirûz, coşî û nixrên exlaqî jî pêk tînin. Mirov, dema ku li hemberî siruştê têdikoşiya, qebîleyek li hember qebîleya din dixwest serdest bibûna, ji mîtosan hêz û alîkariyê distendin. Civakên ku mîtosên hêzdar afirandine li hember dijberên xwe mirûzên wan serdest bûye.

Mîtolojî, bûye sedema ku mirov li hember bûyerên siruştî ji xwe bipirse. Mirov, di tekoşîna li hember mercên xwezayê de, hêza xwe û ya xwezayê qiyas kiriye, li xwe pirsîye, xwe dahûrandiye, aliyên xwe yên lawaz û bêhêz derxistiye holê, fêrî wan bû-

ye. Dema ku mirov li rewşa xwe dipirse him pirsan dike û him jî bersivan dide. Pirskirin, bersivîn, lêpîrsîn rêbaza derxistina holê ya nakokiyên û lêgerîna çareseriyê ye.

Xaleke balkêşîner a efsaneyan jî piranî û curbecuriya heyînan e. Dîsa li hemberî van heyînan bihêz her car serdestderketina mirovan e. Di çalakiya Gilgameş, Rustemê Zal, Herakles, Ramayana, Odyessuse û hwd. de ev serdestî û bidestxistina serkeftinê bi awayekî zelal xwe dide der. Li vir serdestî û curbecuriya heyînan û pîrbûna wan di heman demê de hêza ramana wê civakê û peyaya serkeftina wê dide nîşan. Efsaneya ku hatiye afirandin çiqas curbecur, kûr û tekilhev be ew qasî çalakiya ramanê jî bihêz e. Raman û gotina bihêz a mîtosê bi gelemperî jî felsefe, zanîn, helbest, huner, hunera şer û hwd. re dibe bingeh. Payeya pêşveçûna mîtos û ramanê xetêke bi hev re dişopînin. Ev yek di heman demê asta şarezahiyê jî diyar dike. Her civata ku di warê şaristaniyê de cihê xwe girtiye bi teqez xwediyê mîtolojiyê bihêz e. Mîtos çawa bi temamî rastiye nayîne ziman her wiha bi temamî jî rastiye ne dîr e. Mîtos bi zanatî û çalakiya ramanê di zik hev de pêk hatiye.

Mîtolojî jî pêkhatina olan re jî bingehî kiriye. Hem olên pîrxwedayî û hem jî yên yekxwedayî bingeha jî mîtolojiyê girtine. "Efsaneya Adem û Hewa", "Venîgaşiya Cenetê" "Tofana Nuh", "Behît"ên ku jî pêxemberan re hatine diyarkirin û hwd.



hemû mîtos bi mîtosên afirîneriyê re di zik hev de pêk hatine. Mîtolojiya, xwedî taybetiyeke sînkretîstîkî ye. Di destpêkê de ol, zanîn, felsefe, wêje û huner û hwd. Bi mîtolojiyê re di zik hev de bi pêş ketine, paşê wek beşan jî hev cuda bûne. Ev e mîtolojiya jî van pêşketinan re bingehî kiriye.

Thalesê ku di felsefeya rojhilat de yekemîn tê hesabandin, bi giranî di binê bandora efsaneyan de maye. Thales, bandora avê raçav kiriye, li gora pîvanên hiş dirûv dayêkê û şîroveyek bi zanyarî ezmûngerî lê aniye.

Herakleitos, jî baweriya agir-

perestiyê, jî mîtos a agir derketiye rê û felsefeya xwe pêk aniye.

Anakîlmenos jî, dema ku bingeha heyînan di hewayê da dibîne jî dîsa di binê bandora efsaneyan de maye.

Empedokles jî jî baweriya Zerdûşt derketiye rê û hêmanên av, agir û hewayê gihandiye hev.

Îdeaya navdar a Platon, bi mîtosan ra di zik hev de ye. Platon; jî aliyê wê yê efsaneyî re, li gora pîvanên hiş û mantiqê pîvanek pêve kiriye. Lewre mîtolojiya Grekiyan û felsefeya wan, bandor li li hevdû girtine, di zik hev de pêş ve çûne. Weke ku hemû ol jî mîtolojiyê sîdê wer-

girtine, hemû zanyarên pêşin jî mîtos, weke çavkaniyekê hildane dest.

Di dîrokê de hemû efsaneyên mezin, jî şaristaniyên mezin re rê vekirine.

Dayikwelat a yekem a mîtolojiyê Mezopopamya ye. Şaristaniya pêşin jî ji vêderê dest pê kiriye. Efsaneya Misrê; jî pîramîd, gorên bîrdarî û ji zayina şaristaniyeke birêsdar re ku raza wê hê nehatiye fêmkirin, sedemî kiriye. Felsefeya Grekî, jî çand û mîtolojiya Grekî cuda, mirov nikare hilde dest.

Taovanî ya La -Tzû, zanyarî û ola xwezayî jî bingeha xwe ji

mîtolojiyê girtiye. La-Tzû, xwezayê şîrove kiriye, dahûrandiye, jî mîtosên di derbarên vê yekê de sîd wergirtiye û wisa gihiştîye encamê.

Hemû berhemên ku ji wêjeya cîhanê ra çavkanîti kirine, bi mîtosan ra di zik hev de pêşve çûne.

Krîşna ya Hindî, destana xwe ya ku dused hezar "duhanî" beyt girtiye nivîsandiye, spartiye mîtosê.

Teokrîtos, Hesîodes, Vergîlî-ûs, Homeros, Ehmedê Xanî, Dante, Fîrdevs, Mîlton Goethe û hwd. hemû hozanên mezin, helbestên xwe bi mîtosan ra, di zik hev da hildane dest. Mezinbûn û

birqonekiya helbest û hunerên wan; bi hildana dest û honandina wan a gerdûnî ya mîtosan ve girêdayî ye. Mîtosî, li mercên dema xwe, li rasteqîniya civakê guncandine; li gora pîvanên hiş û mantiq, bi şîroveyek gerdûnî, di asteke bilindtir de ji nuh ve afirandin e.

Mînakên wisa yên balkêş, mirov dikare zêdetir bike. Nexwe şaristanî, bi mîtosan re di zik hev de pêşve çûye. Ku mîtos berhema hêza nîgaşî ya mirov be; şaristanî jî çalakiya gerdûnî ya mirovê ku difikire ye. Di heman demê de serkeftina mirovê ku li hember bûyerên xwezayê difikire ye.

Şaristanî û şarmendîbûn bi nîgaşê, mîtosê û ramanê dest pê dike, bi ramanê mezin dibe û hêz digire, rehên xwe berî kûraniya dîrokê dide û bi fikirîne hebûna xwe digihînin nîfşên nuh.

Wekî encam; tu mîtos û efsanêyên ku rehên xwe, di kûraniya rasteqîniya dîrokî ya civakî de nîn bin tunene. Efsane; afîrîneriya kolektîf a hêza nîgaşî ya mirovan e. Weke ku di gotina pêşiyên kurdan da jî hatiye destnîşankirin; "Gîha li ser rehên xwe şîn dibe", mîtos jî rehên pêşveçûna zanistî, felsefîk, olî, hunerî ya mirovan û gela ne. Li ser bingehê zanistî ku me xwe sparte van rehan; dê xeta şaristaniyê jî, di nava aştî, demokrasî, dad û azadiyê da pêş ve biçe û bihêz bibe û ji berjewendiyên hevpar ên mirovahiyê ra xizmet bike.





# TÊGIHÊN TEMAYÊN REWŞA PÊŞKETINÊN NÛ Û XURTKIRINA PEYVAN DI KURDÎ DE

## Feqî Huseyn Sağrıç

Berî her karî dixwazim vê yekê bibêjim ku ziman, rewşdana temayên nivîsandinê û têkiliya peyvan, ne wekî wan zanînen din in. Ev yek îtîna-yeke pir mezin dixwaze. Lewre, gava çewtiyek bikeve wan zanînen din, cihê çewtî ketiyê tenê zerar dibîne. Lê dema çewtî kete zimên, bandor li hemû zanînan dike. Lewre ziman dayika hemû zanînan e. An jî hacetê çêkirin, sererastkirin, watedan, tekûzkirin, kemilandin, xemlandin û tewizandina hemî zanînan e. Ew jî hacetekî wisa ye ku, bêyî wî tu zanîn nayên holê. Bi hêsanî dikarim bibêjim ku ji giraniya zanînan re pisporê wê beşê, têrî bike jî, lê ji zimên re, ev yek ne bes e.

Heger ji zimanên tekûzkirî re pisporêk tenê, têra têkiliyê bike û bikare guhartinan tê de bîne holê jî, ji zimanê kurdî, nemaze zaraveyê kurmançiya îroyîn re dîsa ne bes e. Di gehîneka me ya îro de, divê çêkirina peyvan an jî dirûvdana wan, bi rewşeke vebir bê qedexekirin. Heya ew peyvên he-

rêmî an jî yên ku ji nû em pê agahdar dibin, divê an em bi kar neynîn; an jî bi heyeta zimanzanan re, bi rewşeke tekûz bê derbaskirin, paşê bê bikaranîn û benda pêşberderketina gel jî rawestîn. Heger ji deverinan deng hatin, divê ew deng bêne hêjandin. Ji wê hêjandinê re, dîsa heyeta zimanzanan peywîst e.

Dixwazim li vir, li ser mijarekê jî hinekî rawestim. Divê îro em ji peyv, biwêj û têgihên biyanî, netirsîn û zêde zor nedin xwe ku kurmançiya wan bibînin û xwerû bi kurmançî binivîsin. Zordanên wiha, ji avakirina zimên zêdetir, herifandinê tîne. Divê biwêj û têgihên biyanî jî ji aliyê kesinan ve neyên wergerandin û yên wergerandî jî divê di heyeta pisporan de bîn hêjandin. Dixwazim li vir mînanan bidim, paşê baborim ku hindik jî be xwestina xwe bînim zimên:

Bi kurdî, biwêja "li min xweş nayê" tirkî li gorî teknîka zimanê xwe "hoşime gitmiyor" wergerandine. Dû re kurdên xwenda û bajarî ev biwêj derveyê teknîka zimanê kurdî bi "li xweşê min nayê" wergerandine, bi kar tînin û

gelek kes jî di bandora wan de mane. Yek jî dixwazim, peyv û biwêja tirkî ya "yürütme û yürütme kurulu" hildim destê xwe û qasekî li serê rawestim. Ev biwêj bi destê kesinan, li gorî teknîkeke sosret û biyanî, ev biwêja tirkî bi biwêja "rêvebir" û heyeta rêvebir" a kurdî hatiye wergerandin û bi giranî tê bikaranîn jî. Lê biwêjeke me ya bi vî rengî tune an jî ez pê nizanim. Di vî mijarê de dikarim dabaşa du raderan bikim. Yek jê "berin" (birin) û ya din jî "birîn" e. Kirarên van raderan digel navên wan karan wiha pêk tên. Ya "birin" û dibe

**Nexwe divê îro em çi bikin? Heger ew peyv, biwêj û têgihên ku pêdiviyên me di zaraveyên kurdî yên din de hebin û bi hêsanî destê me bigihîje wan, divê bêguman ew bêne bikaranîn. Bi vî rewşê, heger gavek be jî, zaravayên kurdî ber bi hev du ve diherikin û nêzikî hev dibin.**

"ber" û ya "birîn" û jê dibe "bir".

Wekok: rêber = yol gösteren û rêbir = yol kesen. Jixwe, rêveber û rêvebir jî di heman wateyê de tên bikaranîn û ew vî wateya misogerî nika-re bi rewşeke din biguherîne. Di vî mijarê de bi sedan mînak tên dan.

Nexwe divê îro em çi bikin? Heger ew peyv, biwêj û

têgihên ku pêdivîyên me di zaraveyên kurdî yên din de hebin û bi hêsanî destû me bigihîje wan, divê bêguman ew bêne bikaranîn. Bi vê rewşê, heger gavek be jî, zaraveyên kurdî ber bi hevdu ve diherikin û nê-zîkî hev dibin.

.....  
**Bi kurdî, biwêja "li min xweş nayê" tirkan li gorî teknîka zimanê xwe "hoşime gitmiyor" wergerandine. Dû re kurdên xwenda û bajarî ev biwêj derveyê teknîka zimanê kurdî bi "li xweşê min nayê" wergerandine, bi kar tînin û gelek kes jî di bandora wan de mane:.....**

Bi vê yekê tenê rawestan ne kareki rasteqîn e. Divê bê derbaskirina deman ji pisporên zimanê kurdî, bi jimarek eqenc û fireh, encûmeneke têrendam bê damezirandin. Pêşî ew encûmen, çêkirina peyvên û biwêjan qedexe bike û riyekê ji yên çêkirî re bibîne. Dû re hema bi lez û bez hemî weşanên me hildin bin destê xwe. Bêrawestan, dest deyne li ser wan çewtiyên berçeve ku di gelek weşanên me de hene. Piştî vî karî, bêrawestan divê pêşî her karî dest biavêje pirtûkên me yên nivîsandî yên kevnare; peyv, biwêj û temayên di wan de heyî, digel rastnivîsa wan hilde destê xwe û bihêjîne. Piştî qedandina vî karî, divê bi kovaran sehya civakî û bi heyetan li hemî deverên welêt bigerin, peyvên bicivînin. Dû re dest

biavêjin zarava û devokên kurdî, ka di wan de çiqas peyv û biwêjên havil jê dîtinê hene, wan jî bihêjînin (binirxînin). Heger ji tekûziya zimên re pêdivê bimîne, divê paşî li çareserîya wê bê nêrîn. Jixwe em ji vê yekê re derengî mayîne. Zêdetir derengmayîn dê zerareke wisa derxe pêşberî me ku em nekarîn ji bin derkevin. Lewra ew kesên ku ji teknîka zimanê kurdî kêmagah û ji kêmagahiya xwe jî bêxeber, biwêjine û peyvîne vajiyê teknîka zimanê kurdî, di zimên de cih dikin û peyvîne kurdî jî çewt bi kar tînin. Divê bi lezgîn pêşî li wan bê girtin.

Di zanîna me de, heger em di vê riyê de, an jî manendê vê, di riyêke din de neçine zimanê xwe, em ê nekarîn bi rewşeke tekûz zimên sererast bikin, an jî ji tengasî û çewtiyan rizgar bikin. Divê bê zanîn ku, xwediyê zimên û rasteqînî "gel" e. Bi vê rewşê em serî li gel didin û raya wan dipirsin. Ew encûmena em jê dabaş dikin, divê ji bo demeke kurt bê bikaranîn. Ango divê bi lezgînî Akademiya zimanê kurdî bê damezirandin û ew akademî pêşengiya zimên hilde destê xwe. Dema ev merc hate holê, divê encûmena gonî, peywîrê radestê wê bike.

Dibe ku min di vê bersivnivîsa kin de nekarîbe hemî daxwazên xwe ji we re pêşkêş bikim. Ji ber astengên keftûleftên fermî yê civatî, çara hatina li wir jî bi dest min neket. Spasên xwe digel daxwazên serkevtina we, ji dil pêşkêş dikim.

#### Nîşe:

Ev nivîsar wek danezan ji Konferansa Zimanê Kurdî ya Berlînê re hatiye şandin û di Konferansa Zimanê Kurdî de ya ku ji aliyê enstîtuya me ve di 16. 04. 2000 an de li Stenbolê çêbû, wekî gotar hatiye pêşkêşkirin.

## LI SER GELŞÊN ME YÊN VEKÎTÊ

### Zana FARQÎNÎ

Di warê zimanê me yê nivîskî de vekîteke me ya hev-girtî ya ku dilê her kesî rihet bike û bihêle hemû bikarhênerên ziman bidin ser wê şopê mixabin ku nîn e. Her derdoreke me ya siyasî û ne siyasî xwedî rastnivîsekê ne. Ev rewşa heyî dibe sedem ku em li ser van mijaran rawestin û serê xwe biêşînin. Xwezî em ne bi van mijaran lê bi mijarên dîtir ên zimanê xwe bilî bibûna. Lê em çî bikin ku ev mijarên hanê di warê zimanê me yê nivîskî de dibin sedemê gêjahî û tevli-heviyê. Ji ber vê yekê me xwest ku em careke din vegeerî ser van mijaran, ku berê jî em li ser van rawestiyabûn.

Berîya her tiştî, ez pêşî hewce bi ravekirina vekî û rêzimanê dibînim. Pişt re ez dê ramanên xwe derpêş bikim. Ka em bala xwe bidinê bê vekî ango rastnivîs çî ye. Bi awayekî kurt vekî wiha tê ravekirin: Ji rêzikên zimanê nivîskî re tê gotin ku divê kes rîayetî wan bikin. Baş e, ev rêzik çawan tî peyitandin? Bi piranî, bi saya rêziman bingeha vekîte tê danîn, qayde û rêzikên wê xuya û zelal dibin.

Her wekî ku tê zanîn, rêziman (yanê gramer) li ser hêmanên zimanekî yê mîna deng, teşe, tewandin, peyv û hwd. Radiweste, wan vedikole,

disenifîne, têkiliya di navbera wan de diyar dike, rêzikên zimên diselmîne (tespît dike) û awayên rast ên hevokan dide xuyakirin. Tê dîtî ku, ya ji vekî û rênivîsê re rê vedike rêziman e, nexwe em nikarin rastnivîsê ji rêziman cuda hizir bikin. Em bi hêsanî dikarin bibêjin ku, kîlîta rastnivîsê rêziman bi xwe ye. Da em vê yekê jî aşkera bikin ku, rêziman bi tena serê xwe her tiştê rastnivîsê çareser nake.

Li ser vê yekê, em bi nimûneyekê mebesta gotinên xwe zelal bikin. Carinan di hin nivîsaran de em rastî çend awayê heman peyvî tî, wekî /bihîstin/ û /bihîzîtin/. Di vir de pirs ev e, teşeya rast kîjan e?

**Her wekî ku tê zanîn, rêziman (yanê gramer) li ser hêmanên zimanekî yê mîna deng, teşe, tewandin, peyv û hwd. radiweste, wan vedikole, disenifîne, têkiliya di navbera wan de diyar dike, rêzikên zimên diselmîne (tespît dike) û awayên rast ên hevokan dide xuyakirin. Tê dîtî ku, ya ji vekî û rênivîsê re rê vedike rêziman e, nexwe em nikarin rastnivîsê ji**

Di wê peyvê (lêkerê) de, gelş di dengê /s/ û /z/yê de dixuye. Îcar bi saya rêziman em tê derdixin ku teşeya rast /bihîstin/ e. Çawan? Di lêkerên me yê ku dawîya wan bi /-stin/ê diqede de, dengê /s/yê di dema niha, dema bê û raweya fermanî de li dengê /z/yê dadi-gere: wekî; bibihîze, **ez dê bibihîzim, ez dibihîzim...**

Ji bo demên borî, kêşana heman lêkerê; **min bihîst, min dê bibihîsta, min bihîstibû...**

Ji bo ku babet hîn bêhtir diyar bibe, em çend lêkerên din jî biçivînin. Lêkerên me bila **parastin, perestî û gestî bin:**

*diparêzim, dê biparêzim, biparêze, min parast, min dê biparasta, min diparast...diperizim, dê biperizim, biperize, ez perestim, ez dê biperestama, ez pê perestibûm...digezim, ez dê bigezim, bigeze, min gest, min dê bigesta, min gestibû...*

Piştî van mînakên em careke din vegeerî ser mijara rastnivîsê. Îcar du aliyên vekîte hene, yek nivîsîna peyv an yek jî nivîsîna hevokan e. Ji bo hevokê jî em nimûneyekê ra ber bikin. Meha tîrmehê; di vê hevokê de /a/ bi /meh/ê ve û /ê/ / jî bi /tîrmeh/ê ve hatiye nivîsandin. Di vê mînakê de /a/ veqetandeka binavkirî ya yekejimariya zayenda mê ye û /ê/ jî tewanga binavkirî ya yekeji-

mariyê ya zayenda mê ye, ji lew re divê ku bi peyv an bê nivîsandin. Pir xweş tê dîtî ku rêziman bi xwe jî, ji bo rastnivîsê rêzikan datîne.

Me daxuyand ku rêziman ji bo vekîte her tiştî nikare çareser bike, niha em ji bo vê gotina xwe serî li hin ravekan (îzahan) bidin. A ku dide xuyakirin wê xal (nuqte), bêhnok, nuqtepirs, baneşan, tîpa girdek û hûrdek, kîjan bêje ango peyv bi tîp û herfa girdek, kîjan jî bi ya mezin dest pê bike û hwd. bi riya vekîte tî peyitandin. Têkiliya rêziman bi van xalan nîn e. Bi gotineke din, ev rêzik pişt

re tèn danîn.

Digel van yekan, rêzikên vekîta zimanekî bi senahî dikare xwe bispêre sê prensîban:

### 1) Vekîta Denganiyê (rastnivîsa fonetîkê)

Alfabeya zimanê me alfabeke fonetîk e, ango ji bo her dengî tîpek tê danîn û deng bi wê tê nimandin. Em piçek ronî bidin ser mijara xwe. Em bala xwe didinê ku heman (eynî) peyv dikare bi çend cureyan, bi çend çeşîdan bê nivîsandin. Nimûne: sitirandin, sitrandin, strandin... an jî xesû, xwesû, xesî .... an jî filitîn, felitîn... Awayê rast kîjan e? Me got ku li gorî alfabeke me divê ji bo her dengî tîpek bê bikaranîn. Nexwe bi zelalkirina fonetîka zimanê me, ev gelş hel dibe.... Bi saya denganiya zimanê xwe em bidin xuyakirin ku ka dengdêr tèn cem hev an na, her wiha peyvên me bi çend dengdaran dest pê dikin û hwd. Em dizanin ku di zimanê me de di navbera dengê /s/, /t/ û /r/yê de dengdêrek nîn e. Nexwe rastnivîsa peyva /sitiran/ an jî /sitran/ ev e /stran/ e.

Lê belê li vir gelşeke din li pêşberî me heye. Bi rastî tu li kîjan xebata rêzimanî ya kurdî dinêrî, tu li newekheviya senifandîna jêderkên dengê zimanê kurdî têyî. Bi kurtî em diyar bikin ku hîna em ne xwediyê senifandîneke hevgirtî ya fonetîka zimanê kurdî ne. Ji lew re arîşeya nivîsîna awayên peyvan li ber me heye.

### 2) Vekîta Etîmolojîk

Li ser rayek û kokên peyvan radiweste, di vekîteya peyvan de (yên biyan jî tê de) serî li bingeh û hîmê peyvê dide, rastiya wan derdixe holê û wisan bi kar tîne. Mînak: Çarlepik, çalepk, çaplûk, çapelûk... Em van peyvan dahûrîn, ku di rastiya xwe de yek peyveke hevedudanî ye. Lê hema em bi kurtasî bibêjin. Peyv ji sê hemanan hatiye pê, ji /çar/, /lep/ û /k/yê. Ev her sê heman hatine nik hev û peyveke hevedudanî anîne pê. Nexwe ya rast /çarlepik/ e, ne yên din in...

### 3) Vekîteya Kevneşopî

Ji nav jî çawan xuya dibe, di mijara rastnivîsê de serî li awa û şeweyên rastnivîsa kevneşopî, ya adetî tê xistin... Ew berhemên me yên klasîk, ên berê, ji bo me dibin rênîşander. Em bi van sê rîyan dikarin hîmekî xurt û tekûz ji vekîta zimanê xwe re çêkin û kêmasiyên ku hene ji navê rakin.

### Sûdgirtina ji ezmûnan

Niha em alfabeke Latînî ya kurdî bi kar tînin (bi giştî kurdên bakur), ev jî tişteki surîştî ye gava ku tu alfabeke bi kar bînî, bivê nevwê tu dê di bin bandora hin rêzikên wê alfabeke û vekîta wê alfabeke de bimînî û heta tu dê hin ji wan rêzikan jî, ji xwe re bipejirînî. Gelo em dikarin bibêjin ku na em bi tevahî ji wan cihê ne? Hem tu dê alfabeke wan bi kar bînî û hem jî tu dê xwe ji rastnivîs û rêzikên rastnivîsa wan bi temamî bi dûr bidî? Na, ne

gengaz e, çimkî di vî warî de hin biryarên gelemper tèn stendin û konferansên rastnivîsan tèn lidarxistin.

Niha kurdên me yên ku alfabeke erebî ya kurdî bi kar tînin dikarin bibêjin ew ji sedî sed vekîteke xweser bi kar dihênin?

Îcar ku em li ser vekîteke xweserî zimanê xwe israr bikin, dîsa em dikarin serî li berhemên kevn ên ku bi alfabeke xweserî zimanê me hatine nivîsandin, bixin. Da ku heta ji me bê em rastnivîseke xweserî zimanê xwe pêk bînin. Ji bo mînak, Mishefa Reş û Cizwe ji bo vê yekê nimûneyên baş in. Hêjayî pirsê ye ku em bipirsîn, gelo ew alfabe û rastnivîsa ku zimanê me pê hatiye nivîsandin çi qas xweser in? Divê mirov baş li wan bikole û lê mêze bike bê ka rastnivîseke hevgirtî jî di wan de heye, an na...

### Vekîta Celadet Bedirxan

Em gişt pê dizanin ku Celadet Bedirxan ji hêla bilêvkirinê (telafûzê) ve, devoka Botan ji zimanê me yê nivîskî re hîlbijartî ye. Em tev jî qet nebe, bi awayekî teorîk vê yekê dipeljirîn. Lê ku mesele hate kete kardariyê (pratîkê), em tersî vê rewşê dikevin. Gelo çima?

Gerek em vê nuqteyê ji bîr mekin ku, her herêmeke me xwedî bilêvkirinekê ye, heta di heman herêmê de bilêvkirinên cuda jî hene. Jixwe em nikarin ji fonetîkeke homojen a zimanê kurdî behs bikin. Em bi bîr bînin ku tu netewe ne xwedî

denganiyeke hevgirtî ye. Paşê radibin ji xwe re cihekî mînanî navend qebûl dikin û dengên zimanê xwe li gorî jêderka wan tesnîf dikin.

Gava ku em ji aliyê fonetîkê ve li mijara xwe hûr bibin, divê ku em vê yekê ji bîra xwe qet dernexin. Heke ez rabim ji layê bilêvkirinê, ji xwe re herêma Serhedê bigirim, ez dê tersî Celadet Bedirxan bikevim. Eger ez wisan bikim, mafê yê din jî heye ku ji hêla herêma xwe an jî herêmeke dîtir ve, li ser meseleya fonetîka Kurdî raweste. Wekî nimûne hin herêm /çav/ mînanî /çehv/, /ç'ev/, hin herêm /zivirîn/ nola /zîvirîn/, hin herêm /hesin/ bîna /h'esin/, hin herêm /xwê/ fîna /xwey/ bi lêv dikin. Em dikarin bi çi teherî xwe ji vê aloziyê rizgar bikin?!

Tê gotin ku gel çawan dipeyîve em jî wisan rastnivîsa xwe saz bikin. Em pirs bikin, ma gelê me bi awayekî homojen dipeyîve, ma gelê me xwedî fonetîkeke pişkdar (muştêrek) e? Em baş dizanin ku her herêmek heman dengî bi tonêkî din bi lêv dike. Yek /s/ya di /sed/ de bi awayekî şede bi lêv dike, yek hîn nermtir bi lêv dike...

Loma, an em dê li ser biryara Celadet Bedirxan bimînin ku bê çawan ji aliyê bilêvkirinê ve Herêma Botan ji xwe re mîna bingeh hilbijartiyê, an jî divê ku em herêmeke dîtir ji xwe re hilbijêrin. Eger ez raya xwe derpêş bikim, gerek mirov li ber biryara Celadet ranebe. Çimkî, ku em vê mijarê ji nîqaşê re vekin, em ji binî dernakevin. Cihê dax û mixabînetê ye ku bi me re hîna hestê ne-

teweyî di vê mijarê de jî bi pêş neketiye, herêmparêzî û bi hin kesan re jî herêmpereştî serdest e û bûye perde ketiye ber çavê wan.

Di ziman de hin tişt dikarin li derveyî rêzikan bimînin. Yanê wekî awerte tişt dikarin derkevin ber me. Em jî dikarin bi çavekî din li wan binêrin. Gotinek bi navê "xeletê menşûr" heye, em jî dikarin di vê çarçoveyê de li hin rêzikan binêrin. Yanê dikare ew tişt tersî gramerê be, tersî vekîtê be, lê ji ber ku ji aliyê maneyê ve tu şaşiyek çênabe, tu guherînek

rêmekê bi kurtkirî tê bi lêvkirin, li herêmeke din jî bêyî ku bê kurtkirinê tê gotin. Nimûne:

keya: *keyayê gund an jî keyê gund*

rojname: *rojnameya hefteyî an jî rojnama hefteyî*

mele: *meleyê medreseyê an jî melê medresê*

Çawan di nimûneyên me de jî xuya bû, ji aliyê bikaranînê ve du şêwe hene. Niha ji aliyê wateya hevokan ve tu gelş nîn e. Li ser van nimûneyan çaxê ku em rawestin, em dibînin ku ji hêla wateyî ve gelş çu nîn e. Wate wînda nabe. Mebest di-

**Di ziman de hin tişt dikarin li derveyî rêzikan bimînin. Yanê wekî awerte tişt dikarin derkevin ber me. Em jî dikarin bi çavekî din li wan binêrin. Gotinek bi navê "xeletê menşûr" heye, em jî dikarin di vê çarçoveyê de li hin rêzikan binêrin. Yanê dikare ew tişt tersî gramerê be, tersî vekîtê be, lê ji ber ku ji aliyê maneyê ve tu şaşiyek çênabe, tu guherînek dernakeve himatê, mirov dikare qet dest nedê.**

dernameve himatê, mirov dikare qet dest nedê.

#### Li ser Rastnivîsa Terkîban

Piştî ku me der barê mijarên jorê ramanên xwe derbirî, îcar ez dikarim bêm ser mijareke din î girîng. Mijara me ev e, peyvên me yên ku bi dengdêrên /a/ û /e/ diqedin, gava bi peyveke din re terkîbê çêdikin û /y/ya kelijînê tê paşiya wan gelo dikevin an jî nakevin. Bi rastî gava em guh li zimanê devkî didêrin, em dibînin ku em hinan kurt dikin û hinan jî nakin. An jî, heman peyv li he-

yar û aşkera ye. Lê ji layî rêzimanî ve gelş heye. Gerek dike ku deng neyên xistin. Çimkî ev rewşa hanê ji aliyê binyadî (bastûrî, bunyawî) ve di ziman de naqewime. Ne tewang e û ne jî rêzikeke zimanê me ye. Tenê ji aliyê bilêvkirinê ve rewşeke rasteqîn heye li pêşiya me. Ev yek jî, ji aliyê vekîtê ve di warê nivîskî de gelemşeyê derdixe ber me. Dibe sedemê dubendiyê. Ez bi awayekî kurt ramana xwe derbibim, ji bo ku yekîtiyek, hevgirtinek di rastnivîsa me de hebe, meyla min li ser awayê ne kurtkirî ye.

Mijara me ya duduyan ev e, gelo beriya dengê /y/yê dengê /î/ tê an nayê? Celadet Be-

dîran dibêje ku nayê. Di di warê nivîskî de hin ji me rîayetî vê rêzîkê dîkin hin ji me jî nakin. Ji lewre, newekheviyek di warê vekîtê de diqewime. Pirtir ev gelşa hanê di peyvên ku dawîya wan bi dengdêra "î"yê diqede de, derdikeve. Dengdara "y"yê jî, mîna tîpa kelijînê/pêwendiyê bi erka xwe radibe. Em vê jî bibêjin ku di zimanê me de sê dengdar bi erka tîpa kelijînê radibin: h, w û y.

Ev her sê dengdar jî, di zanista fonetîkê de wekî nivdeng têne pejirandin. A jixwe ji ber vê yekê ye ku gelşa /î/ û /y/yê tê li ber me disekine. Gava ku dengdêra /î/yê tê pêşîya dengdara /y"/ê, asîmilasyonek tê pê û dengê /î/yê nema mîna xwe dimîne. Nimûne:

derî: *deriyê biniya malê*

tirî: *tiriyê rezê gund*

malî: *malîya meleyê gund*

Niha ez li gorî fonetîka herêma xwe, dikarim bibêjim ku dengê /y/yê hikariyeke mezin li dengê /î/yê dike û nema dengê /î/yê wekî xwe dimîne. Eger ew deng sedî sed li dengê /î/yê danegere jî, ew ji sedê sed ne /î/ ye jî. Bi kurtasî, guherîneke berbiçav tê de çêbûye. Ji bo selmandina vê yekê min bi xwe kesên ji herêma Botan jî dan axaftandin. Min dît ku ew jî wekî dahûrîna me dengê /î/ya li pêşîya /y/yê bi lêv dîkin. Belê, Ew deng ne tam /î/ ye û ne jî /i/ye. Dengê wisan e ku di navbera her duyan de ye. Di vir de çawan me li jorê jî got, em bi meseleyeke asîmi-

lasyonê re, rû bi rû ne. Ev yek di bastûra ziman de diqewime. Hemin ku dengê /î/yê mîna xwe namîne, peyta Celadet Bedirxan di cih de dibînim û ji lew re dibêjim ku divê beriya /y/yê dengê /î/yê neyê...

Mijara me ya sisiyan jî li ser dengê /ê/yê ye. Dîsa dengê /y/yê derdikeve pêşîya me. Çaxê ku terkîbek tê pê û dengdêra /ê/yê tê pêşîya dengdara /y/yê, guherînek di dengê /ê/yê de çêdibe. Çawan me li jorê jî diyar kiribû, ev qewimîn û rûdan ji ber dengdara /y/yê ye. Dengê /y/yê, /ê/ya li pêşîya xwe asîmile dike. Li gorî Celadet Bedirxan divê dengê /ê/ an dê bibe /i/ an jî /e/. Wekî diya min an jî deya min. Lê ev yek di hemû terkîban de pêk nayê. Nimûne:

rê: *riya navbera gund û bajêr an jî rêya navbera gund û bajêr*

dê: *diya min a pak an jî dêya min a pak*

çê: *tu çêya xwe dibêjî(!)*

sê: *kesê sêyemîn (!)*

Niha di kardariyê de ez bi xwe rast li her du awayên bikaranîna dengê /ê/yê hatime, yanê riya navbera gund û bajêr an jî rêya navbera gund û bajêr. Meyla min li ser awayê bikaranîna /i/yê ye. Ango "riya navbera gund û bajêr", ji "rêya navbera gund û bajêr" çêtir dibînim. Lê wekî ku di her du nimûneyên dawî de tê dîtin ku me nîşana baneşanê di nav kevanê de daniye paşîya wanem nikarin /ê/ya wan li dengê /i/yê

dagerînin. Bi gotineke din ez bi xwe nikarim di şûna "tu çêya xwe dibêjî" de bibêjim "tu çiya xwe dibêjî"

Der barê vê babetê de mirov dikare hin rêzîkên awerte deyne, yanê rastnivîsîna hin terkîpan ji rêzîka gelemper biawertîne.

Di van her sê mijaran de ji bilî peyt û tespîtên rêzîmanî, pêwistî bi tercîhan jî heye. Ji ber ku di nav gel de hevgirtinek û pîvaneyek (ango standartek) tune. Ji bo ku nîn e, erk jî dikeve ser milê me da ku em li ser şeweyekê biryara xwe bidin.

Bi kurtî be jî, min divê ez çel ji du mijarê din jî bikim. Yek jê ev e: Di zimanê me de sede nîn e. Nemaze ji bo peyvên sade ku ji hêmanên din nehatine pê. Ez carinan rast lê tîm ku hinek radibin cot /r/ û cot /l/ bi kar tînin. Ev ne tiştê rast e. Ji ber ku ev ne mijara alfabe-yê ye, ew mijarek ji mijarên denganiya ango fonetîka ziman e. Mijara din jî, mijara dabirê yanê apostrofê ye. Bi awayekî giştî ez dikarim bibêjim ku ev di zimanê me de nîn e. Ji bilî çend awerteyan. Kurtebêja peyvên û reqeman. Ji ber ku ravekirina vê mijarê bi tena serê xwe hewce dike, ez niha kurt dibirim.

Wekî me berê jî anîbû ziman, beriya her tiştî hewce dike ku hay û agaha me ji bilêvkirina Celadet Bedirxan hebe, ku vekîta xwe li serê ava kiriye. Ji lew re em ji bîra xwe qet dernexin ku em ne xwediyê

# BERNAMEYA BEŞA DÎROKÊ YA ENSTÎTUYA KURDÎ YA STENBOLÊ

fosnêkêkî girtî ne!

"Dîrok di roja me de veşartîye, em di despêka dîrokê de"

Dema ku em li dîrokê dinêrin, bi gelemperî em dibînin ku her şaristanî di nav şaşîtiyeke wekî ku dîrokê bi xwe dide destpêkirin û sînorkirin de ye. Lê çawa ku tu civakên ebedî; bêrabirdû û dahatû, tune, her wiha tu civakên homojen û ku ji nişkê ve derketine holê jî tune ne. Dema ku mirov di pêvajoyên perisinê yên azîna pêşveçûna dîyalektîkî de hewl dide ku pêdiviyên xwe yên şîrûştî bi cîh bîne, di heman demê de hîmê şarîstaniyê jî bi vê hewla xwe datîne.

Mirovahî yekemcar bi hêza hilberînê û bi çalakiya hişmendî ya kedê, li Mezopotamyaya Jorîn derketiye ser dika (sahne) dîrokê. Mirov li hewza Firatê û qûntarên Zagros û Torosan yên ku daketine nav deştan de, bi pêkanîna şoreşa civakbûyînê re; bûye xwediyê çalekiyekî ku di jiyana mirovahiyê de, cihekî pir girîng digire. Û di pêkanîna çalakiya mirovahiyê ya herî mezin de cih girtiye. Bi vê çalakiya xwe ya ku em dikarin bibêjin çalakiya mirovahiyê ya herî girîng e, mirov hem vejîna xwe, hem jî dîroka xwe afirandiye. Ango mirov dema ku

xwe afirandiye, di heman demê de dîroka xwe jî afirandiye.

Di roja me de êdî belge tenê bi serê xwe nikarin bûyer û rûdenên dîrokî zelal û eşkere bikin. Ji ber vê pêdiviyê ye ku hindî diçe xebatên bêjeyî yên dîrokî di xebatên dîrokê de girîng û bandorker dibin. Em wekî beşa dîrokê vê rêgezê girîng û payeberz dibînin û tev-

**Mirovahî yekemcar bi hêza hilberînê û bi çalakiya hişmendî ya kedê, li Mezopotamyaya Jorîn derketiye ser dika (sahne) dîrokê. Mirov li hewza Firatê û qûntarên Zagros û Torosan yên ku daketine nav deştan de, bi pêkanîna şoreşa civakbûyînê re; bûye xwediyê çalekiyekî ku di jiyana mirovahiyê de, cihekî pir girîng digire. dîroka xwe jî afirandiye.**

gerîna li gor vê rêgezê, wekî tişteke pêwîst û jênager dibînin. Nemaze jî serobinabûna civakî ya di çawaniya şoreşkerî de û gupenînen di van sih salên dawîn de çêbûyîn, ji bo xebatên me yên pêşnûmaya beşa dî-

rokê şaxa bêjeyî, pêşdar e. Her wiha em di pêşnûmaya xwe de xebatekî kû dahûrandin û zelalkirina sedsala bist û yekemîn di hewîne, difikirin. Dema em lêgerînekê li ser dîroka ku em wekî çalakiyekî bîra kolektîf û civakî dinirxînin, bikin; pêwîst e ku em vê yekê mîna hebûnek civakî bihesibînin. Her wiha tîkiliya vê yekê bi dorhêl, bi xweza û bi hev re çewa ye? Ev tîkilî, dê çewa û de di nav kîjan şert û mercan de pêş bikeve? Ji bo xebateke zanîstî, bi hev re şîrovekirina van mijaran, ji bo encamgirtinê tişteke jênager e.

## ZANISTA DÎROK Û METODOLOJIYA WÊ

### Nêrîna zanistî ya dîrokê

Em dikarin zanistê bi awayeke kurtahî, wekî hemû agahiyên ku mirov hilberî, rêkûpêkirî yên di pêvajoya lêgerîn, têgehiştin û daxuyandina rasteqînî de rave bikin. Zanistê, bikaranîna daring a ku bi awayeke çalاک hatî kirin, şewaz girtiye. Bingeha zanistê bikaranîna teknîkê ya ku bi destê mirovên hov bi hezar sal berî nîha hatiye danîn. Her wiha veguhastina wê û derbaskirina wê ya ji bo nîfşên nû jî, pêşiyê bi rêya bêjeyê, paşê jî bi riya nivîsê pêk hatiye. Lewre jî raman û siwêranên tîkildarî zanistê yên wekî sêhr, ol û felsefe ku ji nav jiyana civakî derketine û çavkaniya xwe ji jiyana civakê digirin, pêk tê.

Mirov ji bo ku bibe xwediyê jiyaneke bêmirin her tim

di nav hewla têkoşîna hebûyînê de bûye û li cîhanekê bêmirin geriyaye. Ji ber vê yekê mirov hikûmdariya li ser hemû tiştên rûyê dinê, ji bo xwe wekî bêgaviyek jênager dîtiye

Mirov dema çavên xwe vekir û li derdora xwe nihêrî, xwe di nav zincîra xwezayî ya hovanî de dît ku hukûmdariya li ser wê, wekî boneya hebûna xwe dibîne, xwest ku xwezayê hilde bin hikûmranî û bandora xwe. Ji bo ku zincîra xweza ya hovane fam bike û derxe holê, kete nav hewl û xebatan. Ji bona ku van tiştên (xweza) nediyarên ku derdora wî/ê dorpeç kirine fam bike, lêgerîn û

**Mirov, ji bo ku bibe xwediyê jiyaneke bêmirin û cîhanekê bêmirin, her tim di nav hewla têkoşîna hebûyînê de bûye û li cîhanekê bêmirin geriyaye. Ji ber vê yekê mirov hukûmdariya li ser hemû tiştên rûyê dinê, ji bo xwe wekî bêgaviyek jênager dîtiye.**

lêkolînên ramyarî diviya. Bi vê pêwendiyê mirov ketin nav lêgerîn û lêkolînên ramyarî. Ev lêgerîn ji bo hişyarbûna mirovan bû gava yekem û giring. Li ser vê bingehe nêzîkî deh hezar salan berî niha, di qada hilberînê de şoreşek mezin û berbiçav çêbû. Ev şoreşê pêşiyê di warê hilberînê de, dû re jî di jiyana mirovan û hemû hebûnên doringî û civakî de,

bû sedema gunerandinên şewazî. Mirovên ku ji bo xwe li derfeta jiyaneke bêmirin û hikûmdariya li ser xwezayê digeriyan, bi vê hewlê di heman demê de çalakiya mirovahiyê ya herî girîng û sereke jî, yanî çandinî keşf dikirin.

Zanîsta dîrokê, civaka ku her tim diguherê û di nav biza-veke bêrawest de ye, dinirxîne.

Her wiha di encama vê nirxandinê de jî bi perspektîfek piralî, hem agahiyên ku di dawîya nirxandinên wê de derketine holê, hem ji tecrûbeyên kesên ku di paşerojê de jiyane, dide famkirin.

Pergala mirovan, wan neçar dîke ku ew roja îro, hem ji bo civak û derdora ku di nav de dijîn, hem jî ji bo ku cîhanê fam bikin û hêla guherîna civakê kifş bikin, bizanibin. Rewşa civakê ya ayîndeyî û mecbûriya zanîna jiyana rojane, zanîna dîrokê ji bo mirovan jênager dîke. Di vê rewşê de, pêdiviya zanîna dîrokê derkeve pêşberî mirovan. Rûbirûmana bi pirsgerêkek bi vî awayî re, pîrsekî wekî "derfeta nirxandina dîrokê ya bi awayeke bêalî pêkan e?" derdixe pêşberî dîrokzanan. Ji bo ku mirov bikaribe, radeya ku civaka ew di nav de dijî, nirxandina paşerojê û çêspandina roja îro ya ji hêla paşerojê ve bike, divê rêbazekî objektîf bê bikaranîn û peytantînek objektîf jî tenê bi vî awayî gengaz e. Pêşveçûna zanîstan berî her tiştî kêşeya rêbazê ye. Ponijîna zanistî li Rojava di sedsala XVII an de derketiye holê. Pêşiyê zanîstên

têkildarî xweza derketine.

Dîrok jî wekî zanîstekî, piştî wê demê çêbûye. Dîrok her çiqas bi awayeke rêbazî jî nebe, berî wê demê jî her tim hebûye. Lê belê dîrok ji ber ku zanîsteke bi hebûna mirovahiyê û heta niha hebûye jî, di sedsala dawîn de wekî zanîstekî hatiye pejirandin. Teşegirtina zanîsta dîrokê jî wekî ya zanîstên din bûye. Pêşiyê bûyerên derbarê mirov û xweza de hatine çîrokî kirin. Pişt re jî, ji bo ku sûdê ji van çîrokan bigirin, formûl hatine peyda kirin. Di encamê de jî dîrok wekî zanîstekê teşe girtiye.

Kesê ku dîrokê çêdike mirov e. Lê mirov vîna xwe ji civaka ku di nav de dijî hildigire. Bêguman civak jî teşeya xwe ji tîkiliyên aborî digire. Girêdayî nerîna tîkiliyên hilberînê, tevgerên mirovan; fikr û vîna wan a ku dîrokê çêdike jî diguhere. Heta ku şewaza hilberîna mirovan neguhere, pêkanînên ku dîroka mirovan çêdikin jî naguherin. Gel heta ku dîroka xwe bi destê xwe nenivîsin, nikarin bibin xwedî jiyaneke neteweyî û hebûnek. Ev rewşê di heman demê de ji bo mirovan jî derbas dibe.

Dîrok, hêzên hilbêr ên dîrokî û zagonên objektîf ên civakî ku rehên van girêdayî sedemên civakî û aborî ne, di hundirîne.

#### **Metoda lêgerîna dîrokê ya zanistî**

Dîrok, di encama tecrûbeyên çend merhelayan de gihiştîye radeya ku niha di nav



de ye. Di sedsala XIX yan de dîrok wekî kronolojiya bûyeran dihate zanîn. Careke din di nav heman merhaleyê de komek dîrokzanên ku dîrokê wekî rûdanên mutlakî dihesibandin û "wateya di dîrokê de" mîna tiştê ku di nav dîrokê de veşartî û ji xwe kifş dibe difikirî. Ev nêzîktêdayînên ku tu deman li ser bîngehek rasteqîn û zanîstî ne rûniştin, di dawiya sedsalê de, mijara dîrokê û dîrokzan kirine dabaşa nîqaşan û ev feraset di bîngehê de hatiye lêpîrsandin. Girêdayî vê lêpîrsînê derketiye holê ku "wateya di dîrokê de" dê bi felsefeya dîrokê ve bê famkirin û dê di navbera rûdan û dîrokzan de têkiliyek diyalektîkî bê sazîkirin û ku heta niha radeyekê saz bûye.

Bi gelemperî di nav dîrokzanên de tê pejiwandin ku divê ji bo ku bûyereke bê nivîsîn, pêwîste demek dirêj di ser re derbas bibe. Ku ev rêbaz li ber çavan neyê girtin û bûyer di demeke kin de bê nivîsîn, ev dîrok nivîsîn dê gelek çewtîyan di hundirê xwe de bihewîne. Em jî vê rêpîvanê ji xwe re wekî rêgezê dipejirînin. Boneya vê rêgezê wekî derneketina emcam û bandorên bûyerê yê di dema kin, asayî û dirêj de derneketîne holê û kesên ku bûyer bi hemû hêlan ve jiyane, hêj dijîn, tê nişandayîn. Eme bawer dikin ku dîrokek di vê rewşê de û li gor van rêbazan bê nivîsîn; dê alîgir, subjektîf, pêşdarazî bibe û nemaze jî dê bandorek neyînî li ser dîroka ku di dema kin de bê nivîsîn, bike.

Cardin em dikarin bêjin ku dîrokzanên xwediyê şîroveyên dîrokî yê cihê, dema ku xwe ji atmosfera ramana serdema ku tê de dijîn xelas neke; nikare xwe ji subjektîvîzmê jî xelas bike.

**Cardin em dikarin bêjin ku dîrokzanên xwediyê şîroveyên dîrokî yê cihê, dema ku xwe ji atmosfera ramana serdema ku tê de dijîn xelas neke; nikare xwes ji subjektîvîzmê jî xelas bike.**

Rûdaneke din a ku divê dîrokzan girîngiyê bidê, hilbijêrî; tayînkirina cih û girîngiya bûyerê û kifşkirina wê ye.

Dibe ku gelek faktor li ser girîngiya bûyereke bandorê bikin. Lê kriterên ku wekî rêbazê bê pejiwandin; radeya bandorkirina wê bûyerê ya li ser dorhêlên ku hildane nav xwe de ye. Ango bûyereke çiqas zêde

kes û dorhêla xwe bandor bike, girîngiya wê bûyerê jî ew qas zêde ye. Dîrokzan kesê ku li ser paşeroja civakan bûye pişpor û li ser civakan hûrbûyî nîne. Di encamê de em dikarin dîrokzan wekî kesê ku dikeve nav jiyana mirovan, hêstên van fam dike, li ser ramanên wan bandorekê dike û tiştê ku nîrxekê dide jiyana wan peyda dike bidin naskirin.

Tiştê ku rast, rûdanî û zanîstî ew e ku dîroka ji despêka jiyane û heta niha li gorî taybetmendî, cih û merhaleyên civakên ku gloverkek dîroka mirovahiyê ne, bîn kifşkirin û nîrxandin. Em bawer dikin, xebateke ku li gorî rêbaz û zagonên diyalektîkî bê kirin, dê rêbaza herî zanîstî û encamdêr ya dest xistina rûdanî derbixe holê.

Tiştê ku me bi îdîa dike, ji dîr rawestîna fereseta nijadperestî, hişkeneteweyîti, îdealîst, teolojîk û şopandina rêbaza zanîstî ya li gor zagon û esasen diyalektîkiye.



### Mijara dîrokê

Dabeşkirina serdemên dîrokê ên li gorî pêşveçûn û guherênên dîrokî ya bi awayekî zanîstî û têkildarî krîterên siyasî, civakî û aborî nêzîktêdayîna herî baş û zanîstî ye. Dîrok dema ji derketina belgeyên dîrokê û heta roja me dinirxîne û lêgerîne li ser dike. Dema ku belgeyên wê yên nivîskî tune ne, wekî "dema berî dîrokê" tê ravekirin.

Maweya ku zanista dîrokê xebatan li ser dike, lê dikole û dinirxîne yekperketiyekê nîşan dide. Her wiha ew dem jî gavên ji hev cihê pêk nayê. Ew dem bi hev re girêdayî û herikbar e. Maweya ku dibe mijara dîrokê "maweya pêşveçûnê ye." Beşa mijara dîrokê li ser lêkolînê dike, wargehên Mezopotamya û Misrê ye. Ji ber ku belgeyên dîrokî yên yekem û herî kevin li van deran derketine ku heta roja me jî ronî dikin. Wekî hemû zanistan, zanista dîrokê jî ji bo ku serdem an jî mijarên ku li ser xebatê dike, baştir bîn zanîn û hêsantir be, li gorî pêvajoyan dabeş dike. Ev beş li gorî mijaran jî bo ku ji aliyê pisporan ve baştirîn bê nîrxandin tê azînekirin. Dabeşkirina dîrokê ya li gorî mijaran, em dikarin wekî dîroka xweza, dîroka ramanî, dîroka dadî, dîroka ramiyê, dîroka felsefê, dîroka hunerê, dîroka zanîstê û gelek cureyên din, an jî şaxên din yên dîrokê binav bike.

Ji bo peyandin, pêşveçûn û guherînên civakî, bikaranîna

pîvanên aborî, civakî û ramiyê helwesteke girîng û zanîstî ye. Dîrok xebat û lêkolînên xwe li ser maweya ku belgeyên dîrokî derketine holê dike û heta roja me tîne. Maweya ku di der barê wê de belgeyên dîrokî tune ne jî wekî "demên berî dîrokê" an jî pêşdîrok tên ravekirin. Em îro pêşberî alavên ku pêncî hezar sal berî niha ji aliyê mirovan ve hatine çêkirin, tên. Em dikarin çanda mirovan ku berî demên dîrokî, bi alîkariya arkeolojiyê dahurînin û derxin holê. Her wiha mirov dikare, bi riya belgeyên bînavîs jî çêbûn, pêşveçûn û têgiheştina hunerî zelal bike û derbixe holê. Lê belê mirov nikare teşeya bûyerên dîrokî yên ji encama jiyana mirovan derketine, bi awayekî sosya-polîtîk lêkolîn bike an jî bizanibe. Nîrxandina belgeyên bi vî awayî bi temamî girêdayî şîrovekirina lêkolîner e. Belgeyên nivîskî û bînavîs yên ku di encama jiyana civakî de derketine, çavkaniyên dîrokê pêk tînin. Lê di dema lêkolînên dîrokî de hin caran belgeyên nivîskî têra nakin. Wekî mînak, di serdemên kolledarî û feodalîtiyê de nivîs tenê ji hêla hêzên serdest ve di hate bikaranîn.

Em dikarin daneyên dîrokî wekî nûçeyên bîjêyî, destan, serpêhatî, efsane, pêkenok, menkîbe, peyvên watedar (biwêj) nûçeyên nivîskî, bîranîn, tîbîniyên geştiyarî, bîrdar, dûndeh (soyağaci), salane, kronîk, jînenîgarî û rojname rave bikin.

Careke din em dikarin bel-

geyên nivîskî wekî wêne, sûret ku nûçeyên xêzkirî ne û paşmayên bi xwe mayîn, paşmayên termê mirovan, paşmayên navên cih û waran, paşmayên rê û dirbî, paşmayên nûmîsmatîkî, paşmayên folklorîk, paşmayên hunerî, zanîstî û çandîni, berhemên wêjeyî, abîde, paşmayên dîplomatîk û gelek cureyên din destnîşan bikin.

### Têkiliya dîrokê ya bi zanîstên din re

Dîrok zanîsteke wisa ye ku hemû zanistan, bi wan dide zanîn. Ji bo famkirin û famdarkirina dîrokê, derxistina wê ya holê ya tîkiliyên di navbera kevn û nû de, gelek şaxên zanîstê, zanista dîrokê rave kirine. Çawa, ji wêjeyê bigire heta sosyolojiyê, antropolojiyê, arkeolojiyê, zimanzaniyê, erdnîgariyê, ednezyariyê, mîmariyê, felsefeyê, huner û gelek zanîstên din ji dîrokê sûde werdigirin; dîrok jî bi heman awayî encamên van zanistan bizanîn, di lêkolînên xwe de bikar tîne.

Etnografya, ji ber ku zanîsteke mirovî ya li ser qewmên dîrokî yên serdema tarîtiyê lêkolîn û lêgerînê dike, ji bo zanista dîrokê girîng e û ji ber vê yekê jî tîkiliyek xurt di navbera wan de heye.

Destxistina têgiheştinek hunerî bi dîroka hunerê re gengaz e. Ji bo famkirina paşmayiyên çewaniyên hunerî, di hemû xebatên ku tên kirin de tiştê ku derfeta pêşveçûnê dide hunermend daneheva dîrokî ye.

Dîrokzanê ku agahiyên civaknasiyê fam nekiribe û xebatên dîrokî bike, ji ber ku dê nekaribe bingeha bûyerên dîrokî yên civakî eşkere bike, dê xebatên wî jî zanistiyê dûr bin. Arkeolojî hem ji bo serdemên dîrokî, hem jî ji bo yên pêşdîrokî çavkaniyek pir girîng e. Ji ber ku arkeolojî demên bênivîs û paşeroja mirovahiyê re mijûl dibe. Her wiha civaknasî, felsefe, dad û zanistê, girêdayî wê aborî jî ji dîrokê sûdê werdigirin. Em bawer dikin ku di têkiliyên di nav zansîtan de ji bo dîrokê a herî girîng arkeolojî ye. Ji ber ku arkeolojî demên dîrokê yên herî tarî; bêyî ku belgeyek hebe dikare derxe holê.

Têkilîraçandina di nav duh û îro de, bi pêkanîna têkilîraçandina di navbera zanista arkeolojî û civaknasi û girseyan de pêkan e. Ji ber vê yekê arkeolojî, ji bo ku civak ji van agahiyan sûdê werbigire û ev agahî tenê ji aliyê zanyaran ve neyê zanîn û di akademiyan de nemîne, civak bondora duh a li ser îro bibîne, arkeolojî bi paşeroj û dîroka mirovahiyê ya herî kevn re mijûl dibe.

Nîqaşên di paşerojê de çêbûyîn dê hêjî bidomin. Ango dê siwêranên nû, rastiyên ku hatine veşartin, tiştên biqestî nehatine dîtin, tiştên ku nehatine gotin, tiştên ku dê nû ve jî bin axê derkevin, fikrên bi gelemperî hatine pejirandin, dê ji aliyê şaxên nû yên zanistê ve bên dîtin, eşkeren û nirxandin.

Ji ber ku li ser şaristaniyên kevn lêkolînê dikin, arkeolojî

û dîroka hunerê ji bo zanista dîrokê pir payeberz û girîng in. Arkeolojî, ji aliyê bikaranîn û rêbaza teknîkê ve zanistek ji dîrokê cihê ye. Lê bi mebestî ji ber daneyên ku pêşkêşî dîrokê dike, li gorî zanistên din pir nêzîkî dîrokê ye. Bi kurtahî dîrokeke bê arkeolojî, nemaze jî ji bo serdemên berê bê derfet e.

## DI CIVAKÊ DE ROLA DÎROKÊ

### Jin û dirok

Di afirandina dîrokê de rola bingehîn du cîns dilîzin. Mixabin em dibînin ku dîrokê, bêhtir neheqî li cînsê kiriyê. Dema em li kirinên jinê û rewşa jinê mêze bikin em ê bibînin ku jinê ji xeyrî domandina nifşê insan û hêztirkirina erka mêran rola xwe neleyistiye.

Lê li Rojhilata Navîn, Mezopotamyayê û Anatoliyayê, ku şaristanî li wan deran hilhatiyê, mêrê ku dîrok bi destê xwe nivîsiye, rewşa jinê ya herî kevnar jî xerabtir kiriyê.

Beriya xwedêyan xwedawend hebûn. Jin, pêşiya dema paleolitikê û dema neolitikê ku wekî dema şoreş û evrîmê tê binavkirin de li aliyê hilberîna çandinî, berhevkirinî, derbazbûna jiyana tîkûz û niştocihiyê de xwedî roleke mezin bû. Birastî jî em nikarin tomaran rasterast delîl nîşan bidin. Lê em dikarin, bi şiroveya awayê jiyana wan, mîmariya wan, wêneyên dîwaran, awayê xebatên wan van encaman jê derxînin ku jin wê demê wekî hêz dihat

dîtin. Ji ber ku jiyana rasterast girêdayî hilberîna çandinî bû, di hilberînê de rola jinê jî berbiçav bû û jin zayinker bû. Jin di jiyana civakî de di qebîlê de xwedî biryar bû. Hetta em îro li peykerên xwedawendên dayîk binêrin, em ê bibînin ku

**Têkilîraçandina di nav duh û îro de, bi pêkanîna têkilîraçandina di navbera zanista arkeolojî, civaknasi û girseyan de pêkan e. Ji ber vê yekê arkeolojî, ji bo ku civak ji van agahiyan sûdê werbigire û ev agahî tenê ji aliyê zanyaran ve neyê zanîn û di akademiyan de nemîne û civak, bondora duh a li ser îro bibîne, bi paşeroj û dîroka mirovahiyê ya herî kevn re mijûl dibe...**

jin piroz dihate qebûl kirin. Dema jinê hêza xwe hêdî hêdî windakir, bi feraseta hikmê mêr dîroka nivîskî destpê kir û heya îro jî bi vî awayî dom kir. Êdî xwedawenda dayîk tune bû; xwedayê herî mezin hebû. Diviya bu ku hemû xwedawendan li hemberî xwedayê mezin serê xwe bitewandana.

Ji bo jinê hemû cureyên erkê, hemû desthilatdariyên ku li gorî têkiliyên mirovan; çand, nijad, ziman, ol, hilberîna çandinî û jînenîgariyê teşeyên cuda hildide ser xwe û di yek erkê de tê cem hev. Erk û desthilatiya mêr, jin jî mîna xwezayê kiriyê bin bandora xwe, xis-

tiye rewşa bikaranîna li gorî berjewendiyên xwe. Bê îrade hiştiye.

Jin dema dîrokê ji feraseta mêr rizgar bike, demên dirokê de mantiqê mêr ku di hemû deman de desthilatiya mêr berbiçav e, hiyerarşiya zayendan hilweşîne, şewazeki jiyane ku bi xwezayê re di nav ahengêde be, têkiliyên civakî û zayendî lêbikole, biafirîne hingê de hesaba dîrokê bigire û vê rewşê xelas bibe. Dîsa jin, lêkolînên berfireh li ser dîrokê bike, gelek bûyer û şexsên girîng ên hatine jibîrkirin derbixwe holê û ji niha û pê de di nivîsandina dîrokê de rola xwe ya esas hilgire ser milê xwe, dê ew yeka ku dîrokê bigihijîne hev pêk bîne.

Di vê gihîştinê de berpirsiyariya bingehîn li ser milê jinên mezopotamyayê ye. Wekî tê zanîn ev der ji serdema neolîtîkê ve heta niha jêderka perisîna civakî û çavkaniya şaristaniyê bûye.

Ev peyvir û berpirsiyarî nemaze dikeve ser milê jina kurd. Dibe jina ku di serî de dîrokê ji nû ve niqaş bike û dayine cihê wê yê rasteqîn dê jina kurd be. Dema jina kurd, hem ji aliyê çand, ziman û dîroka gelê xwe, hem jî ji aliyê zayenda xwe ve li ser dîrokê bikole û tomar bike, dê ji bo jinên têkoşer bibe mînak û modelek giring, dê ji bo azadiya jinê hêzê xurtir bike.

Ji bo vê yekê, wek beşa dîrokê berpirsiyariya me ev e: Divê em saziyek wisa biafirînin ku ev sazî ji bavsaliyê bi-

buhure û lê bipirse, ya nû û ya kevn niqaş bike, lê bikole û danehewên hatî bidestxistin ji pêşerojê re bihêle. Dema em xebatên bi vî rengî pêk bînin, em difikirin ku ji bo diroka jinê projeyên nû derxînin holê. Ev xebate dê hem di bin banê beşa dirokê de hem jî bi hevkarîya saziyên jinê yên dirokê ve pêk werin.

### Hawirnasî (Ekoloji) Û Dîrok

Diroka mirovahiyê parçeyekî ji dîroka ser rûyê dinyayê ye, heta parçeyê herî girîng e. ku ser rûyê dinyayê diguherîne. Însan ji bo ku jiyana xwe bidomîne, xweza û havirdora xwe guhertiye, hilberîna çandinî keşf kiriye û bi derbasbûna jiyana niştecîhiyê re jî bi îcadên teknîkî dest bi xirabkirina hawirdor, jînenîgarî û hewsenga xwe kiriye. Pêşiyê bi awayekî hoveberkî êrîşî xwezayê kiriye, kirdeyên xwezayê guhertiye ango tune kiriye. Paşê hêdî hêdî ceribandîye ku bêyî tune kirina kirdeyên xweza-

yê jî dikare jiyana xwe bidomîne û hewldaye ku zerarê nede xwezayê. Herçiqaş însan bi mebesta ku zerarê nede xwezayê hewl dabe jî xwesteka wî ya bingehîn domandina nişê wî bûye. Dîsa herçiqaş xwestek domandina nişê însan û jiyana civakî be jî, ev yek ji feraseta serdestiya bavsaliyê tê, ji fikra ku divê jin, xweza û civak di bin hikmê mêr de be tê.

Însan fêr bûye ku domandina xwezayê, tunekirina wê çêtir e. Careke din dema mirov, li dîrokê mêze bike, vê yekê tevlêkirinek li pêşveçûna hilberînî kiriye. Vê rewşê pêşveçûna teknîk, ticaret û hilberîna çandinî bi xwe re aniye û êdî însan ji bo heywan, ax, jînenîgarî û rûberka riwekî (bitki ortusu) bergiriyên parastinî pêk aniye. Însan bêgav maye ku hem jiyana xwe bidomîne hem jî sûtê ji xwezayê wergire. Ji bo modelên civakî bêgavbûne ku van modelan hem di navbera gund û bajaran de hem jî di navbera hawirnasî



û teknolojiyê de hewsengeki biafirînin. Careke din tîkûzki-rina niştecihiya li gorî zeren-giya xweza, ji bo hewsengiya ekolojîk pir girîng e. Ahenga mirov ya bi cîhana xwezayî re û girêdayî vê yekê jî çareseriyên civakî yên li ser vê bingehê êdî jênager in.

Bingeha jiyana însan dinya ye. Heger erda ku insan jiyana xwe li ser didomîne serobino bibe, bingeha jiyana însan jî dê serobino bibe. Bi vê hişmendiya famkirina dîrokê tê vê wateyê ku, ger dîroka dinyayê bidawî bibe, dê dîroka mirovahiyê jî bidawî bibe.

### Dîrok, Jînenîgarî, Gel û Çand

Ev axa ku em li ser dijîn, yanê Anatoliya û Mezopotamya, ji bo çandên ku hatine avakirin, ji bo şaristanî, gel û dewletan axa herî dewlemend e. Dibe ji ber vê yekê ye ku ev ax, xala destpêka keşifkirina şaristanî û çandan e. Dîroka vê herêmê heya serdema paleolîtîk diçe û serdema şoreşê anggo serdema neolîtîk li vê herêmê jiyaye. Ji ber vê ev ax, ji bo dîroka dinyayê pir girîng e.

Her çiqas bi awayekî îronîk em dibînin ku mîna girîngiya vê herêmê xwedî lê nehatiye derketin jî, ev yek, berpirsiyariyekî giran datîne ser milên zanyarên dîrokê û zanista dîrokê. Ji ber ku çand û şaristanîyên bi hezar salan bandorê li hev dikin û di nav dan û standinê de ne.

Mixabin hinek çand, şaristanî, gel û dewlet herdem di

bin gefên dewletên serdest, gel û mêtîngerên desthilat de nin. Dewletên serdest, li ser vê erdnîgariyê çand, şaristanî û tecrubeyên din xistine bin bando-ra xwe û manûpîle kirine û heta xwestine wan tune bikin. Qaşa ji bo ola îslamê bi feraseta mêtîngeriya Osmanî, tecrûbe û mîratên wan hilweşandine. Wekî mînak; hin caran dêr hilweşandine, li şûna wan mizgef avakirine. Dîroknûsa rasteqîn, dê nêrîna me ya li ser çandan zelal bike, de pêkbîne ku em tecrûbeyên gelan nexin bin hikmê serdestan, em dîroka xwe baş bikolin, danûstandina çandan baş rave bikin.

Li ser vê erdnîgariyê ku ji Sûmeriyayê ve gelek şaristanî li ser jiyane û heta niha jî gelek gel li cem hev dijîn, teqez divê dîrokeke dijî nijadperstiyê bê afirandin û jiyandin. Divê çarenûsa vê axê yek gel nebe. Ger yek gel be, hîngê hemû gel dê ji dîroka xwe dûr bikevin. Ev dîrok heta Sûmeriyayê jî biçe, dê dîrokeke nivco be, ji hev veqetiyayî be. Hûn lê binêrin, hûnê bibînin ku kurd, ereb, tirk laz, ermenî, rom, çerkez, gurcî, arnawud, suryanî, azerî, êzîdî ku bi sedan sal in li ser heman erdnîgariyê jiyane, niha dûrî dîroka xwe mane û tu hewldanên wan tunin ku çanda xwe bikolin û bidin jiyandin.

Halbûkî, em ji sûmer, babîl, asûr, hitî, med, ûrtu, roma, bîzans û osmaniyan binêrin, ku li ser axa Anatoliya û Mezopotamyayê jiyane, bêhtir xwe-diyê mîratekî dîrokî ne. Pêwîste tecrûbe, hilberîn û dîroka

van gel û neteweyên ku me li jor behs kir bi awayekî objektîf werin lêkolîn û derxistin. Dema ev feraset û nivîsandina dîrokê pêk bê û dîsa dema nivîsandina dîrokê ji bîrdoziya mêtîngeriya rizgar bibe, hîngê dê heqên gel û neteweyên îroyîn were cih. Bi vî awayî nêzikbûyîna dîrokê tê manaya wekhevî û peywendiya azad ya li ser vê axê.

### Di Perwerdehî û Fêrkirinê de Rola Dîrokê

Însan, bi fêrbûna dîrokê re hêza ramana zanistî qezenc dike û ji xwe bawer dibe. Di perwerdehiyê de kilîta zanîna di hişmendiya dîrokê de veşartî ye. Bi rastî jî hişmendiya dîrokê ji fêrkirina pêvajoya guherînê ya civakê pêk tê. Kesê ku guherînên civakê bi ferasetekî zanistî fêr bibe, dikare êdî tîkiliya xweza û civakê jî bi awayekî dialektîk fam bike.

Her civak, di bingeha xwe de encama pêşveçûnên dîrokî ye. Çareseriyên pirsgirekên civakî û neteweyî di nav rewşa wan ya dîrokî de derbas dibe.

Kîjan gel an jî civakê derxistibe holê bila derxistibe, ev tecrûbe û pêşveçûn bi feraseta ked û pêşketina hemû gelan bê qebûlkirin û famkirin, dê însan hişmendiya dîrokê qezenc bike. Ev yek jî dê însan bibe şarîştaniya mirovahiyê.

Dîrok birasterast, azîneya nêrîna dinyayê ye û dîrok ji bo qezenckirina fikra rexneyî, lêkolîn, darizandin û şewirmendiya navgîna herî girîng e.

## Li ser qursên taybet ên zimanê kurdî û rewşenbîrên kurd

Şefik BEYAZ

Ji bo ku mirov tiştêkî bi-xwaze, berî her tiştî divê mirov wî tiştî wek hewcedariyekê hîs bike. Mirov dikare daxwazî û hêviyan çêbike, lê tiştêk ta ku wek hewcedariyekê pêwîst dernekeve holê, zêde raxbet nabîne. Nexasim ew cihê ku piyasa serbest lê serdest e û her tişt ji aliyê vê piyaseyê ve tê kifşkirin, li wir daxwazî ji aliyê hewcedariyê ve tê tayîn-kirin. Ango pêwîstî, pêdivî û hewcedarî hebe, daxwazî jî çêdibe.

Ji ber ku zimanê tirkî, zimanê fermî yê dewletê ye, ew kesê ku dixwîne, ji dibistana destpêkê ta zanîngehê pêwîst e ku bi vî zimanî bizane. Ango zimanê tirkî li Tirkîyeyê pêdiviyekê pêwîst e. Kesê ku bi tirkî nizanibe, nikare bibe xwedî karekî, heke xwenda be, nikare kariyer bike, nikare bibe rektor, dekan, endezyar, bijîşk, dadmend, mamoste û polîs, heta nikare bibe dergevan jî. Ji bo 'jiyaneke xweş û bextewar' li Tirkîyeyê pêwîstî bi zanebûna zimanê tirkî heye. Heta bi tenê zimanê tirkî jî têrê nake, divê mirov îngîlîzî jî baş bizane.

Ew kesên ku li Tirkîyeyê dijîn; kurd, ereb, ermen, laz, rum û hwd. ji ber ku zimanê tirkî wek hewcedariyekê pêwîst dibînin, dixwazin ku bi vî zimanî bizanibin. Ango neçar dimînin ku vî zimanî fêr bibin.

Ta ku zimanek di qada fermî ya civakê de neyê bikaranîn, di xwendegên fermî û nefermî de, di sazgehên dewletê de neyê bikaranîn, ji aliyê civakê ve wek hewcedariyekê

**Ta ku zimanek di qada fermî ya civakê de neyê bikaranîn, di xwendegên fermî û nefermî de, di sazgehên dewletê de neyê bikaranîn, ji aliyê civakê ve wek hewcedariyekê pêwîst nayê hîskirin û xwestin. Civak gava zimanekî wek hewcedariyekê pêwîst nebîne, ji bo hînbûnê zêde hewl nade xwe. Ev rewş ji bo her gelek û civakêkê lê ye.**

pêwîst nayê hîskirin û xwestin. Civak gava zimanekî wek hewcedariyekê pêwîst nebîne, ji bo hînbûnê zêde hewl nade xwe. Ev rewş ji bo her gelek û civakêkê lê ye.

Civaka kurd jî, mîna ci-

vakên din ji zimanê xwe-kurdî hez dike, dixwaze ku bi kurdî biaxive. Bi sedan sal in ku zimanê kurdî ji aliyê dijminên kurdan ve biçûk hatiye dîtin û di bin zextê de hebûna xwe domandiye. Lê tevî vê rastiyê zimanê kurdî ji aliyê kurdan ve tê hezkirin û kurd li zimanê xwe xwedî derdikevin. Bi sedan sal in ku kurdî di xwendegehan de wek zimanê hîndekarî û perwerdehiyê nayê bikaranîn, lê dîsa ji aliyê piraniya kurdan ve tê bikaranîn. Ev rewş vê rastiyê derdixe holê ku kurd ji zimanê xwe hez dikin û li zimanê xwe xwedî derdikevin.

Pirsgirêk ne ew e ku kurd li zimanê xwe xwedî dernakevin û ji zimanê xwe hez nakin. Ev demek e dirêj e ku zimanê kurdî di qada hîndekarî û perwerdehiyê de û wek zimanekî nivîsê nayê bikaranîn. Zimanekî ku nebe zimanê nivîsê, nikare bibe standart û zimanê ku nebe standart, nikare bibe zimanê zanistê.

Heke em çend mînakên biçûk nehesibînin, kurdî bi derketina Rojnameya Kurdistanê ku di sala 1898'an de derketiye, dibe zimanê nivîsê. Di dema Meşrutiyetê (1908- 1918) de hem di hejmarên kovar, rojname û pirtûkan de zêdahiyek heye, hem jî di nav rewşenbîrên kurdan de hezkirina kurdî zêde dibe.

Di destpêka 1990'î de qedexeya li ser zimanê kurdî radibe

û bi kurdî rojname, kovar û pirtûk derdikevin. Têkildarî û hezkirina zimanê kurdî di nav rewşenbîrên kurdan de zêdetir dibe. Bi kurdî gelek pirtûk û kovar derdikevin. Ango dema rewşa siyasî dest bide, di nav rewşenbîran de hezkirin û têkiliya zimanê kurdî zêdetir dibe.

Lê ev têkildarî ne bes e. Rewşenbîrên kurd, mîna gundiyan kurdan li zimanê xwe xwedî dernakevin, jê hez nakin. Belê rewşenbîrên kurd, li derveyî çanda kurdî dijîn, di xwendegehan de di bin tesîra îdeolojiya fermî de dimînin û di bin atmosfera giran a bajaran de dijîn. Ji ber vê yekê bi zimanê xwe yê zikmakî nizanin, yan jî baş nizanin. Mirov dikare vê rewşê fêm bike û têbigihêje. Lê gelo çima rewşenbîrên kurd ji bo ku zimanê xwe fêr bibin û bi zimanê xwe biaxivin, di nav hewldaneke mezin de nîn in?

Yê ku li vir divê rexne lê bê girtin ne bi tenê rewşenbîrên kurd in, tevgera demokrasîyê ya kurdî jî xwedî payekî negatîf e. Heke tevgera siyasî ya kurdan di qada tekoşînê de ta niha zimanê kurdî bi kar anîbûya, vê gavê rewşa kurdî dê ne weha bûya. Heke zimanê kurdî hatibûya bikaranîn, ew pêşveçûnên ku di qada siyasî û civakî de derketine pêş, dê deh car jê zêdetir di vê qadê de çêbûna. Rewş wisa dide xuyakirin ku ne rewşenbîrên kurd, ne jî tevgerên siyasî yên kur-

dan têra xwe li zimanê kurdî xwedî derdikevin. Ev zaafiyetek e, divê ev zaafiyet ji holê bê rakirin.

Hêdî-hêdî li Kurdistanê qursên taybet ên zimanê kurdî bi fermî vedibin, ji bo kurdan û zimanê kurdî ev pêşketinek e. Ta niha li 8 bajar û navçeyan ji bo vekirina qursên bi zimanê kurdî serî hatiye lêdan. Ji wan 3 qurs ji bo destpêkirinê ji Wezareta Perwerdehiyê destûr stendin. Yê din jî ji bo destpêkirinê wê peyderpey îzin bistînin.

**Belê rewşenbîrên kurd, li derveyî çanda kurdî dijîn, di xwendegehan de di bin tesîra îdeolojiya fermî de dimînin û di bin atmosfera giran a bajaran de dijîn. Ji ber vê yekê bi zimanê xwe yê zikmakî nizanin, yan jî baş nizanin. Mirov dikare vê rewşê fêm bike û têbigihêje. Lê gelo çima rewşenbîrên kurd ji bo ku zimanê xwe fêr bibin û bi zimanê xwe biaxivin, di nav hewldaneke mezin de nîn in?**

Lê ji bo civateke mezin wek kurdan 8 kurs ne bes in. Divê li her bajar û navçeyên Kurdistanê gelek qursên zimanê kurdî bên vekirin. Ji bo zarok û xortên kurdan, ji bo hînkirina zimanê kurdî pêdivî bi sedan qursên zimanê kurdî heye. Belê bi tenê bi qursên taybet

pêkanîna hewcedariyên zarok û xortên kurdan ne mimkun e. Divê di xwendegêhên dewletê de bi zimanê kurdî hîndekarî û perwerdehî bê kirin. Ev ji bo dewletê peywirek e, dewlet nikare bi tu hincetî ji vê peywire, xwe bide alî. Ji bo ku zimanê kurdî bibe zimanê perwerdehî, hîndekarî û yê pazarê pêdivî bi têkoşîneke mezin heye. Lê ta ev rewş pêk were, divê kurd li qursên zimanê kurdî xwedî derkevin.

Dewlet alîkariya qursên bi vî rengî nake, heke ji destê wê bê, dê astengî derêxe. Ji ber vê yekê ev bar li ser milên kurdan e. Ev peywir a kurdan e. Pêkanîna vê peywire hem rûmet, hem jî berpirsariyê ye. Her kurdek divê vê peywir û berpirsariyê par ve bike.

Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê tevî ku ne saziyeke perwerdehiyê ye, lê dîsa jî ji bo perwerdekirina mamosteyên zimanê kurdî ta niha gelek qurs pêk anîn. Di van qursan de bi sedan mamoste hatin perwerdekirin. Ji bo hînkirina zimanê kurdî gelek pirtûk û ferheng amade kirin. Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê bi derfetên xwe yê pir hindik van xebatan dike.

Ji bo geşbûn û pêşketina zimanê kurdî, divê li qursên zimanê kurdî xwedî bên derketin, hejmara van qursan bên zêdekirin.

[www.arsivakurdi.org](http://www.arsivakurdi.org)